# ZIMANÊ KURDÎ

# NAVÎN

# 2

*Ev pirtûk ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdê ya KCK'ê û Qomîteya Zanist û Ronakbiriyê ve, weke pirtûka waneyêhatiye pejirandin.*

2

## AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

### *Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn*

*M. Elî DEMİR, M. Şîrîn ÇETİN, Mazlûm TEKİN, Îsmet YALVAÇ, Hewar GUNGEN, Sedîq BENEK, Selamet ERDOGAN, Emîne BULUT, Hesin DEMİR, Sofî SİDAR, Mihemed KARA*

***Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek taybet ji nûnerên parçeyên Kurdistanê, ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin.***

### *Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan*

*Mizgîn EGÎD,Arşek Baravî, Mazlum TEKİN, M. Şîrîn ÇETİN, Birahîm Xelîl, Laleş Ferqînî, Dijwar BOTAN, Ednan HESEN, Mustafa OSMAN, Hisên CIZÎRÎ*

### *Redaksiyon*

***Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan***

### *Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan*

*Bedredîn OY*


*Merwan YAMAN*

*Çapa pêşîn: 1999*
*Çapa Nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





***"Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxîn."***

# NAVEROK

**BEŞ 1 .......................................................................... 9**

PERWERDEYA RAST ........................................................................ 9
KAVILÊ XIRABE ........................................................................ 11
DARA Û MAMOSTE ........................................................................ 15
JIXWE ŞERMÎ ........................................................................ 20
HEVALTIYA RAST ........................................................................ 24
COTYAR Û ZEVÎ ........................................................................ 30
DI CIVAKÊ DE PÊŞENGTÎ ........................................................................ 34
MÊŞÊN HINGIVÎ ........................................................................ 39
TÊKÎLIYA ÇANDÊ BI ZIMAN RE ........................................................................ 44
*MIJARA SERBEST ........................................................................ 44*
WELATÊ MIN ........................................................................ 51
RÛMETA MIN RÛMETA GEL E ........................................................................ 55
TEST 2 ........................................................................ 60

**BEŞA 2 ..........................................................................63**

REXNEYA LI SER PERWERDÊ ........................................................................ 63
KELHA ELODÎNO ........................................................................ 68
PEZKÛVIYÊN CIWAN ........................................................................ 73
EZ ! ........................................................................ 79
MELAYÊ CIZÎRÎ (1407-1481) ........................................................................ 83
ROVIYÊ SÎTEMKAR ........................................................................ 88
GELIYÊ ZÎLAN ........................................................................ 93
DAYÎKA MIN ........................................................................ 97
*MIJARA SERBEST ........................................................................ 97*
GULBIHAR ........................................................................ 99
NAME ........................................................................ 104
TEST 2 ........................................................................ 108

**BEŞA 3 ...... 110**


DAXWAZNAME ...... 111
TARÎX Û SIRÛD ...... 113
HEY AGIRÊ NEWROZÊ ...... 119
JI BO DAYÎKÊ NAME ...... 122
ÇIYAYÊ SÎSER Û JINA BI ROJÊ RE ...... 126
JIYANEK JI TÊKOŞÎNÊ DAGIRTÎ ...... 130
GIRÎNGIYA XWENDINÊ ...... 133
PEYAMA NEWROZÊ ...... 137
SIYABENDÊ SILÎVÎ Û XECÊ ...... 141
XORTÊ KURDAN ...... 147
TEST 3 ...... 150

**BEŞA 4 ...... 153**

TÊHNBÛN ...... 153
DERWÊŞ Û EDÛL ...... 157
JÎNAMA RÊBER APO ...... 163
DÎLBEREK MIN DÎT BIÇAVAN ...... 168
HÊVIYA BIHARÊ ...... 173
BÊXAL ...... 177
COTYARÎ ...... 181
AKÎFÊ HEVAL ...... 184
TEST 4 ...... 188

# BEŞ 1

## PERWERDEYA RAST




Perwerde, ew zanista hizrî û kiryarî ya encama ceribandinên civakê ye. Weke karê fêrkirina civakê jî tê nasîn. Civakbûyîna zarokan, bi çalakiya perwerdeya civakê re tê birêveberin.

Perwerdeya zarokan ne erka desthilatdarî û dewletê ye, erka herî girîng ya civakê ye. Ji ber ku zarok û ciwan yên civakê ne. Civak, neçare, ku zarok û ciwanên xwe hem wek maf û hem jî wek erkekî sereke, li gor taybetmendiyên xwe yên xwezayî xwedî bikin. Ji bo ku civak hebûna xwe bide berdewamkirin ev dibe mijarek sereke ya jiyanî û girîng. Ji bo vê mafê perwerdê, mafeke pîroz e û çavkaniya xwe jî, ji hebûnek xwezayî digire.

Di pêvajoya dîroka şaristaniyan de yek ji çalakiya herî mezin, li dijberî civakê; zarok û ciwanên civakê ji civakê qutkirine. Vê jî bi dû rêbazan pêktînin; ya mezinên wan tine dikin û dikin kole yan jî, ji bo berjewendiyên desthilatdariyê bê berdewamkirin, zarok û ciwanan perwerde dikin.

Yek ji armancên herî girîng yê şeran; wek milkê herî binirx zarokên, keç û xortên ciwan bi van her dû rêbazan digirin nav xwe û li dijberî civakê bikartînin. Zarok û ciwanên ji cewherê civaka wan qut dikin; bi ziman, çand û dîrokekî cuda bi wan didin fêr kirin. Armanca sereke ji cewherê wan biyanîkirine. Di rastiyê de perwerdekirina civakê ne di xema wan de ye. Sermayedarek karkerên xwe bi çi awayî perwerde dike, desthilatdar jî ew qas kesên di bin desthilatdariya xwe de, bi heman hizrê perwerde dikin. Bi vî



awayî ji jor heta jêr xeleka koletiyê didin avakirin.

Netew-dewletên ku di roja me de desthilatdariyên xwe, beriya her tiştî li ser zarok û ciwanên civakê bi riya perwerdê didin domandin. Zarok û ciwanên dewletê, bi zîhniyeta dîrok, huner, ol û felsefeya ku perwerdekirî, êdî ew zarok nabin zarokên wê malbat û civakê, raste rast dibin zarokên desthilatdarê yên wê dewletê. Zorî, hêza heyberî û perwerde ji bo mîtîngerkirina civakê bûye çeka herî bihêz. Bi riya TV, înternet, rojnamegeriyê; di warê leşkerî, aborî û ya herî girîng jî qirkirina çandî ya civakê dixwazin temam bikin. Bi vî awayî desthilatdar dixwazin li dijî civakî, civakekî li dij civakê bidin avakirin; li dijî civaka xwezayî, civaka desthilat û dewletdar bidin afirandin.

Civakekî ciwanên xwe windakirî, berevajî vê jî ciwanên civaka xwe windakirî, ji windabûnê jî wêdetir, tê wateya ku xiyanet li rastiya hebûna xwe kiriye.

Civak û kes li hember vê qirkirana çandê û mîtîngeriya dewlet û deshilatdariyê encax bi têkoşîna li ser hîmê civaka exlaqî û siyasî bi serbikeve.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ


1- Li gor we serpêhatî çawa tê nivîsîn?
2- Gelo sedemê gel derbazî Başûr bûyî çi bû?
3- Hûn dizanin deng çi ye?

# KAVILÊ XIRABE

Demekê kesekê bi navê Egîd ji Geliyê Goya derbazî başûr dibe. Xudê dû kura dide wî; navê yekî dike Hogir û navê yê din jî dike Gelî. Egîd dimire, neviyê wî pîr dibin. Piştî demekî agahî digirin ku pismamê wan Şêro di cihê xaniyê wan de xanî çêkiriye. Gelek pê ne aram dibin û li bendêne rojekê biçin wî xanî yê xwe bistînin.




Dem tê, şerê PKK û dewleta Tirk dest pê dike. Gelê wê herêmê ji ber zordariya leşkerên Tirk di bihara sala 1994'an de, ji neçarî koçberî Başûrê Kurdistanê dibin û li herêma nêzikî tixûb bi cih dibin. Dema Hogir û Gelî vê



agahiyê digirin, bi lez û bez ji Mûsilê berê xwe didin nav gelê koçber yê ku li Bihêrê bi cih bûyî. Ji bo standina kavilê bavê xwe, dikevin nav hewldanê. Diçin mala pismamê xwe Şêro û daxwaza kavilê bavê xwe dikin, lê Şêro vê napejirîne. Her çiqas kesê ji bûyerê agehdar hene jî lê ji ber Şêro xemgîn nebe û ji wan dilê wî ne mîne, bi awayekî eşkere bînertiyê nakin. Lê bi awayekî veşartî ji xwediyên kavil re rastiya bûyerê dibêjin. Ji ber vê rewşa tevlîhev pirsgirêka kavil bi rojan dewam dike. Carcar dibe sedemê aloziyan jî. Piştre kesekî kal li ser vê bûyerê banî melayekî dike. Ji bo çareserkirina bûyerê mela tê. Piştî guftûgoyekî dirêj û guhdarî her dû aliyan tê kirin, biryarê dide û ji Hogir û Gelî re dibêje: “Hevalên hêja, dema gel zivirî û gund avakirin wê demê hûn tên û pismamê we Şêro cihê odeyekê ji we re paqij dike û dide we.”

Li ser vê her dû bira pir şad dibin û li tirimpêla xwe siwar dibin û dizivirin malê xwe ya li Mûsilê.





## PEYV

**Kavil:** Cihê xaniyê xirabe
**Bînertî:** Şahidî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Dema em temaşeyî mijara jor dikin, dibînin ku li dawiya her hevokekê xalek hatiya danîn. Ev xal her tim li dawiya hevokê tê danîn û dide diyarkirin ku hevok bi dawî bûye. Her wiha piştî xalê her tim nivîskar, nivîsîna xwe bi tîpa gir destpê dike.

## PIRS

**1-** Gelo çima gel koçber bû?
**2-** Çima pirsgirêk zû çareser nebû?
**3-** Sedemê dilxweşbûna Hogir û Gelî çi bû?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsandina we xwendî serpêhatiyek e.

Ji nivîsandinên bûyerekî bûyî yan pêkanî (gengazî) bûyînê ye, bi awayekî rêk û pêk radigîhîne re **serpêhatî** tê gotin.

Serpêhatî xwe dispêre bûyerên rast.

**Serpêhatî li ser sê endaman, tên avakirin:**

**a-** Bûyer

**b-** Kes

**c-** Cih û Dem

Serpêhatî; ji destpêk, naverok û encamê pêktê.

## RÊZIMAN

**Dengzanî:**

Her weke ji wateya peyvê jî xuya ye, rêziman rêz û rêçikên ziman, nîşanî mirov dide. Diyare ku ti ziman ne bêrêz û rêçikin. Deng, peyv û hevok li gor hinek rêz û rêçikan pêkhatine.

**Deng:**

Di zimanzaniyê de, mirov dikare bi kurtasî deng wiha rave bike: Bayê ku ji kezeba spî ya mirov derdikeve û diçe zengilorê (gewrî), li vir bizavekê dide têlên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, zimanê biçûk û bipoz awênekê digire.

Li gor we cudabûna di navbera deng û tîpan de çi ye?

Dengên biwate yên ji devê mirov derdikevin re **dengê** ziman tê gotin.


Hêmayên van dengan, ji me re didin nîşakirin re dibêjîn **tîp**.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Mijara we derbazkirî serpêhatî bû. Hûn çi ciyewaziyê di navbera mijara derbazbûyî û vê mijarê de dibînin?**
**2- Sedemê kû ji guftûgoyê re em dibêjîn guftûgo çiye?**
**3- guftûgoyek di navbewra we û hinek din de çêbûyî, bibîr bînin.**

# DARA Û MAMOSTE

Rojekê Dara ji xew radibe li demjimêra xwe temaşe dike, dibîne ku demê wî pir kêm ma ye. Bi lez û bez çavên xwe dişo, berê xwe dide dibistanê û berî mamoste bikeve refê, Dara derbazî refê dibe. Piştî mamoste jî dikeve refê, dixwaze temaşeyî pirtûka Dara bike lê Darayê belengaz, pirtûka xwe ji bîrkiribû.



Mamoste: "Dara! Ka pirtûka te?"
- Pirtûka min, li mal ma ye.

- Çima te li malê hişt?

- Ji ber demjimêr derbaz bûbû, min lez kir ji ber wê pirtûk nehat bîra min.

Mamoste:

- Here pirtûka xwe bîne û were.

Dara bi awayekê bêgewil ji refê derdikeve û berê xwe dide mal. Di rê de rastî birayê xwe Gabar tê.

- Ew çi ye di destê te de?

- Pirtûka te ye. Dayîka min got: "Bibe da ku birayê te ji waneya xwe nemîne."

- Ka bide.

Dema Gabar, pirtûkê dide dest birayê xwe, Dara temaşe dike, dibîne ku li şûna pirtûka ziman ya bîrkarî anî ye. Li ser wê bihêrs dibe.

- Ev çi ye te anî?

- Pirtûka te ye.

- Pêwîst e te pirtûka ziman anîba.

Piştî wê her dû bira bi hev re dizivirin mal. Dayîka wan:

- Lawê min tu çima hatî mal?

- Ez hatime pirtûka xwe.

- Ma, min pirtûka te rênekiribû?

- Belê lê we şaş rêkiribû dayê. Li şûna pirtûka ziman, Gabar pirtûka birkarî ji min re anîbû.

Li ser vê Dara pirtûka xwe girt û çû dibistanê. Di deriyê hewşa dibistanê de rastî mamosteyê hîşedar hat.

- Tu çima dereng hatî?

- Min pirtûka xwe ji bîr kiribû, ez çûm min pirtû-ka xwe anî. Agahiya mamosteyê min yê waneyê ji min heye.

Piştî vê gotinê mamosteyê hîşedar pêre diçe û derbazî refê dike. Li ser rewşa wî agahiya ji mamosteyê waneyê digire û Dara jî dest bi waneya xwe dike.

## PEYV

**Hêrs:** Acizî
**Lez û bez:** Lezgîn
**Hîşedar:** Nobedar, Zêrevan

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Li nivîsîna jor temaşebikin, hûnê bibînin ku li pêşiya gelek hevokan xêzika axaftinê hatiye kişand.

Gava ku gotûbêj di navbara çend kesan de çêdibe, ger gotina yê daxive di nav neynokê de neyê nivîsandin, xêzika axaftinê dikeve pêşiya axaftina kesê ku daxive û axaftin ji sererêzê dest pê dike.

**Mînak:**

Dayîkê ji lawê xwe re got:

- Çima tu hatî mal?

Bi vî rengî xêzikek din jî ya me heye. Ev cûre xêzik dikeve navbera dû peyvên di navbara wan de hevaltî heyî de. Her wiha dema ku em nivîsîna xwe dinivîsin lê peyva me di wê rêzê de bicih nabe, em neçar dibin ku peyva xwe parçe bikin. Di vê rewşê de jî em xêzikî li dawiya rêzika xwe dikişin.

## PIRS

**1-** Sedemê Dara pirtûka xwe ji bîrkirî, çi bû?
**2-** Çima dema Gabar pirtûk ji Dara re anî, Dara ev pirtûk nepejirand?

## CÛR Û AWÊN

Ev cûre nivîsîna we xwendî, **guftûgo** ye.

Ji nivîsînên di serpêhatiyekî de, di navbera çend kesan de axaftin bi awayê pirs û bersiv pêşdikevin re **guftûgo** tê gotin. Piranî guftûgo di serpêhatiyan de pêktên.

Guftûgo di nav nivîsandinên bê amadekarî de cih digirin. Ji ber ku nivîskarê guftûgoyê jê ne agehdare ku peyvîna di navbera dû kesan de wê bi çi awayî pêş bikeve.

## RÊZIMAN

Her ziman dengên wî yên xweser hene. Di Kurdî de **31** deng hene. Ji awênê derbazkirina dengan ya ji nivîsînê re ***tîp*** tê gotin.

Ji pêşdariya (tablo) rêzetîpên di zimanekê de dengan nîşan didin re rênivîs (***alfabe)*** tê gotin.

Di waneya derbazbûyî de hûn fêrî deng bûbûn. Li vêderê bikurtahî emê li ser cûrên dengan û wêne **(tîp)** yên dengan ji me re nîşadikin rawestin.

**Tîp dibin dû beş:** "Dengdêr û Dengdar"

**Dengdêr û taybetmendiyên wan:**

Dengên ji dev, bêyî ku rastî ti astengiyan bên derdikevin re **tîpên dengdêr** tên gotin.

Di Zimanê Kurdi ya latînî de "**8**" tîpên dengdêr hene û ev in:"**A E Ê I Î O U Û**"

**Ev jî dibin dû beş û ev in:** "Dengdêrên deng dirêj û dengdêrên deng kurt."

Dengdêrên dengdirêj: **"A Î O Ê Û"**

Dengdêrên deng kurt: **"E I U"**

**Li gor rewşa lêvan jî tîpên dengdêr dibin dû beş:** "Dengdêrên rast û dengdêrên girover."

**Rast:** "**A I E Î Ê**"

**Girover:** “**O Û U**”

**Dengdar û taybetmendiyên wan:**

Ew peyvên dengên wan heyîn lê bêy tîpên dengdêr nikarin deng derbixin ***(bêpêjin) re tîpên dengdar*** tê gotin.

Di zimanê Kurdiya latînî de **23** tîpên dengdar hene û ev in: **“B C Ç D F G X H J K L M N P Q R S Ş T V W Y Z**”

**Li gor awayê derxistina deng, dendgdar dibin dû beş:** “Dengdarên berdewam û dengdarên neberdewam.”

Dengdarên berdewam; ew dengên, deng didin lê bi awayê xwezayî nikarin derbikevin.

**Dengdarên berdewam:** “**F S Ş J Z R L X M N V W Y**”

Yên neberdewam jî; ew in ku bi serê xwe deng dernaxin.

**Dengdarên neberdewam:** “**B C Ç D G H K P Q T**”

**Li gor rewşa têlên deng:**

Di pêkhatina dengdaran de, li gor recifandin û nerecifandina têlên dengan jî, ji hev cûda dibin.

**a- Dengdarên Nerm:“B C D G X J L M N R V W Y Z**”

**b- Dengdarên Hişk:“Ç F H P Q R S Ş T K**”

***TÊBÎNÎ***

*Tîpên “**Ç K P R T”** hem hişk hem nerm tên xwendin.*

**Hevokên li jêr bi awayê nivîsîna dest weke li jêr hatî nivîsîn li lênûsa xwe binivîsin.**

Mamoste: “Dara! Ka pirtûka te?”

- Pirtûka min li mal ma ye.
- Çima te li malê hişt?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Bi taybet dema em dibêjîn nivîsînên civatî çi tê bîra me?**
**2- Di nivîsînên civatî de tiştên em digirîn berçav çine?**
**3- Çi taybetmendiyên tîpa dûçeng hene û sedemê ku ev ji tîpên din tê cudakirin çi ye?**

# JIXWE ŞERMÎ

Di van demê dawî de mereq dikim ji xwe şermî bi ku ve çû. Ez dabaşa jixwe şermiya wekî gelek xwe mezinkirin, ji xwe razîbûnê nakim. Ez dabaşa ji rêzgirtina bes ji bo xwe bilindkirin, sûdgirtin û xwe şîrînkirina li cem kesên din dikim.

Li nêzîkî cihê min, di cihekê de, zilamek bitemen dijî. Bivehês tevger dikir. Piçekî xwe mezin dikir û binavber daxivî. Pitirînê xwe di avahiyek tejî kesên xwidanê cihên kar tê de, di taxek biçûk de dirûnişt. Bidiravekî bêxêr debara xwe dike. Hatina wî diyar e. Lê dîsa jî, her dem bextewar e. Ji bo silava cîranek yê xwe, bi çi ve xerîk be heman demê amadeye dest jê berde.

Bipiranî hûnê wî bi cilên xebata hevgirtî, bi baxçê biçûk yê li pêşiya avahiyê ve xerîk bûyî bibînîn. Ji berya çend sala û pêde cihê taxê yê herî bireng, herî bi rêk û pêk afirandiye. Baxçê wî bi gul, kulîlk lîloz û gulên demsalî çi hebin, tejîne.

Carekê min ji wî pirsî; "tu çima ew qas li ser parçeyek xaka ne ya xwe dixebitî? Xwediyê malê guhê xwe jî nadê vî baxçeyî." Bersîv da û got: “Dibe ew guhê xwe nediyê lê ez didimê. Yê li vê derê dirûne ez im. Ev baxçe digihîje min. Ev jî sedemek bes e.” Jixwe ez jî li benda bersîvek wisa bûm. Mirovên rûniştvanên avahiyê yên din, pir ji wî hez dikirin.

Havîna borî, ez li Îsvîçreyê bûm. Her wekî yên serdana wêderê dikin, her kes jî dizane, jixwe şermiya netewî ya Îsvîçre hatiye rewşek toreyê.

Îsvîçreyî, gelek ji welatê xwe hezdikin. Ji wê re gelek rûmetê nîşadidin. Min dîtiye mirovên di her temenî de, ji kolan û dikanan gelaş rakirîn, yan jî yên derdor qirêj kirîn, hatîne gunehbarkirin. Dibêjin: “Ev der mala me ye. Ger me bivê, ev der paqij bimîne, pêwîst e ji xwe şermiyê zindî bigirin.”



Ev helwesta wan, bi alîkariya kesên li mal rûnîştîne, bi delalkirina derdor û danîna gulên di penceran de, didin nîşandan. Baxçên xwe bi rêk û pêk û xwedî dikin. Vê ji xwe re dikin, ne ji bo bandorkirina gerokan dikin.

Di encam de, temaşekirina welatekî paqij, rind û xwedîkirî, zewqek ya çavdêriyê dide mirovan. Lê belê li Emerîka ez bi xemgînî li derdora xwe dinêrim. Nivîsînên reşkirî li ser dîwaran dibînim. Malên me yên delal, taxên me, ji rizîbûnê re hatine hiştin. Dibînim ku bê xweyîbûnê hêlaye ku gelaş li her derî stûr bibe û kolan, dik tejî gelaş bibin. Parq û cihên lîstinan jî, ji wan ne cûda ne.

Ev nêzîkatî tê wê wateyê; “Tiştên ji derveyî mala min, ne berpirsyariya min e.”

Em tim dibîhîsin; “Madem kes guhê xwe nadiyê, ez çima bidimê?” Bi vî awayî em destûr didin ku cihên me yên ji bo raya giştî vekirî bibin, cihê kombûyîna gelaş û bikevin rewşa serguyî de. Em bixwe jî di nav vê pîsîtiyê de dijîn. Aliyê

wê yê êşdar, zarokên me yên ji xwe şermiyê dûr mezindibin jî vê dipejirînin û di rewşa alîkar de ne. Heman nêzîkatî didome û diçe û dibêjin; “Ne li xema min e! Min têkildar nake!”

Di zarokatiya min de xêzana min gelek hejar bû. Min tim cilên hevalên xwe werdigirtin. Pitirînê xwe pînekirî, biqasî biçav bêdîtin kevin bûn. Xaniyê me yê jiberya çend salan hatî çêkirin, xaniyek kevin bûyî bû. Lê her dem em paqij bûn.

Cilên me bi balkêşî dihatin şûştin û ûtîkirin.
Mala me, tim nû dihat arengkirin, çîmenê wê dihat birîn. Dayîka me, giringî dida cihê gula û baxçê bêzûran. Diya me, ji me re digot: “Zêde tiştên me nînin, lê çiyê me hebin, yê me ye. Em bi wê şanazin ku lê xwedî derdikevîn.” Demê me guhdariya wê nekira jî zêde ser me de nedihat.

(Jinivîsîna Leo Buscaglia (Leo Boskaglî) ya 1987’an hatiye girtin û kurtkirin.)

## PEYV

***Areng:*** *Boyax*
***Bêzûr:*** *Sebze*
***Westan:*** *Qerimîn, mandî.*

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Temaşeyî mijara jor bikin, ka cotxal li kûderê hatiye bikaranîn. Gava ku di nav hevokê de tiştek tê gotin, yan taybetmendiyên tiştekê tên rêzkirin yan jî wateya wê tê vegotin, **cotxal** tê bikaranîn.
**Mînak:**
Egîd got**:** “Were mal.”
Hogir**:** Miroveke pêşketî, zana, mêvanperwer û mêrxas bû.
Tîp**:** Hêmayekî dengan nîşanî me dike.

## PIRS

**1-** Gotinên pîremêr yên di derbarê xeric bûna baxçe de, şîrove bikin.

**2-** Nêzikatiyên Îsvîçre û Emerîka li ser nêzîkatiyên bi derdorê ve binîn himber hev.

**3-** Sûdên paqijiya derdor çi ne?

## CÛR Û AWÊN

Di nivîsîna we xwendî de hûn pêdihesin ku nivîskar rasterast bi we re daxive? Nivîskar dema mijarê şîrove dike, bêyî bikeve kûrahiyê, bi xwendekarê xwe re dikeve têkiliyê. Tenê ramanên xwe û tiştên li derdorê çêdibin şîrove dike.

Di van berheman de mijar gelek caran ji bûyerên rojane, ji cîhana hûner û wêjeyê yan jî nirx û jiyana hevbeş ya mirovan, tê hilbijartin. Ji nivîsên bi vî awayî re nivîsînên **civatî** (sihbetî) tê gotin.

Zêde dirêj nayên nivîsîn. Bipiranî civatî di rojname û kovaran de tên dîtin. Nivîsînên civatî, di nav civatê de, rasterast tên têgihandin.

## RÊZIMAN

**1-Tîpa duçeng:**

Di zimanê Kurdî de tîpên **"x"** û **"w"** dibin tîpa dûçeng.

Dema di peyvê de, tîpa **"x"** dikeve pêşiya tîpa **"w"** yê û bi hev re dengekê hevpar derdixin, em ji wan re dibêjîn **tîpa dûçeng**.

**Mînak:**

Xwendin, xwarin, xwidan û ... h.w.d.

**2- Li gel hevhatina dû tîpên dengdêr:**

Di zimanê Kurdî de dû tîpên dengdêr li gel hev nayên. Dema li gel hev tên jî, yan yek dikeve yan jî tîpa siwar di navbera wan de tê zêdekirin. Lê ger ev guhertin bandore li wateya peyvê bike, dibe weke xwe jî bimîne.

**Mînak:**

**Diaxivin**, li vê derê tîpa **"i"** hatiye xistin û bûye **Daxivin**.

**Çiya ê bilind**, li vê derê jî tîpa siwar **"y"** ketiye navbera her du tîpên dengdêr û bûye; **Çiyayê bilind**.

Peyvên li gor vê zagonê tevnegerin, ew ne peyvek zimanê Kurdî ye.

**Mînak:**

Seet, seadet, Seîd û ...


## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Li gor we nivîsînên rojane bandorek çawa di jiyanê de nîşadidin?**
**2- Di mijarê de hûn kîjan amojgariyê dibînin?**
**3- Kîjan taybetmendiyên vê mijarê ji yên mijara derbazbûyî cudaye?**
**4- Di zimanê Kurdî de li kîjan cihan deng tên guhertin?**

## HEVALTIYA RAST

30.03.2007

Hevala min; piştî pazdeh salan careke din ez ketim nav deryayeke bê dawî. Ez bi tenê bûm. Çavên min li te digeriyan heval! Lê qet nema, ez te bibînim. Hevala min a hêja Şîlan! Ez li wê hevaltiya te ya rast digerim.



Carek din di nav deryayek bê binî de, bi tena xwe ez mabûm. Bê te bûm û ji te dûr bûm. Bi hesreta te û kulmek axa welatê xwe mabûm! Li ser wê axê jîn tê bîra min; aax û hezar ax!

Ez careke din bi hevaltiyeke nerast re, wiha rû bi rû dimam. Piştî wê hevaltiya me ya rast, min êdî zû ew hevaltiya nerast didît. Pir zor bû ku ez beramberî ew qas zor û zehmetî bêm. Min kesayetên wiha, ketine pey berjewendiyên xwe yên kesî dîtin. Lê bizanibe hevala min, ez dizanim, kîjan hevaltî rast e. Hinek kesayetên wiha

berjewendîperest hene ku tiştek ne xema wan e. Tenê ji bo xwe veşêrin, dikarin her tiştên xirab li ser hevalên xwe bêjin.

Ez jî, ji bo vê yekê ketime nav deryayeke bê binî û ez mame bi tenê. Lê nûra li ser rûyên te ûhemû hevalên min ên şehîd, riya rast nîşanî min dide. Carek din berê min didederya jiyanê ya bê binî.

*Ş. Çîmen Herekol*

*Ji Pirtûka 'Rêwiyên Azadiyê'*



## PEYV

**Hesret:** Bêrîkirin
**Berjewendî:** Sûd
**Berjewendîperest:** Kesên tenê menfîeta xwe dihizire
**Nûr**: Tîrêj, şewq, ronahî
**Jîn:** Jiyan

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Gelo dema em bêhnokê datînin navbera du peyvan yan ji nav wan radikin, di wateyê de guhertinek çêdibe?

**Bêhnok:**

Di nav hevokê de, cihê mirov lê bêhna xwe veke nîşa dide. Bi vî awayî xwendina hevokê hêsantir dike. Lê divê ev bikaranîn wateya hevokê neguherîne. Ango bêhnok di cihê xwe de bê bikaranîn, ji ber bêhnok ne di cihê xwe de bê bikaranîn an li cihê pêwîst e hebe, neyê bikaranîn, dibe ku wateya hevokê xira bike.

**MÎNAK:**

Hevala min a hêja Şîlan**!** Ez li wê hevaltiyate ya rast digerim.

Dema em temaşe dikin, dibînin ku dû nav bi bêhnokê ji hev tên cudakirin.

Hevokên rêzî, bi bêhnokê ji hev tên cudakirin.

**MÎNAK:**

Lê bizanibe hevala min**,** ez dizanim**,** kîjan hevaltiya rast e.

## PIRS

**1**-Li gor we hevaltiya rast çawa ye?
**2**-Ji bo hevaltiyeke rast pêş bikeve, çi pêwîst e?
**3**-Tişta Ş. Çîmen Herekol bi jiyanê ve dide girêdan çi bû?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsîna we xwendî, cûrê nivîsîna rojane ye. Ji ber di nivîsandinê de dema pêkanîna bûyerê hatiye nivîsîn, dîroka rojê jî lê hatiye zêdekirin. Ji nivîsandinên bi vî awayî re em dibêjîn **nivîsînên rojan e(rojnivîs)**.

Nivîsînên rojane yên baş hatîn girtin, di jiyana mirovan de bi rêkûpêkiyek girîng e. Girtina nivîsînên rojane dibe dewlemendiyek çandî û ramanî. Ji bo nivîsînên rojane pîlan nayê çêkirin. Piştî nivîsîna dîrokê, rasterast derbazî mijarê dibe. Hevokên tên bikaranîn, pêwîst e kurt, têgihiştî û bibandor bin.

Nivîsînên rojane, ne ji bo weşandina di kovar û rojnameyan de tên nivîsîn.

Cudabûna di navbera nivîsînên rojane û bîranînê de, nivîsîna dîrokê ye.

## RÊZIMAN

**Cihguhertina dengan:**

Di zimanê Kurdî de dema tîpên dengdêrên dengdirêj dikevin pêşiya tipên siwar, ew tîpa dengdêra dengdirêj cihê xwe ji tîpa dengdêra deng kurt re dihêle.

**MÎNAK:**

Rê + ya min = Riya min.
Rû + yê min = Ruyê min

Her wiha dema tîpa dengdêra deng kurt bikeve pêşiya tîpa **"h"** yê, em dikarin tîpa **"h"** û tîpa dengdêra dengkurt rakin û di şûna wan de tîpekê dengdêra, dengdirêj bikarbînin.

**MÎNAK:**

Kehnî=Kanî
Buhtan=Botan
Mih=Mî
Cih=Cî

## HÛNANDÎ

Hûnandî ew nivîsînên ku hestekî, ramanekî, yan bûyerekî bi awayê vehûnandî didin diyar kirin re em dibêjîn **hûnandî**.

Hûnandî di nav xwe de dibe dû beş:

**1-**Destan: Ev cûre nivîsîna wêjeyî bi dû raweyan hatiye naskirin. Yek jê ew nivîsînên li ser lehengiya ne. Ji aliyê gelan ve hatine hilberîn. Bi awayekê hûnandî li gel pîvanê têne sazkirin. Ev bûyerên girîng in ku bi serê netewan ve hatine, cengên wan bi awayekî çêbûyî hatine vegotinkirin.

Dû cûrên destanê hene:

**a-**Destana xwezayî

**b-**Destana çêkirî

2-Helbest: Em ji wan nivîsînên hest, raman û xiyalan bi awayekê hûnandî, bi rêzik û malikan vegotindikin re dibêjin **helbest**.

Dawiya rêzikên helbestan bi peyv û dengên wekhev dawî lê tê.

Di nivîsên helbestî de, hestek bingehîn heye. Ev hest di tevayî helbestan de berçav tê girtin. Em ji vê hesta sereke re **soje (tema/têma)** dibêjin.

Ji ahengiya dikeve li dawiya rêzikên helbestê re **kafiye** tê gotin.

Ji wekheviya peyv yan pêvekê piştî kafiyê bi heman wateyê tên nivîsîn re dibêjin **redîf**.

Ji awayê hatina peyvên ku tên gel hev û wateyekê tekûz didin re **rêzik** tê gotin.

Dema çend rêzik tên gel hev û bi hev re watedar dibin re **malik** tê gotin.

Navê malikan, li gor jimara rêzan tê danîn.

**Mînak:**

Ji dû rêzikan re **cotik** û ji çar rêzikan re jî **çarik** tê gotin.

Helbest li gor mijara xwe wiha têne rêzkirin:

**1-** Helbesta pastoral

**2-**Helbesta epîk

**3-**Helbesta sembolîk

**4-**Helbesta dîdaktîk

**5-**Helbesta dramatîk


**6-**Helbesta satirîk

**7-**Helbesta lîrik

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ


1- Bi xwendina helbestan xurûşek çawa bi we re pêş dixe?
2- Li go-r we, çi cudahî di bavbera nivîsînên pexşan û hûnandî de heye?
3- Di helbestê de qafiye li kûderê tê bikaranîn?

# COTYAR Û ZEVÎ



Zevîkê ez negêj im.
Te j' bîra xwe bavêjim.
Bizane ez çi d'bêjim.
Kul û derdan ved'rêjim.

Ser û bin jan û êşim.
Hew vê janê ved'kêşim.
Heke te ne parêzim.
Bizane ez nemêr im.



Zevîkê bo te d'bêjim.
Natirsim ez diwêrim.
Mêr im têra xwe fêr im.
Xudanê tevr û bêr im.

Cotyarê destqilêr im.
Nev'yê Kawey' Dilêr im.
Sozbit, yar te bikêlim.
Ji bo zordar nehêlim.

Serê çepel vehêrim.
Nav axa te veşêrim.
Yan xwîna xwe birêjim.
Hingê pitir dihêjim.

Serbest û şad û têr im.
Şehîdê xakê, zêr im.
Li cem milet birêz im.
Li cem milet birêz im.

*Sebrî BOTANÎ*

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Malika li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsîn û bixwînin.

zevîkê ez negêj im.
te j' bîra xwe bavêjim.
bizane ez çi d'bêjim.
kul û derdan ved'rêjim.

## PIRS

**1-** Nivîskar pesnê çi dide?
**2-** Malika duwemîn şîrove bikin.

## CÛR Û AWÊN

Nivîsînên li gor pîvan û qafiya hatî bi rêkûpêk kirin û bandorê li hestên mirovan dikin re **helbest** tê gotin.

Helbesta li jor, helbestek **pastoral** e.

Helbestên pastoral; helbestên xwezayê ji xwe re dikin mijara şîrove yê. Jiyana şivan û gavanan, jiyana gundan, çanda çiyan, tore û kevneşopiyên zozanan û xweşikbûna xwezayê dibin mijarên sereke yên helbestên **pastoral**.

Helbesta li jor qafiyeya; ji qafiya tam û dewlemend pêktê.

RÊZIMAN

**Lêdan û giranîdayîn:**

**a- Lêdan:**

Dema em temaşeyî nivîsînê dikin, dibînin ku, endamek li gor yên din hîn bêhtir tên lêdan û bihêztir tê gotin, em ji vê re dibêjin **lêdan**.

**Li gor yekîneyên ziman sê cûrên lêdanê hene:**

**1-** Lêdana peyvê

**2-** Lêdana birepeyvan

**3-** Lêdana hevokê

**1- Lêdana Peyvê:**

Cotyarê dest qilê**rim.**

Nev'yê Kawey' Dilê**rim.**

Soz**bit**, yar te bikê**lim.**

Ji bo zor**dar** nehê**lim.**

Wek li jor jî tê dîtin, di zimanê Kurdî de lêdana peyvê bi awayekî giştî di kiteya dawî de ye. Lê li gor pêveka girtî û cih, tê guhertin.

Di navê welat û herêman de piranî dikeve li ser kiteya destpêkê. Di nave kesan de dikeve li ser kiteya dawî.

**2- Lêdana Birepeyvan:**

Piranî lêdan dikeve ser peyva destpêkê.

**Mînak:**

**Xort**ên me.

**3- Lêdana Hevokê:**

Hevok, birek yê darezandinê ye ku li ser kar tê avakirin. Di rewşa asayî de lêdan li ser vê endama bingehîn e.

**Mînak:**
Egîd **<u>ket</u>**.
Gul **<u>ciwan e</u>**.

**b- Giranî (tonlama):**

Di demê axaftinê de deng binavber tê guhertin. Ji perdeyekê derbazî perdeyekê din dibe. Nizim dibe, bilind dibe, hişk dibe, nerm dibe.

Ji taybetmendiya perdeya deng ya axaftinê re **giranî** (tonlama) tê gotin.

Hevokên li gor çêbûna xwe, xwerû ji wan re giraniyek navîn tê xwestin.

**Mînak:**
Ez çûm dibistanê.

Di hevokên pirsyarî de jî giraniyek bilind tê xwestin.

**Mînak:**
Ma tu çuyî dibistanê?

## HÎNDARÎ

**Vê nivîsîna li jêr bi awayê nivîsîna xweşîk li lênûsa xwe binivîsin.**
Ser û bin jan û êş im.
Hew vê janê ved’kêşim.
Heke te ne parêzim.
Bizane ez nemêr im.

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

**1- Gotar li kûderê tê nivîsandin?**
**2- Di nav civakê de hebûna kesên navdar çi didin wê civakê?**

# DI CIVAKÊ DE PÊŞENGTÎ

Hebûna civakekê bi pêşengên xwe, pêşeroja xwe diyar dikin. Her civak xwedî pêşeng e. Civaka bê pêşeng,nikare hebûna xwe ji tinebûnê rizgar bike. Pêşengî, nirxekî demokratîk û komînal yê civakekê ye.

Her wiha di dîrokê de gelek rengên rêbertiyê pêşketine. Rêbertiya ku li ser neteweke çêdibe, jê re rêberê wê netewê tê gotin. Lê ya ku li ser netewan çêdibe, jê re rêbertiya netewan tê gotin. Berê jê re digotin, rêbertiyên enternasyonalîst. Niha em jê re dibêjin pêşengên netewan. Lê gelek netew û gel wî/wê ji xwe re wek rêbertî dipejirînin. Dîsa rêbertiya gelan, çînan, zayendan, olan, mezheban, eşîran çêbûne û çêdibin. Her wiha di çand, wêje, hûner û teknîkê de jî gelek pêşengîtiyên wiha çêbûne û çêdibin. Kêsên ku bi wê hûnerê re pêşengî kirine, heke di hûnerekê de gavek nû pêşxistibin, wê demê jê re pêşengê hûnerê dibêjin. Kesê di wêjeyê de gav avêtibin, dibe hostayê wê wêjeyê. Kesê ku rêbertî ji olekê re kiribe û olek nû pêşxistibe, dibe



rêberê wî olî, yan jî ew ol bihêz kiriye. Her wiha gelek rengên pêşengan derketine.
Di mijara pêşengiyê de yên pêşengiya gelekê kirine hene. Ango rêbertî û pêşengî kirine. Car din çînên ku çînekê re pêşengî dikin, hene. Di ol de jî olên ku pêşengiyê dikin, hene. Mînak: Di dîrokê de dibêjin, gelê Fransa gelekî pêşengî kiriye. Çima wiha dibêjin? Ji ber ku pêşengiya şoreşa Fransayê bandor li ser hemû gelan kiriye û gelek şoreşan mînakên xwe ji şoreşa Fransayê girtine. Jê sûd girtine û wê ji xwe re dikin bingeh. Ji ber wê çendê gelê Fransa dibe gelekî pêşeng.

Di Mezopotamya yê de jî gelê Kurd pêşengî ji şoreşa neolîtîkê re kiriye. Vê şoreşa neolîtîk pêşengî ji mirovahiyê re kiriye. Her wiha navenda vê şoreşê, ya ku dergûşvanî ji mirovahiyê û ji pêşengên mirovahiyê re kirî û civakên cîhanê ji xwe re mînak digirin, yek ji bajarê pêxemberan Riha ye.



## PEYV

**Komîn:**Kombûn, Ji yekê zêdetir hatina gelhev ya heyînan
**Enternasyonalîst:** Parastina navnetewî, li ser netewan re ye.
**Mezheb:** Beşek ji bewariyên olî
**Mezopotamya:** Erdnîgariya di navbera robarê Dîcle û Firat
**Riha:** Bajarekî bakurê Kurdistanê ye
**Neolîtîk:** Şoreşa çandiniyê

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

***Hêmaya Birînê (Dabir):***
*Pêvekên dikeve li ser jimaran bi dabirê jê tê cudakirin.*
***Mînak:***
*Di 13'ê Îlona sala 1995'an de Heval Jiyan şehîd ket.*
*Di 27'ê Mijdara 1978'an de PKK hatiye damezirandin.*

## PIRS

**1-** Li gor we serkeftinên mezin yên netewekê tê çi wateyê?
**2-** Kî nûnertiya serkeftinên netewan dikin? Çima?
**3-** Gelê Kurd çima dergûşvanî ji mirovahiyê re kiriye?

## CÛR Û AWÊN

Agahî dayîna di mijarekê de, piştgirî dayîna nêrînekê yan jî nivîsênên bi armanca daxuyaniyekê hatîn nivîsin re **gotar** tê gotin.

Di gotarê de çespandin û diyar di plana sereke de ne. Armanca gotaran, bi mijarên aliyê wan yên zanistî li pêş, xwendevanên xwe ronî dikin û rayagiştî pêktînîn e.

Gotar, pitirînê xwe di rojname û kovaran de tên weşandin. Ji gotarên mijarên wan nû, dikevin pêşiya rojnameyan re **gotarên sereke** tên gotin. Lê belê gotarên di kovaran de tên weşandin; têkîldarî mijarên civakîn e.

Erkê herî girîng yê gotarê; bandorkirin, berdayîn, perwerdekirin û gihandina xwendevana ye.

RÊZIMAN

**Peyv û Cûrên Wê:**

Peyv, yekineyên ziman yên watedar in. Peyvên "netew, cuda, ciwan, Kurd" yên di mijarê de biwate ne. Di nav peyvên bi wate de, ji aliyê bikaranînê ve hinek cudahî tên dîtin. Li gor vê; peyv di wateya rast, **mecaz**, **hevwate**, **dijwate, hevdeng** û **hevtîp** de tên bikaranîn.

**1- Wateya rast:**

Dema em peyvên "roj, gel, civak" dixwînin di serê me de, heman wate diyar dibin. Dema em li ferhengê binêrin, emê bibînîn ku wateya di serê me de diyarbûyî û wateya ferhengê wekhev e.

Ji bo wan wateyên peyvan yên ji aliyê her kesî ve tên zanîn re **wateya rast** tê gotin.

**2- Wateya xaze (mecaz):**

Di hevoka "Tû reş dihizirî." de, peyva "reş" ne li gor wateya xwe ya rast e. *Di wateya, reşbîniyê de ye*. Dibe ku wateya vê peyvê ji aliyê her kesê ve neyê zanîn.

Peyvên ne di wateya xwe ya rast de, di wateyek din de hatî bikaranîn re **xaze** tê gotin.

**3- Peyvên dijwate:**

Ji wan peyvên nivîsîn û wateya wan ne wekhev û di aliyê wateyê de dijberî hev re **peyvên dijwate** tê gotin.

**Mînak:**

Reş – spî
Dirêj – kurt

**4- Peyvên hevwate:**

Ew peyvên ku di aliyê wateyê de heman lê di aliyê nivîsînê de ji hev cuda re **peyvên hevwate** tê gotin.

**Mînak:**

Gotin - peyv - bêje
Ber - kevir

**5- Peyvên hevdeng:**

Ji peyvên ku xwendin û nivîsîna wan yek lê wateyên wan ji hev cuda re **peyvên hevdeng** tê gotin.

**Mînak:**

Ez li ser **gir** rûniştibûm.

Ew mirovek **gir** e.

**6- Peyvên hevtîp:**

Ew peyvên di nivîsandina xwe de wekhev lê di deng û wateyê de, ji hev cuda re **peyvên hevtîp** tê gotin.

**Mînak:**

**Çal:** Ji bo heyînên eniyan wan spî tê gotin.

**Çal:** Çala avê.

## HÎNDARÎ

**Destnivîsa jêr bi awayê nivîsîna rast li lênûsa xwe binivîsin.**

Hebûna civakekê bi pêşengên xwe, pêşeroja xwe diyar dikin. Her civak xwedî pêşeng e. Civaka bê pêşeng nikare hebûna xwe ji tinebûnê rizgar bike. Pêşengî, nirxekî demokratîk û komînal yê civakekê ye

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Nivîsîna ramanî cûre nivîsînek çawa ye?**
**2- Di mijarê de kêmbûna mêşan ji çi pêk tê?**
**3- Cudahiya di navbera navên taybet û navên giştî de hûn dibînin?**

# MÊŞÊN HINGIVÎ

Salekê, min mêşên hingivî nedidîtin. Kêmbûna van tebayan, bala gelê Xakûrkê jî kişandibû. Piştre em fêr bûbûn ku karanîna dermanên kîmyawî ya li ser kûlîlkan bûye sedema tinebûna van tebayên giranbiha.



Roja borî li nav daristanê, li ber bêhna kulîlkan, di nav bayê hênik de

dimeşiyam. Bi carekê bi dengekê xweş, ji nav xiyalan hilbeyîm. Dengê dihat guhê min, bala min dikêşa. Ji nişka ve rawestiyam. Guhê minê ku ji dengê awazê dosta xwe, xerîb mayî, di nav beşişînê de bûn pêl.

Mêşa hingivî ne tebayek ya biharê ye. Bixwe bihar e. Dengê awazên wê, weke bêhna biharê, dilê mirovan xweş dike. Bi qurmê darekê ve gulatokên mêşan û awayê tevgerên wan li ser xiyalên me yên rewanî çi zêde nakin? Daristaneke bêdawî, di nav keskahiya wê de mirov bêhiş dibe… Di nava vê keskahiyê de herikîna kaniyan, dengê bêrîvanan û dengê zengilên li stûyê nêriyan, vê xwezayê rengîntir dikin.

Di nav van hemû xweşiyan de, hizirîna mêşên hingivî û awazên wan...

Bêguman mêşên hingivî tebayên wênevan, helbestvan a ji bo pêkanîna gelek karan, dermankirina gelek nexweşan, hizirîna gelek tiştan hatiye afirandine.



## PEYV

**Xakûrk:** Navê herêmekê girêdayî Başûrê Kurdistanê.
**Gupik:** Cihê herî bilind yê dare.
**Beşişîn:** Kenîna hêdî (tebesûm).
**Gulatok:** Koma mêşan.
**Hilbeyîn:** Veciniqîn.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Ez bawer im di mijarê de li peyhev hatina sê xalan bala we kêşa ye. Li gor we ev sê xal ji bo çi hatine bikaranîn?

Dema ku mirov bixwaze bide zanîn ku nivîsîn bi dawî nebûye yan jî peyvên di hevokekê de mirov naxwaze binivîse cihê wan sê xal tên bikaranîn.

**Mînak:**

Di nav van hemû xweşiyan de, hizirîna mêşên hingivî û awazên wan...

Ger ji nav gotina yekî din tiştek hatibe derxistin, wê gavê jî mirov sê xalan di nav kevanokê de datîne û dide diyarkirin ku gotina wî/ê ya hatî girtin, netemam e.

**Mînak:**

Ehmedê Xanî dibêje:
“Ev meywe **(...)** ne avdar e.
Kurmancî ye ew qeder li kar e.”

## PIRS

**1-** Çima nivîskar ew qas ji mêşên hingivî xerîb bûbû?
**2-** Sedema mirina mêşên hingivî yên giranbiha çi bû?
**3-**Taybetmendiyên mêşên hingivî çi ne?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsînên, wek nivîsîna rojname û kovar, cûrek yê nivîsînên ku mijarekê pêşkêş dike, wê diparêze lê ji xwendevanên xwe re çespandin (îsbat) nake re dibêjîn **nivîsînên ramanî**.

Awayê mîsoger ya ku di gotarê de tê dîtin, di nivîsînên ramanî de ne di plana yekemîn de ye. Nivîskarê nivîsînên ramanî jî dixwaze nêrîna wî bêpejirandin û raste rast ji kûrahiya hizrên xwe, nêrîna xwe dide pêş.

## RÊZIMAN

Ew peyvên ku heyînekê bi me didin naskirin, jê re nav tê gotin.

**a-Nav li gor teybetmendiyên xwe dibin sê beş:**

**1-** Navên taybet
**2-** Navên giştî
**3-** Navên Koman (Komenav)

**1- Navên taybet:** Ew navên ku heyînekî tenê bi me didin nasîn re **navên taybet** tê gotin.

**Mînak:**

Karwan, Amed, Kurdistan, Asya, Soran...

Dema em navekî ji van dibêjin, tenê heyînek tê ber çavên me. Her çiqas dema em dibêjin Karwan, dizanin ku gelek kesên binavê Karwan hene ,lê Karwanê em dabaşa wî dikin, ji yên din cûdatir e. Ji ber wê çendê ji heman navî hebûna navan, gotina me ya dibêje heyînekê tenê bi me dide nasîn vala dernaxe.

**2- Navên giştî:** Ew navên gelek heyînan yên ji heman cûrî, bi me didin nasîn re **navên giştî** tê gotin.

**Mînak:**

Mirov, lawir, dar, dibistan, pênûs...

Her yek ji van navên jor, gelek heyînên ji heman cûrî bi hev re dane nasandin. Wek; peyva **"dar"**; dema em dibêjin **"dar"**, hemû cûrên daran bi me dide nasîn. Cudahiyê naxe di navbera dara sêv, hêjîr û mêwê de.

**3- Navên koman:** Ew peyvên komek heyînan bi me dide nasîn û di aliyê wateyê de heyînek bitenê pê nayê navkirin re dibêjîn **navên koman**.

**Mînak:**

**Kerî;** dema gelek pez tên gel hev, ji vê kombûna wan re kerî tê gotin. Yanî mirov nikare ji pezekê re bêje kerî.

**b- Nav li gor wateya xwe dibin dû beş:**

**1-** Navên şênber

**2-** Navên razber

**1- Navên şênber:** Ew navên ku mirov hebûna heyînan bi her yêk ji pênç lebetên xwe yên pêhesînê, pêdihese û heyînan dide nasîn re **navên şênber** tê gotin.

**Mînak:**

Mirov, ba, bêhn, tam, deng...

Her yek ji van navan, navên şênber in.

**2- Navên razber:** Ew navên ku mirov heyînan bi her pênç lebetên xwe yên pêhesînê, hebûna wan pênahese lê ji hebûna wan tê bawerkirin re **navên razber** tê gotin.

**Mînak:**

Namûs, aqil, exlaq, azadî, bawerî...

Her yek ji van peyvan, navekî razber in. Ji ber ku ev nav; nayên dîtin, bêhnkirin, girtin, tamkirin û bihîstin lê ji hebûna wan tên bawerkirin.

## HÎNDARÎ

**1-**Çend navên şênber peyda bikin û di refê de ji hevalên xwe re bêjin.

**2-**Çend navên razber peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Hûn çi cudahiyê di navbera mijara serbest û taqîkirinê de dibînin?**
**2- Dema hûn taqîkirinê binîvîsînin, hûn balê dikişînin ser çi?**

## MIJARA SERBEST

# TÊKÎLIYA ÇANDÊ BI ZIMAN RE



Ziman têgeha ramanî ya çandê ye. Mirov hest, hizir û pêwîstiyên xwe bi ziman rave dike. Ji ber vê çendê karanîna ziman, di pêşketina civakan de cihekî girîng digire.



Civakek, bi parastin û pêşxistina zimanê xwe û hebûna xwe dide diyarkirin. Hatina gelan ya vê rojê girêdayî pêkanîn û pêşketina ziman e. Ziman têgehên çandê ji nifşekî radigihîne nifşekî din. Mirovên ku karî zimanê xwe bikarbînin, nivîsandin jî di nav de ew xwedî pêşerojeke bihêz in.

Cihê ku ziman û hizirîn di nav de ye, cihê ku herî bi asanî dewlemendiya çandê lê tê dîtine. Çand bixwe bi awayekî herî berfireh pênasekirina ziman û hizir e.

Mirov hemû çêkerên xwe bi hizirînê dafirîne. Di hemû destkeftiyên ku afirandî de, vedana hizrên wî/ê tên dîtin. Belkî civakek yan jî her komek din ku li gor zihinyeta xwe hemû afirandina negihînin dawîbûnê. Ew kom an jî civak di ziman û hizirê xwe yê dîroka derbazbûyî de, hemû destkeftiyên ku afirandî

li dewsa wê hildigir e.

Têkîliya çand-hizir û çand-ziman di aliyên cudahiya nasnameyên civakan de girîng e. Ji ber vê çendê nav û zimanê her gelekî, ji yên din cûda ye. Ziman girîngiya têkîliya mirov dide zanîn.





# HERÊMEK YA KURDISTANÊ



Bi ked û xwihdana şehîd û Rêbertiya me û xiyalên gelek yên ku rizî û zuwabûyî ji nû ve şîn bûn. Her çêbûnek birastiya xwe ya cewherî, ji nû ve ketiye tevgera têgihiştinê. Hewaya azadiyê bi şêweyeke herî xurt dest bi herikînê kiriye. Ev hewaya azadiyê hemû Kurdistan girtiye nav xwe. Herêma ku ev bîranîna hewaya azadiyê bi xwe re jiyankirî, Botan e. Botana ku di agirê Mezopotamyayê de hebûna xwe dayî pêhesîn, xweşikiyên xaka pîroz ya dayîka xwedawend di hembêza xwe de hilgirtî, şopên kûr yên çanda dayîka xwedawend. Tê de tên dîtin. Bi xweşikiyên xwe yên dîrokî ku bûye mijara roman, film û helbestan, watekirina wê zore. Divê mirov bixwe di nav xweşikbûnên Botanê de jiyankirî be.

Xaka Mezopotamya ku landika mirovahiyê ye, erdnîgariya ku weke diyariya jiyanê tê watekirin, bi herikîna çemên xwe yên Firat û Dîcleyê, weke kaniya bûhiştê difûre û xweşikiyek reng bi reng dide derdora xwe. Bînerên van xweşikiyan şikeftên wê, bermayên dîrokî ta roja me jî xwe li ser lingan digire. Ji van GemiyaNûh ya ku herî xweşik û dîrokî heta rojame jî bicoşa xwe ya mezin tê bîranîn, bi xweşikiyên xwe di dil û giyanê mirovan de, bi nikirandinên hûr weke neqşan tên bikaranîn.



Botan kulîlkek ciwane, di nav agir de direqise .Nebûna heyrana vê reqsê û bêhiş nebûyîn, bêbextewariyeke. Bitaybet ew rezên tirî yên Botanê bi ser Baxçeyên Babîl ve diçin, bi darên xwe yên behîv û gozan, bi avên xwe yên ku diherikin, serkani ya jiyanê ye. Wek hemû erdnîgariya Botan, çanda wê, rêbaza jiyana wê , bixwezayê re havên bûye.Hembêza wê bixwîn û rondikan hatiye avdan. Bûye agire ku ti caran niyaza xwe ji şervanên azadiyê qutnekiriye.

Di rastiyê de Botan efsaneyek e.
Cihê ku Mem û Zîn tê de jiyan e. Cihê ku evîndarên mezin û girêdanên mezin lê hatine jiyankirin û bîranîn tê de hatine nivîsîn. Ji ber vê sedemê ye ku keç û kurên Botan di asta evîndariyekê de bi xaka xwe ve girêdayîne. Wek heval Zafer. Mirovên vê herêmê evîndarî û bêrîkirinên xwe bihestên herî xweşik kirine mijara helbest û wêjeyê. Yek ji van cihên herî di navenda Botanê de cihdigire, Cûdiyê Mirada ye. Serbilindiya xwe ji nirxên mirovahiya di Botanê de pêşketiye daye nîşandan. Di hembêza xwe de gelek kesayetên pêşeng parastine û bûye parêzvanê civaka Botan. Bêgûman Cûdî malûvanî ji mirovahiyê re kiriye. Li aliyek Cûdî; Şarê Nuh, li aliyekî Heftanîn, li aliyekî din jî Gabar cih digire.
Cûdî her tim bûye stargeha civaka Kurd û mirovahiyê.



## PEYV

**Xwedawend:** Dayîka Xuda
**Bîner:** Şahid
**Nikirandin:** Awa dayîna keviran
**Baxçeyên Babîl:** Qralê Babîlê, ji bo Xwêdêwanda Semîramîs vî baxçeyî dide çêkirin.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Neynok (dunik):**

Dema ku mirov gotinekê ji devê yekê din bigire, mirov wê gotinê di nav neynokê (“ ”) de nîşan dide. Her wiha hevpeyvîn jî bi xêzika axaftinê neyê nîşandan, dikeve nav neynokê. Dîsa peyva ku ji bilî wateya xwe ya bingehîn, ji wê re navek hatibe dayîn ew nav dikeve nav neynokê.

**Mînak: I**

**Rêber Apo wiha dibêje: "Azadiya jinê azadiya civakê ye."**

**Mînak: II**

Sosinê: “Navê te çi ye?”
Derya: “Navê min Derya ye.”

**Mînak: III**

Yekemîn rojnameya Kurdî, "Rojnama Kurdistan"e.

## PIRS

**1-** Botan dikeve kîjan aliyê Kurdistanê?
**2-** Çima herêma Botanê dergûşî ji mirovahiyê re kiriye?
**3-** Hûn ji vê mijarê çi têdigihin?

## CÛR Û AWÊN

Cûre nivîsîna li jor **taqîkirin** e. Ji ber ku nivîskar ramanê xwe yê di derbarê mijara danî holê de, hestên xwe tîne ziman û nêrînên xwe nasipêre çespandinê. Nakeve xema nebawerkirinê jî. Serbixwe ye. Ji ber serbixwebûna kesî, taybetmendiya herî girîng ya taqîkirinê ye.

Taqîkirin, cûre nivîsîneke di sedsala XVI (16) an de, di bin rêveberiya nivîskarê Firansî Montaigne (Monteyin) de derketiye holê.

## RÊZIMAN

Li gor yekjimarbûn û pirjimarbûnê nav dibin dû beş:
**1-** Navên yekjimar.
**2-** Navên pirjimar.

**1-** Ew navên ku pêveka pirjimariyê nagirin û di aliyê jimarê de yekjimariya heyînan bi me dide nasîn re **navên yekjimar** tê gotin.

**Mînak:**
**Botan** efsaneyek e.
**Cudî** çiyayekî biheybet e.

**2-** Ev cûre navên ku pêvekên pirjimariyê yên **"ên, an, na"** digirin û gelek heyînên biheman navî bi hev re bi me didin têgihandin, jê re **navên pirjimar** tên gotin.

**Mînak:**
Şervan**ên** azadiyê, meşa serkeftinê destpê kirin.
Ciwan**an** li Rojhilat çalakî li darxistin.
Heval**na** di derbarê şoreşa Rojavayê Kurdistanê de daxuyanî dan.

## HÎNDARÎ

Hûn jî dû navên yekjimar û dû navên pirjimar li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Bandora zimanê biyanî ya li ser zimanê me hûn dikarin têbigihin?**
**2- Di aliyê xurûşê de ciyewaziya vê mijarê û mijara derbazbûyî çiye?**
**3- Hûn dikarin navekî tûredayî û navekê hevgirtî di mijarê de peydabikin?**


# WELATÊ MIN

Xwe nespêre dijminê hov bi nezanî.
Xwe nexapîne çar gotinên biyanî.
Li ser te cangoriyan serê xwe danî.
Ma tu dixwazî nav de bibî dilmanî.

Te em kirin sêwî, hiştin berdîwaran.
Rêberên me tev birin li ber sêdaran.
Amedê hilawistin Ş. Seîdê Pîran.
Îro jî dixwazin, dawiya OCALAN.

Careke din ji bo min, bibe cih û war.
Dê roj derkeve ser te çêbibe bihar.
Wê azad bibe, gelê bindest û hejar.
Emê bêjin mîlada me ye 27'ê Mijdar.

**Şehîdek Nemir**

## PEYV

**Biyanî:** Xerîb
**Mîlad:** Zayîn
**Sêwî:** Bavmirî
**Sipartin:** Pesartin

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Dibe ku li dawiya rêzikên di malikê de bêhnok bê bikaranîn, lê neçarîn di dawiya malika helbestê de xalê bikarbînîn.

**Mînak:**

Careke din ji bo min, bibe cih û war**.**
Dê roj derkeve ser te çêbibe bihar**.**
Wê azad bibe, gelê bindest û hejar**.**
Emê bêjin mîlada me ye 27' Mijdar**.**

## PIRS

**1-** Ger em bi peyvên biyanî xwe bixapênin wê çi bibe?
**2-** Kengê wê bihara welatê me bê?
**3-** Ji bo rêberên Kurdan neyên darvekirin pêwîst e em çi bikin?

## CÛR Û AWÊN

Weke di mijara derbazbûyî de we dîtî, nivîsîna jor nivîsîneke hûnandî ye. Ji ber gotina wê bandorê li hestên mirovan dike û pîvan û qafiye têde bingeh hatiye gir-tin.

Hûnandiya li jor helbest e. Helbesta li jor, helbestên **epîk** in.

Helbestên epîk; ew helbestên ku mijara wan li ser şer, lehengî, Egidî û welatparêziyê ye.

Bûyerên dîrokî bi kelecanekê vegotin dike. Di heman demê de ji van helbestan re **helbestên destanî** yan jî **helbestên lehengî** jî tên gotin.

Helbesta li jor ji ber ku bipîvana qafiyan û kiteyan pêkhatiye helbestek bipîvan e. Ev helbest ji qafiya tam û dewlemend pêkhatiye.

Her rêzikek yê vê helbestê ji 12 kiteyan pêkhatiye.

## RÊZIMAN

**Nav li gor çêbûna xwe dibe sê beş:**

**1-** Navên xwerû.

**2-** Navên tûredayî (dariştî).

**3-** Navên hevgirtî.

**1- Navên xwerû:** Ew navên kû pêvekên sazker negirtî û bi peyvek din re navekî din ne dayî afirandin, jê re dibêjîn **navên xwerû**.

**Mînak:**

Careke din ji bo min, bibe **cih** û **war**.

Dê **roj** derkeve ser te çêbibe **bihar**.

Wê **azad** bibe, gelê bindest û **hejar**.

Emê bêjin mîlada me ye 27'ê Mijdar.

Weke hûn di malikê de jî dibînin, peyvên reştir hatîne nivîsîn, navên xwerû ne. Ji ber ku pêvekên sazker û hevgirtin bi peyvek din re çê nekirine.

**2- Navên tûredayî (darişţî):** Ew navên xwerû yên ku pêvekên sazker standî û wateyek nû bidest xistî, jê re **navên darişţî** tê gotin.
**Mînak:**
Evîndar, şervan, nalbend, gundî ...
Dema em temaşeyî van peyvan dikin, dibînin ku peyva **“evîn”** bi girtina pêveka **“dar”**, peyva **“şer”** bi girtina pêveka **“van”**, peyva **“nal”** bi girtina pêveka **“bend”**, peyva **“gund”** bi girtina pêveka **“î”** li ser bingehê navê heyî, navek nû hatiye sazkirin.
**Têbinî:**Navên darişţî ji nav û pêvekek sazker çêdibin.
**3- Navên hevgirtî:** Ev cûrê navan yên ku ji dû peyvan pêkhatî û wateyek nû dayîn pêşwazîkirin re **navên hevgirtî** tê gotin.
**Mînak:**
Cegerxwîn; ev nav ji dû navên cûda yên weke **“Ceger”** û **“xwîn”** pêkhatiye û bûye navek. Her wiha navê **“sor-gul”** jî, ji navên **“sor”** û **“gul”** ê pêkhatiye û bûye navê gulekê.

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî helbestek epîk peyda bikin û ji hevalên xwe re bixwînin.
**2-**Navên li jêr di nav hevokê de bikarbînin.
Dar, av, aş ,Hilket, raxist, solbend
Rûken, dilgeş, çavreş


**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

**1- Çima Rêbar Apo dibêje: “Rûmeta min, rûmeta gel e”?**
**2- Ji axaftinên li ser mijarekê diyar li hember gel tê kirin re em çi dibêjîn?**

## RÛMETA MIN RÛMETA GEL E

Gelê welatparêz!

Aştî têgeheke binirx e.Ji xwe di hêlekî, de bitaybet ji hêla bindestan ve, li gor mafdariya xwe, şer ji bo gihiştina aştiyekî bişeref, navgîneke girîng e. Her çiqas bedel giran be jî, navgînekî girîng ya kû em serî lê didin şer e. Di vê çerçovê de roja 1’ê Îlûnê birastî jî di dîroka aştiyê de, cihekê wê yê girîng heye û di dîroka gelê cîhanê û netewan de, wateyekê wê ya girîng heye.




Gelê hêja!

Berxwedana me ya aştiyê, ne berxwedaniyeke li hemberî lêdana 12’ê Îlûnê bû; divê weke li hemberî dîrokê, serîrakirinek bêfêmkirin. Rastî jî ev e. Di vê wateye de, qasî dîrokî ye, ew qas jî jiyanî ye.

Gelê niştimanperwer!

Li hemberî vê yekê bersiva 12’ê Îlûnê hatî dayîn; peywira rewşa awerte bû. Vê rejîmê di demekê kin de xwest vê pêngava me ya ku hatiye avêtin, têk bibe. Di van salên dijwar de, me di vê pêvajoyê de, pêngav li ser pêngavê avêtin û di salên 90’an de ji bo gêrîla xwecî bibe, hewldanên me yên mezin çêbûn. Her ku çû rewşa gêrîla ya bicihbûna di nava welat de, û xwe gihandina cihên stratejîk



weke neçariyekê derket holê. Ev jib o xwe têr nedît. Rewşekî ku gel jî bi kari be dengê derxe, hat afirandin.

Bêguman bi destxistina rewabûna xwe, erkekî girîng ya civatên navneteweyî hebû. Aştiya Tirk û Kurdan, di rastiyê de cewhera aştiya Rojhilata Navîn e. Aştiya Rojhilata Navîn jî bingeha aştiya herêmê, heta ya cîhanê ye. Ger ku destdirêjîbûnên deshilatdarên çînên serdest yên Tirkan bên rawestandin, serdest neçarî aştiyê bên hiştin, wê ji vê yekê hemû mirovahî qezenc bike. Bêguman gelê Kurd ku di pêvajoya komkujiyan de ye, wê yekem car mîna mirovên asayî bikevin riya pêşketina demokratîk. Lewma Civakên Navneteweyî ji bo aştiya cîhanê, ji bo ev şerê ku bi rêbazên qirêj û mafyawarî bidin rawestandin, pêwîst e giraniya xwe danin.

Hevalno!

Ji bo her kesê ku girêdayî min in, ez vê diyar dikim; riya azadiyê ji bo Kurdan heya dawiyê vebûye û Kurdê ku xwe bi awayek rêkûpêk bi azadiyê ve girênede, dibe ku birayê min be û dibe ku hinek din bin, kî dibe bila; dibe heramzade, qeleş û xulam. Divê ev derdor bêne tehşîr û tecrîdkirin…

**Serok Apo**

## PEYV

**Navgîn:** Navend
**Niştimanperwer:** Welatparêz
**Peywir:** Rêvebirname, rêzikname
**Awerte:** Rewşa ne asayî
**Xwecî:** Xwediyê cih, niştecih
**Stratejîk:** Armanca demdirêj, di warê erdnîgarî de jî cihê herî destdayî
**Rewa:** Meşrû
**Civat:** Civak
**Tehşîr:** Reşkirin
**Tecrîd:** Tenê hêlan
**Heramzade:** Bîjî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Xal Bêhnok (;):**

Ev hêma cihê rawestînek dirêj dide diyarkirin.

**1-** Di rêzehevokan de, di hevokên awênê wan cû-da**;** di wateyê de bihev ve girêdayî de, ji bo cû-da-ki-ri-na hevokên serbixwe tên bikaranîn.

**Mînak:**

Divê em ji Rêber hezbikin**;** divê em di riya wî de biçin**;** divê em rûmeta wî bizanin.

**2-** Ji bo endamên ziman yên bi bêhnokan ji hev hatîn cûdakirin, wekî kom cûdakirin tê bikaranîn.

**Mînak:**

Îşev ez hizirim ku ji bo jiyanek demê xwe te-mamkirî ne dûrî, ne jî nêzîkahî**;** ne zor, jî ne hêsanî**;** ne qehr, ne jî hezkirî, heyî.

## PIRS

**1-**Li gor mijarê derketina PKK'ê ji bo çi ye?
**2-** Kesên ku xwe bi awayek rêkûpêk, bi azadiyê ve girênede çi ye?

## CÛR Û AWÊN

Ji axaftinên ji bo ramanek diyar têdigihîne û xu-rûşekê dide girseyekê re **axaftin** (***nutuq)*** tê gotin.

Nutuq, bi bangî dest pê dike, piştî peyva bangî, baneşan tê bikaranîn û bi destpêkirina her bendê re peyv yan birepeyvên bangî tê bikaranîn.

**Mînak:**
Gelê welatparêz**!**
Gelê hêja**!**
Gelê niştimanperwer**!**
Hevalno**!**

## RÊZIMAN

Ji wan peyvên ku piranî piştî navan tên, reng, a-wa, rewş, jimar û hemû taybetmendiyên wan diyar di-kin re dibêjin **hevalnav.**

Hevalnav di nav xwe de dibin sê beş:

**1-** Hevalnavên çawaniyê
**2-** Hevalnavên diyarkirinê
**3-** Hevalnavên nediyar

**1- Hevalnavên çawaniyê:**

Di nivîsîna jêr de peyvên binê wan hatîn xêzkirin û çawanbûna navan dane diyarkirin. Van peyvan bi bal-darî bixwînin.

Gelê **hêja**
Şêrkoyê **kulek**
Derya **spî**

Di mînaka jor de peyva **“hêja”** çawabûna rewşa **“gel”** daye diyarkirin. Her wiha peyva **“kulek”**, di aliyê dirov de çawaniya **“Şêrgo”** bi me daye zanîn. Dîsa peyva **“spî”**, çawabûna rengê **“derya”** yê têdigihîne.

Bi vî rengî em têdigihîn ku hevalnavên çawaniyê jî bi du biran ji hev tên cûdakirin.

**1-**Hevalnavên çawaniyê yên rewş û awa:

Ew hevalnavên ku rewş û awayê navan didin diyarkirin jê re **hevalnavên çawaniyê yên rewş û awa** tê gotin.

**MÎNAK:**

Hevalên **hêja**, karên **baş** dikin.

Zozanên **xweş** yên Kurdistanê ne.

Hozanê **beş** çû.

**2-**Hevalnavên çawaniyê yên rengdêr.

Ew hevalnavên ku li gel navan tên û rengên wan didin diyarkirin jê re **hevalnavên çawaniyê yên rengdêr** tê gotin.

**MÎNAK:**

Kûlîlka **spî** sembola aştiyê ye.

Gula **sor** ciwan e.

Deryê **reş** hesin e.

## TÊBINÎ

**Hevalnavên payepîv:**

Dema em temaşeyî du tiştên wekhev dikin, di-bî-nin ku di aliyê taybetmendiyên xwe de wekhev in, yan yek ji yekê zêdetir yan jî yek ji yekê kêmtir e. Ji vê kêm û zêdebûnê re dibêjîn **payepîv**.

**Mînak:**

Dema em dibêjîn **“Egîdê reş”**, dibînin ku peyva **“reş”** çawaniya rengê **“Egîd”** bi me daye zanîn. Lê de-ma em dibêjîn **“Egîdê reştir”**, têdigihîn ku peyva **“reş-tir”** hîn reştirbûna Egîd ji me re têdigihîne. Dîsa em tê-di-gihîn Egîdê duwem ji Egîdê yekem hîn reştir e. Bi vî rengî peyva **“reştir”** em dikarin bêjin hevalnavên çawaniyê ya payepîv e.

Gula **ciwan**.

Gula **ciwantir**.

Gula **ciwantirîn**.

Hevalnavên payepîv, di nav hevalnavên çawaniyê de cih digire.

# TEST 2

**TÊKÎLÎ**

Têkîliya di navbera kesan de, tişteke di nav rêkûpêkiya civakê de, ji wan tiştan e ku dest jê nayê berdan. Di roja me de, di nav civakê de gihandina kesên bikarin di nav kesan de têkîliyê pêkbînin, encama se-re-ke ya rêkûpêk kirina perwerda hemdem e. Ji bo tu bi-ka-ri-bî têkîliya di navbera kesan de pêkbînî, divê tu bixwe bawer bî, rêzdariyê bi kesên din bidî hesandin, rêz-da-ri-yê ji guhdarên xwe re nîşan bikî, di xwe û danûstan-di-nên xwe de bi pîvan bî.

**(Her sê pirsên destpêkê li gor mijarê bersiv bi-din.)**

**1- Têkîliya di nav kesan de tiştek çawa ye?**
**A)** Tiştek xwezayî ye.
**B)** Tiştek civakî ye.
**C)** Tişteke dev jê nayê berdane.
**D)** Tiştek mirovî ye.
**E)** Tişteke tenduristî ye.

**2- Ji bo tu bikaribî têkîliyê di nav kesan de pêkbînî, divê tu çi bikî?**
**A)** Divê tu ji xwe bawer bî.
**B)** Divê rêzdariyê bi kesên din, bidî hesandin.
**C)** Rêzdariyê ji guhdarên xwe re nîşa bikî.
**D)** Di xwe û danûstandinên xwe de bi pîvan bî.
**E)** Her çar jî rast in.

**3- Di roja me de, di nav civakê de gihandina kesên bikarin di nav kesan de têkîliyê pêkbînin, encama çi ye?**
**A)** Encama perwerdeyekê hemdem ya birêkûpêk e.
**B)** Encama têkîliyên rast û dirust ya di nav mirovan de ye.
**C)** Encama bixwe bawerbûn û azadî bûnêye.
**D)** Encama xwe rizgarkirina ji ezeziyê ye.
**E)** Encama hevkariya di nav civakê de ye.

**4- Ji nivîsînên bûyerekê bûyî yan gengazî bûyînê bi awayekê rêkûpêk radigîne re çi tê gotin?**
**A)** Çîrok
**B)** Serpêhatî
**C)** Gotar
**D)** Hevpeyvîn
**E)** Nutuq

**5- Di rêzehelbesta “Kesê zana divê li ber wî xwiyabin her du sal evro” de çend deng hene?**
**A)** 17
**B)** 21
**C)** 38
**D)** 39
**E)** 29

**6- Em ji peyv yan jî pêveka li piştî qafiyê tê bikaranîn re dibêjin çi?**
**A)** Qafiya tam
**B)** Qafiya lewaz
**C)** Redîf
**D)** Pîvan
**E)** Qafiya dewlemend

**7- Di hevoka “Min name xwend” de kîjan cûrê nav hatiye bikaranîn?**
**A)** Navê giştî
**B)** Navê pirjimar
**C)** Navê taybet
**D)** Navê koma
**E)** Navê hevgirtî

**8- Di kîjan hevokên li jêr de diyarkirina ki-te-yan çewt hatiye nîşandan?**
**A)** Xwen-din  pê-wîs-ti-ya ji-ya-nê-ye.
**B)** Ta-va hav-în-ê dij-wa-re.
**C)** Kar-ker çû kar.
**D)** Xwen-din ro-na-hi-ya ji-ya-nê-ye.
**E)** Ba-ra-na bi-ha-rê xwe-şe.

**9- Hêmaya li dawiya hevokê tê danîn û her tim piştî wê hêmayê nivîsîn bi tîpa gir tê destpêkirin kî-ja-n hêma ye?**
**A)** Xalbêhnok
**B)** Xal
**C)** Cotxal
**D)** Hêmaya bêhnok
**E)** Xêzika axaftinê

**10- Dema nivîskar ramanê xwe yê di derbarê mijara danî holê de, hestên xwe tîne ziman û nê-rî-nên xwe naspêre çespandinê, nakeve xema ne-ba-wer-kirinê, ji nivîsîna vî nivîskarî re çi tê gotin?**
**A)** Gotar
**B)** Neqerat
**C)** Bîranîn
**D)** Geryaname
**E)** Taqîkirin

**11- Peyva dikeve pey nav, çawaniya wî navî di-de diyarkirin, ji vebijarkên jêrîn kîjan e?**
**A)** Cînav
**B)** Hevalkar
**C)** Hevalnavê çawaniyê
**D)** Alav
**E)** Hevalnavê diyarkirinê

**12- Hêmaya dikeve cihê rawestandinên dirêj yan jî bi vê hêmayê du hevok bi hevdu ve tên girê-dan û bi vî awayî di aliyê wateyê de hevdu temam di-kin re çi tê gotin?**
**A)** Cotxal
**B)** Xalbêhnok
**C)** Bêhnok
**D)** Hêmaya pirsê
**E)** Baneşan

# BEŞA 2

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Di rexnekirinê de em balê dikişînin ser kîjan xa-lan?**
**2- Hûn dizanin nivîsînên rexnekirinê çima tên nivîsîn?**
**3- Hûn dikarin cudahiya di navbera hevalnavên çawaniyê û diyarkirinê de li lênûsa xwe binivîsin?**

## REXNEYA SER PERWERDÊ



Rexnekirina perwerdê mijarekî girîng e. Perwerde bi kîjan rêbazê bê dayîn encam jî wê ser wî rêbazê bê girtin. Gelo mirov ji her awayê perwerdeyê re dikare bêje perwerde? Yên xwendekar û rewşenbîr bi kîjan awayî di nav civakê de li xwe dinêrin? Kesên xwendekar û rewşenbîr bi kîjan çavî li yên nexwendekar dinêrin?

Li gor van pirsên jor, hinek kesên perwerdeya xwe li ser bingehê zîhna dewlet û desthilatdariyê dibînin, kesayetên dijcivak pêş dikevin. Encama perwerdeya şaş ya ku li dij xwezeya civakê ye, ji wan kesên desthilatdar ku berjewendiyên xwe li ser hemû nirxên mirovahiyê digirin, derdikeve holê. Saziya perwerdê li gor zîhniyeta xwe sazûman kirine. Yên wê perwerdê re derbaz dibin, taybetmendiya wan kesên desthilatdar û dewletparêz digirin. Ev kesên wiha xwe li ser civakê re dibînin,

civakê wek zeviya xwe lê dinêrin. Ne civakîne. Civakê paşketî, hov, nezan û kerî dibînin. Jixwe kesên ne xwendekar, wek mirov jî nabînin. Li derdora xwe bi çavekî biçûk dinêrin. Xwe li ser her tiştî re digirin. Tixûbê ezezîtiya wan nîne. Ji ber ku her tiştî bi awayê heyberî bingeh digirin, têr nabin. Ezezîtiyê dixin pêşiya hemû nirxên civakê. Wek kevneşopî, tore, nirxên exlaqî kevin dibînin û dibêjin pêwîst e ev bên derbazkirin. Wek serxweşan ji xwe hesdikin.

Dibêjin cîhan li derdome dizivire. Jiyana wan li dijî gotinên wan e. Tenê kesayeta xwe dihizirin. Pêşketinê bi çend gotinên zimandirêjiyê digirin dest. Zimanê wan zimaneke ezop e. Ji derve wek xwendekar û rewşenbîr tên dîtin lê belê hundirê wan vala ne. Zanistê ne ji bo berjewendiya civakê ji bo berjewendiya kesî fêr dibin û pêş dixin. Qaşo li gor wan asta pêşketinê di riya dîplomaya zanko girtin re derbaz dibe.

Bêguman xwendekar û rewşenbîrên me yên giranbûha û hemû xwendekariya xwe ji bo berjewendiya civak û gelê xwe bikartînin û ji bo pêşxistina civaka xwe, heta asta pakrewaniyê diçin jî hene. Xwendekar û rewşenbîrên bi vî awayî pêşeng û nirxên civakê ne.



## PEYV

**Rewşenbîr:** Hizrê ronî
**Tixûb:** Sînor
**Ezezî:** Kesên tenê ji bo xwe dihizire
**Ezop:** Zimanê nayê têgihandin, rastiya na, li derdora rastiyan dizivire
**Qaşo:** Xwedîgiravî, ji xwe ve
**Dîploma:** Bawername, bînername, destûrname
**Zanko:** Zanîngeh

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Hêmaya, nivîsînên ji bo vekirin û firehkirinê tên bikaranîn, digire nav xwe, em ji vê hêmayê re dibêjin **kevanok**. Bi derxistina vê nivîsînê bandor li ser çêkirina hevokê nake.

**Mînak: 1**

Xwendekarên me **(**Hogir, Dijwar, Xemê, Gul-bihar**)** hatin.

**Mînak: 2**

Egîd **(**Mêrxas, leheng**)**

## PIRS

**1-** Divê em çawa nêzîkî kesên ne xwendevan bibin?
**2-** Erk û berpirsyariyên xwendekaran li beramberî civakê çi ne?
**3-** Xwendekarên ku dibin nirxên civakê kîjan in?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsîna bermayekê wêjeyî û pîşeyî hûrkolîn dike, berhemê tê nasîn, di aliyê wêje û dîroka pîşeyî de rûmetê datîne holê, aliyê wê yê serkeftî û binkeftî diyar dike re dibêjîn **rexnekirin**.

Ji bo rexnekirinê, nirxandin çawa tê kirin divê baş bê zanîn. Bûyer û mijarên ku wê bi rexnekirinê bê nirxandin, divê pêşî bê nasandin. Piştre mirov derbazî rexnekirinê dibe. Bi vî awayî aliyên erênî û nerênî têne dîtin û mirov digihîje darêzê.

Nivîsînên rexneyî yên wêjeyî ser sê xalên sereke pêşdikevin:

**1-**Parastina rastiyê

**2-**Nêrînên rexneyî yên kesî

**3-**Nêrînên çareseriyê

## RÊZIMAN

**2- Hevalnavên diyarkirinê:**

Hevalnavên diyarkirinê; ew hevalnavên ku li gel navan tê bi awayê nîşandan, jimar û pirs-ya-rî navekê ji navê din dide cudakirin.
Hevalnavên diyarkirinê di nav xwe de sê beş:

**a- Hevalnavên nîşandanê:**

Bi awayekê giştî hevalnavê nîşandanê ji cînavên nişandanê pêktê.

Hevalnavên ku li gel navan tê û nav nîşanî me dikin, jê re **hevalnavên nîşandanê** tê gotin.

**MÎNAK:**

**Ev** gul sor e.

**Wê** pirtûkê bixwîne.

**b- Hevalnavên jimarî:**

Ji hevalnavên ku jimara navan dide diyarkirin re **hevalnavên jimarî** tê gotin.

**MÎNAK:**

**Du** gulan bîne.

Xwendekarê **yekemîn** xelat stand.

**Cot cot** heval hatin.

Gulîstanê ji **çaransêyê** pirtûkê xwend.

**c- Hevalnavên pirsyarî:**

Ew peyva pirsê ji navekê dike û di aliyê pirsyarî de bandorê li ser nav dike re **hevalnavên pirsyarî** tê gotin.

**MÎNAK:**

**Kîjan** şitlê biçînim?

Wî **çend** pirtûk anîn?

**3-Hevalnavên nediyar:**

Hevalnavên nediyar, navan bi awayekê nediyar ji me re dide diyarkirin.

Yanî peyvên dibin hevalnavên ne-diyar, ji cînavê nediyar in. Ger li gel nav bê, dibin **hevalnavên nediyar** ger li cihê nav bê bikaranîn dibin **cînavên nediyar**.

**MÎNAK:**


**Hindek** mirov ji wir ve tên.

**Çend** heval bi hev re ne.

# KELHA ELODÎNO

Kelha Elodîno; kelhekî li ser zinarekê bilind hatiye avakirin, sê aliyên wê bi robarê Dîcleyê hatiye pêçan. Riya avkêşa di nav kelhê re xwe berdide ser ava Dîcleyê. Odeya bac-giran hîn hebûna xwe diparêze. Ji vê kelhê, mirov dikare êrîşên li ser Kurdistanê û berxwedêriya gelê Kurd têdigihîje.

Belê, danê sibê bû, em ji Germava Nebî Silêman rabûn. Rojê tîrêjên xwe avêtibûn Sîta Amara. Kelekvanan li ser ava Dîcle, keleka xwe amade dikirin. Gerokên ji Cizîrê (Dûjîla Aqor) hatîn, dixwestin derbazî cihê xwe bibin. Em bi wan re li kelekê siwar bûn. Kelekvanê bi navê Reşo, kelek berda avê. Li aliyekê çaydana li ser tirafa di sêlê de hatî danîn, dikele. Li milê din jî kelek bi avê ve xwe berdide; dizivire û diçe. Piştî du demjimêran digihîje Gera Qesirka Elodîno. Em xatirê xwe dixwazin û li wir peya dibin. Derbazî hindirê Qesirka Elodîno dibin. Qesrik bi kils û gêçê (ces), li ser tehtekê şayîk hatiye çêkirin. Cihê zincîra bacgiran li pencera qesrê xuya dike. Li wî alî kevirê zincîrê bala mirov dikişîne. Pêlên avê hildipirijin tehta qesrê. Dengê kewa tevlî den-gê avê dibe. Di nav vê xurûşê de, hindekî li wê derê rûdinin lê em dixwazin derbikevin serê Kelhê. Lê belê tava dijwar me ditirsîne. Riya me asteng dike. Hinekê di-sekinin lê em dîsa neçarin hawabikevin.



Dikevin rê, her ku gavekê davêjîn li serê kelhê temaşe dikin. Ev rê li ber me dirêj dibe. Riya me ya dirêj ya ku li ser tehtê bi awayê pêpilka hatî çêkirin, ji ber germê hîn dirêjtir dibe. Em hewa dikevin, pêpilkan derbaz dikin û diçin serê kelhê. Li ser kelhê kavilên xaniyan, şkeftên li tehtê kolayî û cihê wê yê bilind, me dixe nava hizirînê. Em digerin, li aliyê wê yê rojava kunek tê dî-tin! Ji vê kunê re digotin avdiz. Belê ev kun dirêj e. Ji serê vê kelha bilind di nav tehtê re xwe berdide xwarê! Her pênc yan deh metreyan pencereyek lê hatiye vekirin û xwe berdidin, digihîje ava Dîcle. Her çiqas daketina di vê kunê re zehmet jî be lê ji ber xurûşê em bixwe ne-di-hesiyan. Dema em ji kunê xwe berdidin, lingê me digihîjî nav avê. Ji nav avê derdikevin, ji ber nexweşiya rê na-xwazin carek din, di heman kunê re hewa bikevin. Li milê kelhê yê rojava re carek din hewa dikevin ser kelhê û temaşe dikin. Hebûna leşkerên Tirk li başûrê wê, geryana me bandor dike. Li wir em çiyayên Botanê li pêşberî xwe dibînin. Keçikên hatîn daran ji xwe re stiranan dibêjin, hok hoka şivanên pezê xwe berdidin ser avê jî xweşikbûna vê herêmê nîşadike. Li milê din rêwiyên peyade bihêstiran li Beriha Rima re derbaz dibin. Pezkuviyek ji ber wan direve û xwe davêje Lata Sorê. Ev pezkuvî bala me dikişîne li ser xwe.

Belê, kelha kevnare a dîrokî, bermayiyek ya cihê berxwedana gelê Kurd e. Ev kelih, di dîrokê de gelek caran erka bacstandina Riya Hevrîşimê girtiye ser xwe.



## PEYV

**Dûjîla Aqor:** Navê Cizîrê ê kevin
**Kelih:** Xaniyên mezin yên ji bo parastin û jiyankirinê dihat bikaranîn
**Zinar:** Latên bilind
**Bacgir:** Kesên bacê digirin
**Sîta Amara:** Navê çiyayekê raserî Amara Torê ye
**Tiraf:** Kozên agir
**Kils:** Di êtûnan de bi encama şewitandina kevirên spî derdikeve holê û ji bo lêkirina dîwar û spîkirina dîwaran tê bikaranîn.
**Şayîk:** Hilû
**Beriha Rima:** Navê cihekê yê rexa ava Dîcle.
**Riya Hevrîşim:** Riya bazirganiyê ya ji Anotoliyê dest pê dike û heta Çînê dirêj dibe.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Baneşan (!):**

Dema mirov bixwaze peyvek an çend peyvan bi hestekî gûr (tirs, coş, xurûş, hezkirin, wêrekî) nîşa bide, hêmaya ba-ne-şanê tê bikaranîn.

**MÎNAK:**

Em digerin, li aliyê wê yê rojava kunek tê dî-tin! Ji serê vê kelha bilind di nav tehtê re xwe berdide xwarê!

**TÊBÎNÎ:**

Hêmaya baneşan bi du awayan tê bikaranîn:

**1-**Li gor hestên nivîskar bi bilindbûn û nizimbûna deng re hêmaya baneşanê ji bo balkişandina li ser hevok yan nivîsê tê bikaranîn.

**2-**Dema alavên baneşanê bi serê xwe bê li peywê hêmaya baneşan tê bikaranîn. Lê dema dikeve gel navan hêma li pey navan re tê bikaranîn.

**MÎNAK:**

Ax**!** Ez dêşim.

Wa dayê**!** Were em biçin.

## PIRS

**1-** Dema em dabaşa vê kelhê dikin, kelhekê çawa tê ber çavê we?
**2-** Berê di vê kelhê de çi hatiye kirin?
**3-** Li gor mijarê gelê vê kelhê, ava xwe ji kûderê danî?

## CÛR Û AWÊN

Ji wan cûre nivîsînên cihê geryayî û dîtî, agahiyên komkirî, tiştê pêhesyayî radigihîne re **geryaname** tê gotin.

Kesên zana, agahî û hestên di derbarê cihê geryayî û dîtî de, bi zimanekê balkêş têdigihînin.

Di dîrokê de yekemîn geryaname piştî zayînê di sedsala V'an de derketiye.

## RÊZIMAN

**Cînav û cûrên wê:**

Ew peyvên ku bi serê xwe cihê navan tê bikaranîn erk û rista navan digirin ser xwe, ji wan re **cînav** tê gotin.

Hinek cînav ev in:

**1-** Cînavên kesî
**2-** Cînavên nîşandanê
**3-** Cînavên jimarî
**4-** Cînava vegerok
**5-** Cînavên nediyar
**6-** Cînavên pirsyarî

**1-Cînavê Kesî:**

Ew cînavên ku tenê dikevin cihê navên kesî, ji wan re **cînavê kesî** tê gotin.

Cînavên kesî, di aliyê karanînê de dibin du beş:

**a- Cînavên netewandî:**

Ev cînav di rewşa xwe ya netewandî de ne. Li gor dem, kes û zayendê tên tewandin.

**Cînavên netewandî ev in: "ez, tu, ew, em, hûn, e-w"**

**MÎNAK:**

**Ez** çûm dibistanê.

**Ez** diçim dibistanê.

**Ez ê** biçim dibistanê.

**b- Cînavên tewandî:"min, te, wî/wê, me, we, wan"**

Ev cûrê cînavan li gor dem, kes û zayendê hatine tewandin û rewşa xwe ya dawî girtiye.

**MÎNAK:**

**Min** got:

**Wê** name nivîsî.

Cînavên kesî li gor yekjimar û pirjimarbûna xwe dibin du beş:

**a-Cînavên kesî yekjimar:Ez**, **min**, **tu**, **te**, **ew**, **wî/wê**

**MÎNAK:**

**Te** name nivîsî.

**b-Cînavên kesî yên pirjimar:Em**, **me**, **hûn**, **we**, **ew**, **wan**

**MÎNAK:**

**Wan** rêwîtiyek baş derbazkirin.

## HÎNDARÎ

1-Hûn jî cînavên tewandî di hevokan de bikarbînin û li lênûsa xwe binivîsin.

2-**Destnivîsa jêr li lênûsa xwe binivîsin.**

Dikevîn rê, her ku gavekê davêjîn li serê kelhê temaşe dikin. Ev rê li ber me dirêj dibe, riya me ya dirêj ya ku li ser tehtê bi awayê pêpilka hatî çêkirin, ji ber germê hîn dirêjtir dibe.

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

**1- Wêneyîkirin li kûderê tê pêkanîn?**
**2- Cudahiya di navbera wêneyîkirin û ger-yan-a-meyê de çi ye?**
**3- Hûn çi cudahiyê di navbera cînavê nîşandanê û cînavê kesî de dibînin?**

# PEZKÛVIYÊN CIWAN

Herêma Heftenîn, di dîroka civaka Kurdan de ji Têkoşîna Azadiya Kurdistanê re her û her malûvanî kiriye. Gelek gundên Kurd û Asuriyan ev herêma mîna bihûştê bi hev re parvekirine. Di nav vê herêmê de ya herî zêde bala mirovan dikişîne Deriyê Dawetiya ye. Ji ber ku ji dûr ve mîna mirovên govend girtî tên dîtin.

Ji ber ku gelek lawirên mîna beraz, pezkûvî, sivorî, rovî, gur û torî lê dijîn, ji van lawiran ên herî zêde bala min kişandîn, pezkûvî bû. Ne ji bo kuştina wan, ji bo heybeta xwezaya wan û bedewbûn û narînbûna wan, ji nêz ve bibînim, bala min kişandibûn ser xwe.

Bi berbangê sibehê re em sê heval çûn ser Deriyê Dawetiya da ku em pezkûviyan ji nêz ve bibînin. Ji bo em pezkûviyan bibînin, pêwîst e qet tevger neyê kirin. Ji bo vê me kozikên xwe çêkirin û wek miriyan em di kozikên xwe de man benda pezkûviyan.

Taybetmendiyên wan; pezkûvî, herî zêde li ser çiyayên bilind û asê dijîn. Di navbera demjimêrên 4 û 5'ê sibehê tên li ser avê, ava xwe vedixwin û ji bo parastina xwe hildikişin cihê herî stratejîk, ango herî asê û bilind. Di erda rast e de, di demjimêrekê de qasî heştî kîlometre dikarin birevin.
Pezkûvî lawirek komî dijîn. Dema diçêrin û di navbera demjimêrên nîvro de mexel tên her û her hîşedarek yê yekane ku bikaribe hemû dol û newalê di bin çavdêriya xwe bigire, li cihekî herî bilind û bi heybet hîşedariyê ji kerî re digire, heye. Bi navberên diyar hîşedar jî tên guhertin, da ku yê hîşedar jî bikaribe biçêre û xwe têr bike. Wekî din jî lawirek pir bizdokiye. Di ervaziyên

herî bi asê nîv taht de jî dikarin hilkişin û heta dikarin ku xwe ji latên sê-çar metreyî ji jêr lihavêjin jor. Pezkûvî nêzî 14-15 salan dijîn. Şaxên wan ji metreyekê zêdetir, weke kevanê ne. Mirov ji bazinên şaxên wan dikare temenê wan jî bizanibe.



Em di kozikên xwe de bêtevger disekinin, hêdî hêdî derdora me ronî dibe. Me nêzî cihê ku ew her car li ser Deriyê Dawetiyan re tên dîtin, kozikên xwe yên veşartî çêkirin. Tişta em li bendê bûn, hatin dîtin. Di serê kerî de yekî, yekane serê kerî bi dengê firiniya xwe derdixîne û kerî ber bi me dikişîne. Em bêdeng û bêtevger bûn. Di navbera me û pezkûviyan de qasî pêncî metreyan bû. Bala wan ne li ser me bû. Li gor xwezaya xwe tevdigerin. Ji nav komê yekî berê xwe da cihê ku her tim lê hîşedariyê digire. Du yekane ji xwe re hoçanê dikin. Dengê şîkşîka şaxên wan, qontarê ser Deriyê Dawetiyan re belav dibe. Qasî deh hûrdeyan li hev xistin û bi yên din re dest bi çêrînê kirin.

Yê herî bala min kişandî yê hîşedar bû. Li ser latê bi awayekî bi heybet sekînî û bi tevgerekî hêdî hêdî li derdora xwe dinêrî. Rihka wî dirêj û gelek muyên bozbûyî di nav muyên qemer de hebûn. Di nav muyên qemer de gelek muyên boz jî xuya dikirin. Çavên wî zer bûn, li ser zerika çavên wî rengê reşê mewîjî xuya dikir. Li ser hinarokên ruyê wî xeteke reş xuya dikir. Tîbûna guhên wî yên ber şaxên wî re, hem xweşikbûnek cuda hem jî şiyarbûna wî ya li hember tirsnakiyên derdor dida pêhesandin. Xwedî kepiyekî dirêj yê lihevhatî bû. Xwediyê stuyek zirav û dirêj, her wiha gerdenzeriya wî ya ser spîbûnê ve diçe, mirov bi xweşikbûna xwe ve dide girêdan. Şaxên wî heybetek cuda dida sekna wî. Her wisa her du lingên dawî, bi heybeteke cuda ya mîna kevanê xuya dikir. Li ser sêmên wî re mîna xirxalek ji muyan reş hebû.

Piştî ku me têra xwe ew dîtin; bi derketina me ya ji kozikên xwe, pezkûvî ji nişka ve ber bi aliyê tixûbê Tirkiyê ve revîn û çûn. Em jî gihîştin mebesta kêfxweşî û coşa xwe...

## PEYV

**Heftenîn:** Herêmek ya girêdayî Zaxo
**Asurî:** Navê netewek ê Rojhilata Navîn de dijîn
**Narînbûn:** Nazik, ziravî
**Kozik:** Çeper
**Stratejî:** Cihê herî bilind û asê
**Mexel:** Cihê ku pez lê radize
**Bizdok:** Tirsnok

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Dema hûn mijarekê binivîsînin, nivîsîna xwe bi-kin sê beş.

Di beşa yekem de tişta tu dabaşa wê dikî, bi a-wa-ye-k kurt bînin ziman.

Di beşa duwem de, mijarê bi awayekê giştî fireh vekin. Di derbarê mijarê de dikarin gotina ji kesên din jî bigirin lê van gotinên we ji kesên din girtine, di nav ney-nokê de binivîsin.

Di beşa sêyem de bi awayekê pir kurt ramana xwe kom bikin. Yanî bila benda dawî ji her du bendên din kurtir be û ya naverok jî ji her duyên din dirêjtir be.

## PIRS

**1-** Dema hûn mijarê dixwînin, dikarin wêneyê pezkûvî çêbikin?
**2-** Ev lawira ciwan li ku derê jiyan dike?
**3-** Çima nivîskar dixwaze pezkûviyan nas bike?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsîna dema em dixwînîn, wêneyên heyînan da-başa wê dikin û tê ber çavên me re dibêjîn **wêneyîkirin.**

Wêneyîkirin û vekirin ne awayek serbixwe yê ve-kirinê ye. Ev awayê vegotinê di serpêhatiyan de tê bi-karanîn.

Ji wêneyîkirina kesî re jî **Portre** tê gotin.

## RÊZIMAN

**2- Cînavên nîşandanê:**

Ew cînavên dikevin cihê navan, heyînekê li ber çavan nîşa dike ji wan re **cînavê nîşandanê** tê gotin.

**MÎNAK:**

**Ev** xweştirîn pirtûk e.

**Banî wî bike**.

**Wê** teşî rist.

**Bi baldarî pêşdariya jêr bixwînin:**

| **Cînavên nîşandanê yên nêzîk** | | | |
|---|---|---|---|
| Cînavên nîşandanê yê nêzîk nêrza û mêza yekjimar | Cînavên nîşandanê yê nêzîk nêrza û yekjimar | Cînavên nîşandanê yê nêzîk mêza û yekjimar | Cînavên nîşandanê yê nêzîk mêrza û mêza û pirjimar |
| ev | vî | vê | van |

| Cînavên nîşandanê yên dûr | | | |
|---|---|---|---|
| Cînavên nîşandanê yê dûr, nêrza û mêza û yekjimar | Cînavên nîşandanê ya dûr, mêza û yekjimar | Cînavên nîşandanê yê dûr, nêrza û yekjimar | Cînavên nîşandanê yê dûr, nêrza û mêza û pirjimar |
| ew | wê | wî | wan |

## TÊBINÎ

*Carna ji bo nîşakirina tiştên pir dûr li ser cînavê nîşandanê yê dûr, **"ya he"** tê zêdekirin. Her wiha dema tu rastî kesekê baş tênagihîje tê, ji bo têgihandina wî kesî tu **"ya he"** li ser cînavê nîşandanê yê nêzîk jî zêde dikî.*

**MÎNAK:**

**Wî yê he** name nivîsandiye.

**Vî ya he** bide min.

## HÎNDARÎ

**1-**Em ji xweşikbûna welatê xwe çi tê digihîn?

**2-**Hûn jî çend cînavê nîşandanê di nav hevokê de bikarbînin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Em fêr bûbûn ku nivîsînên pexşan ji hevok û bendan pêktên. Nivîsînên hûnandî ji çi pêktê?
2- Bêhnoka dikeve nav rêzikên helbestan, navê wê çiye û çi sûdê dide?
3- Peyvên jimarî kengê dibin cînavên jimarî?

# EZ !

Îro ji dest husna hebîb, sergeşte û heyran im ez
Min eşq û muhbet bûn nesîb, sewdayê sergerdan im ez

Eşqê gelek sewda kirin, bê mal û bê mewla kirin
Nûra çira winda kirin, Mûsayê Imranî me ez

Mûsa ji dest husna bi nûr, şêrîniya xalên di hûr
Secde bire ber Kohê Tûr, nêzîkî remzê wan im ez

Remzê ku dê dilber bikin, carek bi çeşman seyr bikin
Dê kohê Qaf ker ker bikin, mecrûhê pir kovan im ez

Min ah ji dest kovan qehran, min sebir nayêt li sehran
Şubhetê mewcên di behran, Qulzûmê Umaman im ez.

Qulzûm û behrên di heftê, agirê eşqê ku keftê
Dê bisojit şubhe neftê, min diye û pêzan im ez…

...Sond dixwim se'id û destan, kevir û seylêd li bestan
Min bi xom li curhan bestan, be rahet û asan im ez

Aşiqa rahetya kême, agir û pêta dilê me
Çend hezar medhan dibême, muhitê esîman im ez



***Feqiyê Teyran***

## PEYV

**Sergeşt:** Sergêj
**Muhbet:** Hezkirin
**Sewda:** Evîndar
**Mewla:** Xudê
**Husna:** Xweşikbûn
**Koh:** Çiya
**Secde:** Serî tewandin
**Remz:** Nîşan
**Çeşme:** Li gor helbestê çav hatiye bikaranîn
**Mecrûh:** Birîndar
**Şubhet:** Mîna
**Mewc:** Pêl
**Qulzûm:** Okyanûs
**Doja:** Cehnem
**Se'id:** Zend
**Seyl:** Lehiya avê
**Curhan:** Birîn
**Muhit:** Derdor, hawirdor
**Metih:** Pesin

## EM HELBESVANÊ XWE NAS BIKIN

Feqê Teyran, di sala 1307'an de li Miksê dayîkbûye. Navê wî yê rast Mihemed e. Feqe, nasnavê wî ye. Xwendina li Miksê, Hîzan û Cîzirê domandiye. Feqê Teyran di sala 1375'an de çuye ber dilovaniya Yezdan.

Hinek berhemên Feqê Teyran ev in:

Dîwanek ya helbestan

Destana Şêxê Senaniyan

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Rawestandek, ew bêhnoka (**,**) li cihê rawestandina di navbera rêzikan de tê bikaranîne. Ev hêma, di aliyê wateyê de bandorekê mezin li ser wate û xurûşda-yîna rêzikên helbestê dike.

**Mînak:**

Îro ji dest husna hebîb**,** sergeşt e û heyran im ez
Min eşq û muhbet bûn nesîb**,** sewdayê sergerdan im ez

Weke di vê malikê de jî tê dîtin, ji ber ku ev bêhnok di rawestandina di nav rêzikan de hatiye bikaranîn, em ji vê hêmayê re dibêjin **rawestandek**

## PIRS

**1-** Li gor we nivîskar birîndarê çi ye?
**2-** Helbesta we xwendî ji çend malikan pêkhatiye?

## CÛR Û AWÊN

Ew helbestên k udi mijara "hunêrên peyvê" de ji hunera gotinê ya nûneriya îstîareyê re wek mînak tê dayîn, **helbestên sembolîk** in.

Di helbestên sembolîk de, bi heyînekî weke sembola wê heyînê, heyînek din tê hilbijartin.

Taybetmendiyên resen yên wê heyînê, bi wê sembolê tên vegotinkirin.

## RÊZIMAN

**3- Cînavên jimarî:**

Ew jimara bi nivîskî wekî peyv tê nivîsîn li şûna navan tên bikaranîna jê re **cînavên jimarî** tê gotin.

Cînavê jimarî, di nav xwe de dibe sê beş:

**Cînavên jimarî yên xwerû:**

**Cînavên jimarî yên xwerû ji jimarên xwerû pêktên. Ji yekê dest pê dike heta bê dawî diçe.**

**MÎNAK:**
**Çar** hatin.
**Çaran** gotin.
**Cînavên jimarî yên rêzî**:

**Dema jimarên xwerû pêveka pileyê (mîn) stand û rewşek a pile girtinê da jimarên xwerû û bi vî awayî ger cihê nav bê bikaranîn, ji wan re cînavên jimarî yên rêzî tê gotin.**
**MÎNAK:**
**Yekemîn** hat.
**Sêyemîn**, di pêşbirkê de serket.
**Cînavên jimarî yên kertî:**
**Dema jimarek tevayî yan jî parçeyek ji tevayî wek jimar bi awayekê nivîskî cihê nav bê bikaranîn, ji wan re cînavên jimara kertî tê gotin.**
**MÎNAK:**
**Ji sêya du** hatin.
**Dutam**, ji **pêncan sê** tejî bû.
Ji **heftan neh** xwend.
Di zimanê Kurdî de tewandina jimaran ji yekê heya bîstê bi pêveka **"an"** pêktê. Lê jimara yek li gor zayenda navê nehatî diyarkirin **(yekî-yekê)** tê bikaranîn.
**MÎNAK:**I
**Çaran** gotin.
**Dehan** nivîsî.
**MÎNAK:**II
**Yekî** nan xwar.
**Yekê** name nivîsî.

## HÎNDARÎ

**1-**Peyvên jêr weke cînav di nav hevokê de bikarbînin.
du, yekemîn, ji sêyan yek
**2-**Çima ji Feqê Teyran re gotine 'Feqê Teyran'?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Hûn dizanin Melayê Cizîrî kî ye?**
**2- Ger em jiyana Melayê Cizîrî binivîsîn, pêwîst e em balê bikişînîn ser kîjan xalan?**
**3- Cînavên vegerok ji çi pêktê?**

# MELAYÊ CIZÎRÎ (1407-1481)



Hozan û wêjevanê me yê navdar, di esmanê wêje û hozanvaniya Kurdî de heta niha jî stêrkek geş e. Cihekî bilind yê awazê wî di nav zanistên cûr be cûr û wêjeyî de heye. Dîwana wî, heta îro jî di destê wêjevan, hozanvan, oldar, evîndar û civakan de we-ke nimûneyekê, jêderî tê pejirandin.

Ev zanayê navdar, navê wî yê rast, Mele Ehmedê Kurê Şêx Mihemedê Botî ye. Di sala 1407'an de li Cizîra Botan ji dayîkbûye. Bavê wî Şêx Mihe-med, ji binemalek ya Şêxê Bermalê bû. Li gor reftarên wî demî, binemalek xwendevan bûn. Melayê Cizîrî waneya xwe ya zanistî destpêkê ji bavê xwe digire. Piştre dibe xwendekar, xwendina xwe li Cizîr, Colemêrg, Amed û Amêdiyê berdewam dike. Mela di xwendina xwe de gelek zîrek bû.

Melayê Cizîrî, di zanistên Erebî, Farîsî, Kur-dî û Tirkî de gelek pêşketî bû. Xwendina xwe heta 32 saliya xwe berdewam kir. Destûrnameya xwe ya zanistî di heman temenî de li gundê Stêrbasê ya girêdayî Amedê, li cem Mela

Tahir digire. Çend salekê li gundê Serba ya girêdayî Amedê dibe mela. Li herêma Amedê gelek wane û destûrname jî dane.



Piştî serdanek ya Eskîfê, demekê li wê derê jî dimîne. Piştre rewşa evîndariyê serî jê distîne, li gor pileya zanista wê demê, bawer dikirin ku Melayê Ci-zîrî bûye evîndarê keçekê û bi gelek navan banî kiriyê. Lê li gor lêkolînên li ser helbestên wî, bûye e-vîndarê welatê xwe Kurdistanê. Ji ber wê jî wî di helbesta xwe de gotiye: “Ez çira şevtariya şeva Kur-distan im, gula bihuşta baxên Botan im.” Ji ber vê evîn-da-riya niştimanperwerî, dest bi stiran û helbestên dîwanî dike. Lê ji ber ne têgihîştina gel, Melayê Cizîrî baş nehatiye naskirin. Di çavên gel de weke dîn tê dîtin. Piştre diçe Ci-zî-ra Botan. Li Medresa Sor dimîne û nav û dengê wî li cîhanê belav dibe.



Di sala 1481’an de, li Cîzîra Botan diçe ber dilovaniya Yezdan û li Medresa Sor tê veşartin. Heta niha jî li Medresa Sor, gora Melayê Cizîrî bermayek dîrokî û ziyaretgeha gelê Kurd e.

Bermayek yê Melayê Cizîrî bi navê *“Dîwana Me-layê Cizîrî”* ya wêjeyî, folklorî heye. Di Kurdistan û Cî-hanê de gelek bi nav û deng e. Bi gelek zimanên biyanî hatiye wergerandin û çapkirin. Wekî îngilîzî, Rusî, Fa-ri-sî, Erebî û ...

## TÊBINÎ

*Di sala 1958'an de "Dîwana Melayê Cîzîrî" ji aliyê Şêx Ehemdê kurê Mele Mihemedê Zivingî yê Miftiyê Qamişlo ve li Başûrê Rojava hatiye vekirin (şerhkirin). Vekirina wê du bergin (cild) û ji aliyê nivîskar bi xwe ve hatiye çapkirin."*

## PEYV

**Wêje:**Edebiyat
**Awaz:**Awa
**Dîwan:**Pirtûka helbestê
**Botî:**Navê eşîrek û herêmek ya Kurdistanê ye
**Reftar:**Tevger
**Destûrname:**Îcaze, dîploma
**Medresa Sor:**Navê mizgeftek ya navdar li Cizîra Botanê ye.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Xwendekarên hêja!

Mijara jêr bi baldarî bixwînin, li cihên tên xwes-tin hêmayandanin û kêmasiyên di aliyê nivîsînê de sererast bikin.

*melayê cizîrî di zanistên erebî farîsî kur-dî û tirkî de gelek pêşketî bû xwendina xwe heta 32 saliya xwe berdewam kir destûrnameya xwe ya zanistî di heman temenî de li gundê stêrbasê ya girêdayî amedê li cem mela tahir digire. çend salekê li gundê serba ya girêdayî amedê dibe melaa li herêma amedê gelek wane û destûrname jî dane*

## PIRS

**1-** Melayê Ci-zîrî kengê û li kûderê ji dayîkbûye?
**2-**Melayê Cizîrî li kîjan cihan xwendiye?
**3-**Melayê Cizîrî di cîhanê navdar e?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsînên jiyana kesan bi baldarî têdigihînin re **jîname**têgotin.

Jîname, bi awayekê dîrokî nivîsîna jiyana kesên di civakê de bi şêweyek giştî bi baldarî tê pêşwazîkirin. Di jînameyê de cih û dîroka dayîkbûn, rewşa derdor, erkên kirîn, taybetmendî, xebat, bandora wan û beşên wan yên hunerî, ger miribe, cih û dîroka mirina wan, piştî mirinê, nivîsînên li ser wan hatine nivîsîn û ger hebindest-ni-vîsên wan tên nivîsîn.

## RÊZIMAN

**4- Cînava vegerok:**

Weke di mînakên jêr de jî tê dîtin, ji ber peyva **“xwe”** di aliyê wateyê de du-ba-re-ki-ri-na peyva destpêkê ye, em jê re **cînava vegerok** dibêjin.

Ji berku dema em bêjîn;**“min, min pêşxist”** yan **“wî, wî dît”,** wateya tê xwestin nayê têgihandin, belkî berevajiyê rastiyê têdigihîje. Ji ber wê, em neçarin li şûna **“wî, wî dît”**,**“wî xwe dît”**û li şûna**“min, min pêşxist”**,**“min xwe pêşxist”** binivîsin.

**MÎNAK:I**
**Xwe bi xwe** hat.
Aras **xwe bi xwe** hat.
**MÎNAK:**II
Wî **xwe** dît.
Min **xwe** pêşxist.

**5- Cînavên nediyar:**

Ew peyvên ku di hevokê de dikevin şûna navê nediyar û bi awayekî nediyar li cihê nav tên bikaranîn re dibêjîn **cînavên nediyar**.

Peyvên dibin cînavên nediyar evin: “kesek, hin, hindek, hemû, çendan, giş, filan, bêvan, gelek, kêmek, pir, zêde û ...”

**MÎNAK:**
**Kesek** hat.
**Hinek** çûn.
**Gişa** ji min re bîne.
**Kêmekê** bilind bike.
**Zêde** serde neçe.

Dema temaşeyî van mînakan dikin, dibînin ku peyvên reştir hatîn nivîsandin, ketine şûna navekê. Lê nedane diyarkirin ku navên li şûna wan hatîn bikaranîn, kîne, çine, nêrzane yan mêzane, herwihadi aliyê jimarê de jî bi awayek zelal jimara wan nadin diyarkirin. Ji ber wê, ji wan re cînavên nediyar têgotin.

**6- Cînavên pirsyarî:**

Ew peyvên ku pirsê yan ji navên nehatî diyarkirin yan pirsê ji karê wan dikin re **cînavên pirsyarî** têgotin.

**Mînak:**
**Kî** ye?
**Kê** got?
**Çend** hatin?
**Kîjan** ya we ye?

Dema em temaşe dikin, dibînin ku di mînaka ye-kem de pirsa navê nediyar hatiye kirin, di mînaka du-wem de pirsa kesê karkirî tê kirin, di mînaka sêyem de pirsa jimara navên nehatine, hatiye kirin û di mînaka ça-rem de jî pirs kiriye ka kîjan heyîn ya we ye.

## TÊBINÎ

*Di zimanê Kurdî de gelek caran cînavên pirsyarî **"kî-kê"** di cihên şaş de tên bikaranîn. Ji ber wê çendê em dixwazin agehiyekê ser vê bidin.*

*Dema bersiva cînavê kesî bi cînavê kesî netewandî bê dayîn, cînavê pirsyarî "kî" tê bikaranîn; ger bersiv bi cinavê kesî yê tewandî bê dayîn, wê demê cînavê pirsyarî "kê" tê bikaranîn.*

**Mînak:I**
**Kî** hat? **Ew** hat.
**Mînak:II**
**Kê** got? **Wî/ê** got.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Nivîsînên tiştên nayên bawerkirin digirin nav xwe re çi têgotin?**
**2- Ev mijar çi peyamê dide?**
**3- Palvedariya navan ji çi çêdibe?**

## ROVIYÊ SÎTEMKAR

Roviyek hebû pir ziyan dabû derdor, ji ber wê herkes jê direviya. Rojekê hizirî û ji xwe re got:"Ger ez kirasekê olî li xwe nekim, bi wî rengî nekevim tevgerê, ezê li van deran ji birçan bimirim, ji ber herkesî ez naskirime.

Rovî:
"Ezê rabim biçim hecê,
Bixwim mirîşka Xecê,
Bikim hîle û fenda
Heta herime gunda."

Rabû şaşikek da serê xwe, tizbiyek kir stuyê xwe û xwe berda nav gundekî.

Dît ku mirîşk diçêrin,
Li ser sorgo dinêrin,
Rovî giha dehma wan,
Silav kir ser dîkê wan.
Dîk silava wî veda,
Hema hêdîka çikda.

Rovî: "Seyda tu li ser van sorgoyan çi dikî? Were em herin mala Xudê, tu kesekî melayî."

Dîk:
"Pir me dîne te xwarin,
Ji hingê ve şiyar in."
Rovî hat û hûrhûrî,
Tizbe hejand korkorî.
"Ez bûme gunehkar,

Lê min tobeye ji fêlên par."
Bi vî awayî dikê feqîr xapand û bi dîk re ketin rê. Hinekê ji gund derketin, dît kewekê dengxweş dixwîne.Rovî nêzîk bû û silav kir ser.
Kew silava wî veda,
Hema hêdîka firda.

Rovîjî bankirê:"Erê wa feqî çima tu dibî şeqî? Were vaseydayê te bi min re ye, em herin hecê."

Dema kew dîtkurovî û dîk bi hevdû re ne, ba-we-riya wî hat, ew jî ket rex wan û rêwîtiya xwe berdewam kirin.Gihan ber ava çem, nêrîn ordekek li wê derê ye. Rovî silav kir ser ordekê, ordekê silava wî veda û xwe berda nav avê.

Rovî: Seyîd!
"Tu ji nisla Resûlî
Li van deran çi dikî bêxwedî,
Were em herin Medînê,
Da tu cidê xwe bibînê."

Wê jî bawerkir û ket rex wan. Li wan bû êvar.

Rovî: "Em tobedar in, divê em bikevin kunekê da kutebayên din me nexwin."
Geriyan kunek dîtin û herçar bi hev re ketin kunê.

Rovî:
"Ez bûme gunehkar,
Ezê bibim nobedar",
Rovî rabû nobet girt,
Derê kunê taze girt.
Nîvê şevê dibûre,
Dîko rabû dikare.



Rovî: "Ev çiye, ne wextê nimêjêye, ev çi oldariya sixte ye tu dikî?"

Dîk: "Ne sixteye."

Rovî li feqe zivirî: "Feqe bêje, weke min gotî, yan weke mela gotî?"

Feqîrê feqe, li çavê rovî nêrî û tirs ket dilê wî û got: "Weke te gotî, ne weke mela gotî."
Rovî serê dîk jêkir,

Li paşiya kunêkir.
Ketye serê siharê,
Kew jî rabû dikare,
Wê ji xwere dixwîne
Ji Quran û Yasînê.

Rovî: “Çi adet, Quranê dixwîne xelet.”

Feqe: “Ne xelete.”

Rovî li ordekê zivirî: “Seyîd weke min gotî yan wekî feqe gotî?”

Seyîd: “Weke te gotî, ne wekî feqe gotî.”

Rovî serê feqe jî jêkir,
Li dawiya kunêkir,
Ma seyîd û ma rovî,
Seyîd ji tirsa nalivî.

Rovî: “Erê seyîd tu dibêjî ez seyîdim, ka eslê te, ka secera te, çima tu evqas derewa dikî?”

Seyîd:

“Hecî tu pir başî,
Lê xeber belaşî,
Min hebû birayek biçûktir,
Eslê min wî bi xwe re bir,
Ger tu bixwazî ezê,
Herim bînim birayê xwe,
Du şahid û eslê xwe.”
Rovî tima bû û got:
“Başe here bîne,
Lê belê pir nemîne.”

Rovî derê kunê vekir, seyîd derket ji derve û got:

“Hecî ser çava,
Rebî mala te ava.”

## PEYV

**Ziyan:** Zerer
**Şeqî:** Nerihet
**Secer:** Dara binemalê nîşa dide

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Temaşeyî mijara jor bikin, binêrin di navbera he-vokan de kîjan hêma hatiye bikaranîn?

Li dawîya hevoka pirsyarî, hêmay pirsê (**?**) tê bi-karanîn. Hevokên pirsyarî bi peyvên pirsên, pirsyarî ji hevokên din cuda dibin. Lê carna bêku peyva pirsyarî bikeve nav hevokê, dikare bibe hevoka pirsyarî. Ev he-vok di nivîsînê de bikaranîna hêmaya pirsê û di axaftinê de bi awayê bilind xwendina hevokê, ji hevokên asayî tên cudakirin.

**MÎNAK:**

**Ma** Egîd hat?

Egîd hat. Egîd hat?

**Ma** Karwan çû?

Karwan çû. Karwan çû?

Weke di mînakê de jî tê dîtin, hevoka asayî di-ka-re bibe hevoka pirsyarî.

## PIRS

**1-** Çima rovî pêwîst dît ku kirasê olî li xwe bike?
**2-**Kew bi çi hat xapandin?
**3-** Seyîd çawa ji dijmin rizgarbû?

## TÊBINÎ

*Di çanda Kurdî de çîrok carna hûnandî û carnan jî pexşan tên gotin û nivîsin.*

## RÊZIMAN

Bihar, bax, gund, av…

Dema em van navan bi tenê bixwînîn, wê pir baş neyê têgihiştin ka em çi dixwazin û wê li pey hev pir pirs bên pirskirin. Ji bo em van zelal bikin, em bi navê "bihar" re Kurdistan, bi navê "bax" re "çiya", bi navê "gund" re "Botan",bi navê "avê" re jî "zozan" bi-kar-bînin. Ev weke palvedariya navan tê bikaranîn.

**MÎNAK:**

Bihar a Kurdistanê xweşe.
Palvedarveqetandekpalvedêr
Palvedariya navan

Hûn jî mînakên li jêr bi rêbaza ya jor çareser bi-kin.

Gundên Botanê hatine şewitandin.
Ava zozanan cemidiye.

Di palvedariya navekê de herî kêm du nav an jî nav û cînavek peydadibin.Navê palvedêr wateya navê palvedar temamdike.

**MÎNAK:**

Darakevotê zû dişkê.

**1-** Di palvedariya navan depêwîste palvedêr nav an jî cînav be û divê veqetandek di nav van de bê bikaranîn.

**2-** Di palvedariya navan de dibe ku ji yekê zêdetir palvedêrîan jî palvedarî hebin. Em ji vî cûrê palvedariyanavan re dibêjîn **palvedariya navan a zin-cîrî**.

**MÎNAK:**

Pênûs,lênûs ûpirtûkênxwendekar nemane.
P.1 P.2 P.3 veqetandek palvedêr
Palvedariya navan a zincîrî

## HÎNDARÎ

Hûn jî çend palvedariyên navan peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Di bîranînê de tişta herî bala we dikşîne çiye?**
**2- Çima tê xwestin hertim nivîskar bîranîn jiyankir be?**
**3- Dema veqedandek ji nava nav û hevalnavên çawaniyê bê derxistin, çi çêdibe?**

## GELIYÊ ZÎLAN

Kurdan, êrîşên li ser Noşarê, bajarê Erdîş û Bargiriyê jî ji bîr nekiribûn. Bi awayekî pir tûnd li ser van bajaran de jî çûbûn. Pêşengên van hêzan, rewşa di vê germahiya êrîşê de jî ji bîr nekiribûn; wan ez agahdar kiribûm. Ez û pêşengên din yên herêmên din jî li benda roja êrîşa ku li gor rêzikên ku di "fermanameyê" de hatibû nivîsîn, dest bi şer bikin.

Ji bo parastina Kelha Noşarê, girên bilind pir baş hatibûn qayîmkirin. Jixwe kelih jî cihekî pir bilind hatibû avakirin. Bi vî awayî li hember lêhiya êrîşan, şervanên leheng yên Kurdan, 24 demjimêran jî ji wan nehat da ku xwe rabigirin. Noşarê windahiyek mezin da û ket destê Kurdan. Fermandar di şer de hatibû kuştin. Serbaz û leşkerên ku ji mirinê rizgar bûbûn, dîl ketibûn. Ji aliyê din ve jî di roja pêşî ya di êrîşê de gelê Kurd beşek Erdîşê û bajarê Bargiriyê hemû bidest xistibûn. Beşeke Erdîşê û Kelha Bargiriyê di destê hêzên Tirkan de mabûn. Desteya ku ji bo girtina riya Wan-Erdîşê hatibû şandin, bûbûn cangoriyên bê ewlekariya xwe. Vê desteyê bi wêrekî û lehengiyeke mezin, li gel serkeftînên matmayî canên xwe dan; wisa kirin ku li ser hêzên Tirkan rewşa xofanê dan çêkirin û rewşa Erdîşê hat guhertin. Bûyer wiha geş bûye; Tirk ji Wanê ji bo hewara Erdîşê biçin, çendtop û komek leşkeran dişînin. Ev desteya Kurdan li nêzî Erdîşê, riya wan dibirin. Piştî şerê nîv demjimêran, leşkerên Tirkan yên ku tê digihîjin wê jê rizgar nebin, radestî wan dibin. Şervanên Heyderî çawa dibînin ku Tirk radestî wan dibin, ji kozikên xwe derdikevin, da çekên wan bigirin. Dema fermandarê Tirkan dibîne ku jimara şervanên Kurdan kêm e, ji bo radestkirinê jovan dibe û

ferman dide leşkerên xwe, da dest bavêjin çekan û êrîşî wan bikin. Bi vê berdanê re fermandarê Desteya Kurd û çend şervan tên kuştin, yên mayîn jî heta guleyên xwe yên dawî şer dikin. Di dawiyê de ew jî şehîd dikevin. Bi vî awayî hewara hêzên Tirk yên alîkariyê digihîjin Erdîşê.

Êrîşa pêşî ya li ser Erdîşê, ji aliyê Bekiriyan ve hatibû kirin. Çek û cebilxaneyên van têra wan nedikirin. Ji ber kêmbûna çek û çebilxaneyên wan nekarîn Balefirgehê dagirbikin. Van mirovan, bi rê û rêbaza xwe ya Kurdewariyê ku dibêje; "li cihê ku ez dîl bîjim, bila mêrxasî bimirim", bêçek; bikuling, bêr û biviran êrîş biribûn li ser wan û li ber evîniya xwe ya "azadiyê" de çend cangorî dabûn. Balefirgeh bi dest xistibûn û leşkerên wê derê dîl girtibûn û dest danîbûn ser çekên wan û bi vî awayî du firokeyên wan jî girtibûn. Lê belê ne dizanîn bidin xebitandin, ji ber neçariyê ew firok şewitandibûn.

**Îhsan Nûrî Paşa**
**Serhildana Çiyayê Agiriyê**



## PEYV

**Noşar:**
**Erdîş: Navçeyeke ya Wanê**
**Bargir:** Navçeyeke ya Wanê
**Fermaname:** Nameya fermanê
**Serbaz:** Serleşker
**Xofan:** Tirs
**Şervanên Heyderî:** Şervanên bi baldarî tevdigerin
**Radest:** Dayîna dest
**Balefirgeh:** Cihê balefir lê radiwestin

## PIRS

**1-** Bi xwendina vê mijarê re, hestekê çawa bi we re çêdibe?
**2-**Desteya Kurd berxwedanek çawa nîşa da?
**3-**Dema Geliyê Zîlan tê gotin çi tê bîra we?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsînên tişta bi serê nivîskar de hatî yan jî ni-vîskar bûyî şahidê bûyerê radigihîne re **bîranîn** tê gotin.

Pêwîst e bîranîn xwe bispêre rastiyê. Zimanê wê xwerû, têgihandina wê bibandor be, bîranînên hêza wan ya kişandinê heyî, ji aliyê gelek mirovan ve bi zewq tê xwendin.

## RÊZIMAN

Ji birepeyvên ji nav û hevalnavekê tên holê re **raveka hevalnavan** têgotin.

**Mînak:**

Kewê risasî pir xweş dixwîne.
Nav veqedandek hevalnav
Raveber raveker
Raveka hevalnavan

Di raveka hevalnavan de her tim nav raveber û hevalnav jî ravekere.

Gelek caran veqetandek dikeve navbera nav û hevalnav.

Pêveka palvedanê bi dawiya raveka hevalnavan ve nabe.

Dibe ku di raveka hevalnavan de gelek hevalnav hebin yan gelek nav hebin. Em ji van re dibêjîn **raveka hevalnavên zincîrî**.

**Mînak:**I

Gula zer geş û bêhnxweşji min re bîne.
Nav HN.1 HN.2 HN.3
Raveka hevalnavên zincîrî

**Mînak:**II

Çiya, zozan û deşta hênik.
N.1 N.2 N. 3 hevalnav
Raveka hevalnavên zincîrî

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî raveka hevalnavên jêr çareser bikin.
Bexçeyê xweş
**2-**Îhsan Nûrî Paşa kî ye? Lêkolîn bikin.

MİJARA SERBEST

# DAYÎKA MIN



Di wan şevên tarî de, te ji min re dilorand. Her qêrîneke min hezar carî êş dixist dilê te. Li ber serê min rûdiniştî, heta tîrêjên rojê didan cîhanê, tu rûdiniştî. Min tenê gava çavên te yên reş dinêrî, dayîka min; di nav çavên te yên melûl de, min evîna dayîkan didît. Li vê cîhanê, ez ji te, têr nebûm. Belkî li cîhana din, belkî li bihûştê, em hev bibînin. Gava roj sor dibe, xwe dixemilîne; di pişt asoyan re diçe ava û ez di nav xiyalên xwe de, li dayîka xwe digerim. Weke bilbilê her roj bixwîne, li hêviya vebûna gulê be, dayîka min; ez jî bi hesreta dîtina te me, tenê carekê te bibînim, derdên xwe ji te re bêjim, te bêhn bikim û hembêz bikim, bes e. Li çavên te yên reş binêrim û evîna dayîkê bibînim.

Ez li asîman, di nav ewran de; "gava stêrk ji xwe re dilîstin, di nav xiyalên xwe de digeriyam."  Ez di nav deryayê de wekî masiyekî her dem, di nav deryayê de be, dilîstim. Weke masiyekî ku nikaribe ji avê qut bibe, dimam û li dayîka xwe digeriyam. Di nav şevên tarî de, bi dengê şirqîna birûskan, bi qêrîna bahozê re, ez li dayîka xwe digeriyam. Di wan şevên tarî de ku çav çavan nabînin, ez digeriyam. Ji dûr ve min çirûskeke ji ber agirekî geş mabû, min xwe lê girt û bi dilekî kul û bi hesretekî mezin, derdê xwe ji wê çirûska agir re digot. Hêviya min ew e ku ez dayîka xwe, di bin siha azadiyê de bibînim. Weke pepûlên xwe davêjin nav agir, ez carnan xwe davêjim nav agir.

Ji ber hesreta dîtina te, di jiyanê de, bitevger im. Dayê! Wekî berekî di çola havînê de, bê av bimîne û li hêviya dilopeke av be. Dayîka min! Ez bi hesreta te û tenê te carekê bibînim û serê xwe deyinim ser zenda te û bêjim: "Dayîka min! Gula biharê û çîmena ber çeman!"

***Ş. Çîmen Herekol***

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Dema nivîskar dibêje: "Gulbihar" dixwaze çi bêje?**
**2- Hûn ji helbestên kîjan hozanî hes dikin?**
**3- Hûn dikarin hevokekê hevalkar tê de hatî bikaranîn binivîsin?**

## GULBIHAR



Gulbihar, gula biharê,
Tu xeml û rewşa adarê,
Her sal wek îro li darê,
Gulbihar rewşa adarê.

Çîçek û gul û nesrîn e.
Nêrgiz û lal û gulçîn e.
Sînem û kal sosinî ne.
Gulbihar rewşa adarê.

Sorgul û rîhan, bibîn in.
Binefş û çîmen şîrîn in.
Li ba yara xemrevîn in.
Gulbihar rewşa adarê.

Xemrevîna dildaran tû,
Serwera evîndaran tû,
Dilkuştiyê ciwanan tû,
Gulbihar rewşa adarê.

***Celaded Bedirxan***




## PEYV

**Sosin:** Kulîlkek ya li Kurdistanê çêdibe,
**Lal:** Bi wateya kulîlka laleyê de bikaraniye,
**Gulçîn:**Di wateya beşên gulan de hatiye bikaranîn,
**Binefş:** Kulîlkek rengê wê mor e.
**Sînem:** Hezkirî,
**Nesrîn:**Navê kulîlkeke.

## EM WÊJEVANÊ XWE NAS BIKÎN

Celadet Bedirxan, ji binemala Bedirxaniyan e. Kurê Emîr Elî Bedirxan e. Celadet Bedirxan di sala 1897'an de li Stanbolê ji dayîkbûye. Celadet Bedirxan li ser "**ALFEBE**" ya Kurdî ya Latînî, rêzimana Kurdî û helbestan xebatek giran biha kiriye.

Celadet Bedirxan, di sala 1951'an de çûye li ber dilovaniya Yezdan.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Malika li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin.
xemrevîna dildaran tû,
Servera evîndaran tû,
Dilkuştiyê ciwanan tû,
Gulbihar rewşa adarê.

## PIRS

**1-**Li gor helbestê, tiştên xeman direvînin çine?
**2-** Di helbestê de Gulbihar di wateya çi de hatiye bikaranîn?

## CÛR Û AWÊN

**Helbesta li jor mirov dikare bi dû rengan bigire dest. Ji ber ku tê de xweşikbûna xwezayê heye, weke helbesteke pastoral, her wiha ji ber di hinek rêzikên wê de mînandin (îstîare) heye, helbestek sembolîk e.**

**Pîvan:**

Ji wekheviya kiteyên rêzikên helbestan re **pîvan** tê gotin.

**Mînak:**

"Sorgul û rîhan, bibîn in.
Binefş û çîmen şîrîn in.
Li ba yara xemrevîn in .
Gulbihar rewşa adarê."

Weke di malika jor de jî tê dîtin, dema em bixwazîn helbestekê bi pîvan binivîsin, pêwîste jimarê kiteyên rêzikên helbestê qasî hevbin. Lê carna dibe ku hêjmara kiteyên du rêzikan bi qasî jimara kiteyên du rêzikên li pey wan be.

Qafiye; li gor ahengiya dengên li dawiya rêzikan dibe çar beş.

Qafiya lewaz, (nîv)
Qafiya tam
Qafiya dewlemend
Qafiya hevdeng (cînas)

Qafiya helbesta we xwendî, qafiya tam e.

Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestan re **qafiya tam** tê gotin.

## RÊZIMAN

Ew peyvên ku bandorê di aliyê cih, dem, rewşî, çendî û pirsyarî de li kar dikin, cih û demê kar yan awa û qasiya wê didin diyarkirin re **hevalkar** tê gotin.

**Hevalkar di nav xwe de dibin pênc beş:**

**1- Hevalkarên demî:**

Ew peyvên demê kar diyardikin yên weke; **“demjimêr, sal, meh, roj…”** bi mercên ku bandorê di aliyê dem de li kar yan saloxê bikin, dibin **hevalkarên demî**.

**Mînak:**

Xwendekarên me **par** xebitîn.

Xwendekaran **heftiyekî** perwerde dîtin.

**2-Hevalkarên rewşî:**

Ji peyvên rewş û awayê kirina kar û rewşa saloxê didin diyarkirin re **hevalkarên rewşî** tên gotin.

**Mînak:**

Wane **birêkûpêk** tên dayîn.

Zarok **baş** dimeşin.

**3- Hevalkarên cih û ber:**

Ew cûre hevalkarên, cih û berê kirina kar yan saloxê didin diyarkirin re **hevalkarên cih û ber** tê gotin.

Peyvên cih û ber yên bingehîn tên bikaranîn evin: **“paş-pêş, rast-çep, jêr-jor”**

**Mînak:**

Awaz ber bi **rastê** dimeşe.

Derya ber **jor** diçe.

**4- Hevalkarên çendî:**

Ev cûrê hevalkarên di aliyê zêdebûn û kêmbûnê de bandorê li kirina kar yan saloxê dikin re **hevalkarên çendî** tê gotin.

**Mînak:**

Nivîskar, nivîsîn **gelek** nivîsî.
Hogir av **kêm** vexwar.
Zozan **pir** sar in.

**5-Hevalkarên pirsyarî:**

Ew peyvên pirsê ji çawaniya kirina kar yan çawaniya saloxê dikin re **hevalkarên pirsyarî** tên gotin.

**Mînak:**

Pîrê **çawa** çîrokan dibêje?
Ew **ji kûderê** hatin?
Bihar **çiqas** xweşe?
Hûn **kengê** hatin?

## HÎNDARÎ

1-**Nivîsîna li jêr bi awayê destnivîs li lênûsa xwe danin.**

Gulbihar, gula biharê.
Tu xeml û rewşa adarê.
Her sal wek îro li darê.
Gulbihar rewşa adarê.

2-Hûn jî çend mînakan li ser hevalkaran çêbikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Nameya wêjeyî kengê hatiye nivîsîn?**
**2- Gelo bandorên teknîkê yên li ser nameyê hûn dikarin binirxînin?**
**3- Dema em baneşanê bikartînîn, em dixwazin çi bêjin?**

# NAME

**23/06/2009**

Dayîka Hêja!



Ji bo ez rewşa we fêrbibim û ji ber min pir bêriya we kiriye; ez vê namê dinivîsînim. Bawer dikim dema hûn nameya min bigirin, hûnê pir dilşad bibin.

Ger hûn pirsa min bikin, ez niha li zankoya Silêmaniyê di beşa wêjeyî de dixwînim. Armanca min ewe ku di aliyê zimanê Kurdî de, xwe baş pêşbixim û bikaribim, zimanê hatî qedexekirin bihêz bikim. Di aliyê tendirustî de, pirsgirêkên min nînin. Hinekê di aliyê têgihandina axaftina zaravayê Soranî de zoriyê dibînim, lê ev ji bo min nepirsgirêke. Ji ber armanca min di hemû aliyan de serkeftine.

Dayîka hêja!

Ez niha pir xema we dikim, gelo hûn çawanin, birayê min Şerko hîna xwendina xwe dewam dike? Ger dewam neke, ezê jê bixeyîdim. Rewşa tendirustiya bavê min çawaye? Ger ji min re ragihînin wê baş be. Daxwaza min ewe ku hûn bûyerên pêkhatî bi riya nameyan ji min re ragihînin.

Berî ez dawî li nama xwe bînim, carek din bidil û can we silav dikim û ji we re bextewariyê dixwazim. Bi daxwaza rojên xweş, silav û rêz.

Navnîşan
Kolana 41
Bextiyarî Taze
Silêmanî

Dilşad Cûdî
wajo

## PEYV

**Dilşad:**Dilxweş
**Zanko:** Zanîngeh

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Weke di mînaka jor de jî tê dîtin, nameya asayî bi birepeyvên bangî dest pêdike. Piştî wê bendeke kurt, tê nivîsîn û dikeve nav naverokê. Her tişta tû dixwazî bînî ziman, di vê bendê de dinivîsî û derbazî benda encamê dibî. Divê benda encamê, ji bendên din kurtir be.

Peyvên weke: Divê, pêwîst e, her wiha tê de nayên bikaranîn.

***ŞIYARÎ***

*Dibe ku naverok ji çend bendan pêkhati be.*

*Li milê jor, aliyê rast dîrok, li milê jêr, aliyê çep navnîşan û li milê rastê jî nav, paşnav û wajo tê binivîsin.*

**Dîrok**

**Bang ..............................**

**Destpêk.......................................................**

**.........................................................................**

**..............................**

**Naverok......................................................**

**.........................................................................**

**.........................................................................**

**.........................................................................**

**............................................**

**Encam......................................................**

**.......................................**

**Nav û paşnav**

**Navnîşan** **wajo**

Li ser têgirê, aliyê jor, milê çepê nav û navnîşana hinêr, li milê rastê pol, li aliyê jêr milê rastê jî nav û navnîşana girtek tê nivîsandin.

**Nav û Navnîşana hinêr**

**Pol**

**Nav û Navnîşana girtek**

## PIRS

1-Name bi hestek çawa tê nivîsin?
**2-**Navnîşan li kûdera têgirê tê nivîsîn?
**3-**We qet name nivîsandine?

## CÛR Û AWÊN

Ji wan nivîsînên ji bo em hest, raman û xiyalên xwe û bûyerê me jiyankirîn, ji yên, ji xwe dûr re dinivîsîn,jê re **name** têgotin.

Name berhemekê wêjeyî ya herî kevne. Nameyên destpêkê, Bz. di sed sala XIV û XV'(14-15) an de, di nav berhemên Firewnên Misirê û Hîtîtiyan de hatine dîtin.

## RÊZIMAN

Hevalkarên di hevokên jêr de diyar bikin û navên cûrên wan binivîsin.
**1-**Em îro waneyê dibînin.
**2-**Şoreş nameyan xweş dinivîse.
**3-**Xwendekar berbi pêş dimeşin.
**4-**Em ji pirtûk xwendinê gelek hez dikin.
**5-**Em ji xwendinê çiqas hez dikin?

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî çend hevalkaran di nav hevokê de binivîsin.
**2-**Jimarên jêr ên bi awayê xemil hatî nivîsin li lênûsa xwe binivîsin.

# *123456789*

## TEST 2

**1- Di kîjan hevokên jêr de palvedariya navan heye?**

**A)** Gula sor ji min re bîne.
**B)**Deryaya Spî deryayekî firehe.
**C)** Dara gozê biberheme.
**D)**Di mal de namê binivîse.
**E)**Mamoste pir zanaye.

**2- Ji wan cûrenivîsînên cihê geryayî û dîtî, a-gahiyên komkiri, tiştê hiskirî radigihîne re çi tê gotin.**

**A)** Rexnekirin
**B)** Wêneyîkirin
**C)** Jîname
**D)**Geryaname
**E)** Gotar

**3- Di kîjan hevokên jêr de raveka hevalkaran heye?**

**A)** Dara xweşik bilinde.
**B)** Darhinar ciwane.
**C)**Ava sûsê xweşe.
**D)**Şox û Şeng bi hev re çûn geştê.
**E)**Deştên Kurdistanê hênik bûne.

**4- Di kîjan hevoka jêr de hevalkara demî hatiye bikaranîn?**

A) Aram bi lez çû.
**B)** Azad par xwendekar bû.
**C)** Gulîzar li pêş dibeze.
**D)** Aheng li jor rawestiya ye.
**E)** Ew li rastê rûniştiye.

**5- Pêwîst e li ser kîjan hevoka jêr hêmaya pirsê bê bikaranîn?**

**A)** Ew pênûsa mine
**B)** Karker ji kar zivirîn
**C)** Ma ev xwendekar e
**D)** Mam Şêrwan xemgîne
**E)** Her çar vebijark jî şaşin

**6- Ji nivîsîna bermayekê wêjeyî û pîşeyî hûrkolîn dike, berhemê tê nasîn di aliyê wêje û dîroka pîşeyî de rûmetê datîne holê, aliyê wê yê serkeftî û binkeftî diyar dike re dibêjîn çi?**

**A)** Bîranîn
**B)** Nûtûq
**C)** Rexnekirin
**D)**Geryaname
**E)** Civat

**7- Di kîjan hevokên jêr de hevalnavên nîşandanê hene?**

**A)** Ev xwendekar kesekê rêzdar û jêhatî ye.
**B)** Ev hem zana hem pêşketî ye.
**C)** Wî pirtûk xwend.
**D)**Min hevaltiya vî kir.
**E)** Wê gava din, çend hevok anîn ziman.

**8- Di kîjan hevoka li jêr de hêmaya baneşan nayê bikaranîn?**

**A)**Wax Çi birînek kûre
**B)** Wa Hêja Were em biçin
**C)** Heval Ev mala meye
**D)** Delalê Negirî
**E)** Delal Xweş digirî

**9- Di kîjan hevoka jêr de palvedariyan nav ya zincîrî heye?**

**A)** Dara dirêja pelşîn ket.
**B)**Zozan, çiya, deştên rastên kurdistanê.
**C)**Gula sor bi darê ve tê.
**D)**Bêrîvana ciwan xwendekar e.
**E)** Hevalên me hatin.

# BEŞA 3

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Ji bo hûn daxwaznameyekê binivîsînin, hûn awayê nivîsîna wê berçav digirin?**
**2- Di daxwaznameyê de navnîşana xwe li kûderê datînin?**
**3- Hûn çi cudahiyê di navbera peyvên dibin kar û yên dibin nav de dibînin?**

## DAXWAZNAME

### Ji Bo Rêveberiya Perwerdeya Qamişlo

Di dawiya sala perwerdeya 2013/2014'ande pêşbirka ji aliyê we ve bê li darxistin, bi çend hevalên xwe ve em jî dixwazin beşdar bibin.

Ger daxwaza me bê pejirandin emê kêfxweş bibin.

*Navnîşan:* *24/06/2013*
*Kolana Kudûrbeg 14* *Wajo*
*Qamişlo* *Viyan Penaber*

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**1-** Di daxwaznameyê de rêzika weke sergotar tê bikaranîn yan tev yan jî destpêka her peyvekê bi tîpên mezin tên nivîsîn.

**2-** Di nivîsandina daxwaznameyê de pêwîste nivîskar daxwazên xwe bi rêzdarî bîne ziman.

**3-** Di navbera jimarên bi hevdû ve têkildar de xêzika xwar (/) tê danîn.

**Mînak:**
Wê perwerda me ya 2013/2014'ê sibê destpê bike.

Di 24/06/2014'an de me ji bo rêveberiya dibistanê daxwaznameyek nivîsî.

## PIRS

1-Daxwazname çi ye?
2-Mirov ji ber çi daxwaznameyê dinivîse?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsînên ji bo daxwaza kes,kom û gazindên wan yan jî rewşekê, ji cihê peywendîdar re radigihîne re **daxwazname** têgotin.
Divê daxwazname li ser kaxeza spî ya bê xêzik ya pîvana wê tam bi pênûsa reş yan şîn bê ku bê reşkirin, bê nivîsîn.

## RÊZIMAN

Ka çawa hinek peyv dibin nav, herwiha peyvên dibin kar jî hene. Yanî dema peyvek kirina karekê dide nîşandan em ji wê peyvê re dibêjîn **kar**. Kar, ji jêderên karî pêktên û li gor deman, rewşa xwe diguherin.

**Mînak:**

Ji jêdera **xwarin,** karê: "xwar, xwariye, xwaribû, dixwar, wê bixwe" çêdibin.

Her karek tê wateya hevokê. Ji ber dema em dibêjin; "çûye" em têdigihin ku kesekê li wê derê, karê çûyînê pêkaniye. Ji ber wê her we ku hatî gotin; "Egîd çûye zozanan" xwediyê wateyek tame.

## HÎNDARÎ

**Daxwaznameyekê bi awayê destnivîs ji rêveberiya dibistanê re binivîsin.**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Cudahiya di navbera mijara derbazbûyî û vê mijarê de hûn dikarin bibînin?**
**2- Ji serpêhatiyên dirêj yên ku gelek bûyeran radigihînin û gelek qehremanên wan heyî re dibêjîn çi?**
**3- Cûdahiya alavan ji peyvên din çiye?**

## TARÎX Û SIRÛD

Agirî çiyayekî bilind e. Di nav kirasekî spî de rapêçandî ye. Serî bi mij û duman û çiyayekî berz û kevnar e. Ziyaretgeha dîndar, evîndar, derwêş û bîreweran e. Warê şervanan û kaniya xurtî û mêraniyê ye. Navenda serhildanan e. Agirî, çiyayê ji agir e, çiyayê serî di esîmanan de ye û kelha parastina xwe yê xwe ye. Kelha Xoybûnê ye.

Li ber qotarên çiyayê Agirî, şervanên Kurd, çekdar û dengdar strana Agiriyê ne. Bi dengekî, hemû bi hev re, li nik wan fermandarên wan, Îhsan Nûrî Paşa, Biro Heskê Têlî Paşa, Temirê Şemkî, Şefdîn Beg û Ferzende Beg hebûn.

Li hemberî wan jî Îskender Beg bû. Yanî Memduh Selîm Beg. Alaya Kurd ya rengîn li ser zinarekî bilind dibe, dinya sar e û berf ketiye li ser çiyê. Bilindahiya çiyê di nav berfê de, bûye xwedî kirasekî spî.

Sirûda şervanên Kurd, Destana Serhildana Kurd ya Agiriyê ye…

Şervanên Kurd xêrhatin li Îskender Beg dikirin. Îskender Beg, çend Kurdên Îranê û dû Ermenî, li şervanên Kurd dinêrin. Bêdeng û biken, dilê wî wekî dengê çiyayê Agiriyê hiltavêje. Germ û bilez, heyecenakî zêde, dil û mejiyê wî girtiye.

Xudawo! "Tu qadîrî, ma minê ev roj jî bidîtina?"(Leşkerên Kurd, fermanderên wan û alaya Kurd, axa rizgarkirî.

Jiyanekî ji nîr û zordariyên xerîban dûr e.)



"Îskender Beg: Gelî Hevalan! Hûn bixêr û xweşî hatin. Em, leşker û fermandarên Şoreşa Kurd ya Çiyayê Agiriyê silav li we dikîn. We, em kêfxweş û serbilind kirin. Bixêr bên."

Dengê Îhsan Nûrî, dengekî xurt û hişk yanî dengê serleşkerekî ye.

Îskender Beg kelegirî ye. Ji kêfxweşî û heyecanê, deng jê dernakeve. Ew dizane, eger ew devê xwe veke, ewê bigirî. Ti carî tiştekî wiha neqewimî bû, ew, ev çend bi agirê heyecanê nehati bû sotandin. Pêtên heyecanê ti carî ev çend bi xurtî bi ser wî de nehatibûn.



Li ber çavên hemuyan Memdûh Selîm Beg tiştekî dike; ew çokên xwe datîne erdê, berjêrî erdê dibe û axa reş radimûse. Sê caran giran giran. Li pey ramûsandina axê re, ew mistekê li axê dixe, nav destên (lepên) xwe, axa reş bêhn dike. Dirêj dirêj, ew li axê, ala çiya û şervanên Kurdan dinêre.

Îhsan Nûrî Beg tê û wî ji erdê radike. Ew bi ken li hev dinêrin û hevdû hembêz dikin. Bi dirêjiya deqîqeyan, paşê jî ew, bi hev re ber bi fermandar û şervanan ve derin. Îhsan Nûrî Beg wan yek bi yek, bi Memduh Selîm Begê dide nasîn. Ew jî wan, yek bi yek hembêz dike.

"Begê min Îhsan, ez dixwazim alaya serbestî û azadiyê jî ramûsim. Ji min re vê tiştê jî bike, ji kerema xwe re, wê bîne, ez wê ramûsim û bêhn bikim. Bêhna serbestî û azadiyê bigirim…

**Mehmed Uzun**
**Ji romana 'Siya Evînê'**

## PEYV

**Berz:**Mezintir, bilindtir
**Xoybûn:**Navê tevgerekî Kurdbû

## EM WÊJEVANÊN XWE NAS BIKIN

Mehmed Uzun, di sala 1953'an de li Siwereka girêdayî Ruhayê hatiye cîhanê. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Siwerekê xwendiye. Zanîngeh jî, li zanîngeha Enqere ya mamostetî ya teknîka bilind xwendiye. Ji ber zordariya dijmin di sala 1977'an de derbazî Siwêdê dibe û jiyana xwe di penaberiyê de berdewam dike. Pêşevanî ji gelek kovar û rojnameyan re kiriye û gelek berhemên navdar (Tû Mirina Kalekî, Rin, Siya Evînê, Rojek Ji Evdalê Zeynikê…) jî nivîsandine.

Mehmed Uzun di sala 2007'an de çûye ber dilovaniya Yezdan.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

1- Gelo hûn dizanin çima nivîskar di nav nivîsandina xwe de sêxal (**...**) bikaraniye?

Ji bo hûn bidin diyarkirin ku mijara hatî dayîn bi awayekî tam nehatiye nivîsîn,pêwîst dike ku tû sê xala bikar bînî.

2- Di mijara me de pirbûna bêhnokan jî bala we kişandiye?

Ji ber roman dirêjahiya serpêhatiyane, bûyerên wan bi hevdû ve girêdayîne û qehremanên wan bêhn vekirinên wan jî kurt û zêdene. Di van cihan de jî bêguman bêhnok tê bikaranîn.

## PIRS

**1-**Îhsan Nûrî Paşa kî ye? Lêkolîn bikin.
**2-**Memduh Beg (Îskender Beg) çima kelegirî dibe?
**3-**Çima di romanê de sirûda şervanên Kurd weke destana Agirî bi nav kiriye?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsînên dirêj yên ku bûyerekê yan gelek bûyeran bi hev re radigihîne û di nav wê de gelek leheng heyî re **roman** têgotin.

Roman li ser sê endamên bingehîn tê çêkirin:

**a-Bûyeran**

**b- Kesan**

**c- Cih û dem**

## RÊZIMAN

Peyva ku bê wate lê dema dikevin gel navan dibin xwedî wate re dibêjîn **alav** (**amraz**).

Em dikarin alavan bi vî awayî ji hev cuda bikin.

**1-Alavên bangî:**

**Mînak:**

**Wa** Hogir! Tû bixêr hatî.

Heval**o**! Te gul çandin?

**2-Alavên gihanek (peywend):**

**Mînak:**

Kajîn **û** Gulbîn çûn.

Ewê **ku** hatî jîr e.

**3-Alavên daçekî:**

**Mînak:**

**D**i mal **de** namê dinivîsim.

**Bi** min **re** hat.

**Alavên daçekî evin:**“**di-de**, **bi-ve**, **ji-re**, **li**”

TÊBÎNÎ:
Carna paşdaçek pêşdaçeka xwe diguhere û têgehek nû tê qezenc kirin.

**Alavên mercî:**

**Mînak:**

**Ger** Hogir bê ezê bêm.
**Heke** bikarim ezê binvîsim.

**5-Alavên sedemî:**

**Mînak:**

Em **ji bo** azadiya xwe têdikoşîn
**Ji ber** zana bibim, dixwînim.

**6-Alavên pirsyarî:**

**Mînak:**

**Ma** we xwend?
We **çima** xwend?

## HÎNDARÎ

**1-**We kîjan roman xwendine? Şîrove bikin.
**2-**Hûn jî çend alavan di nav hevokan de bikarbînin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Di vê mijarê de tişta herî bala we dikişîne çiye?**
**2- Aliyên wekhev û newek hev yên mijara derbaz bûyî û vê mijarê bidin diyarkirin.**
**2- Gelo mirov dikare bêje kar di hevokê de endama herî bingihîne? Çima?**

# HEY AGIRÊ NEWROZÊ



Serhildan, Newroz sazkir.
Şêwla şêvê ronîkir.
Ronîtî, dila şadkir.
Hey Agirê Newrozê.

Kawa hat, şîna aşkir.
Sal nû bû, neyar xulkir.
Xorta ag'r gur, şur tûjkir.
Hey Agirê Newrozê

Kawa zor dîlan, sazkir.
Av, gula xweş hêşînkir.
Li zozan, waran sazkir.
Hey Agirê Newrozê .

Dehaq tû xelkê şaşkir.
Pêşmerge zulum rakir.
Rastî welat rizgarkir.
Hey Agirê Newrozê.

***Seydayê Tîrêj***

## PEYV

**Şêwl:**Bayê hênik
**Şêw:**Şev
**Şîn:**Xemgirtin
**Xul:**Tewandin
**Pêşmerge:** Kesên li pêşiya civakê canê xwe gorî dikin.Cangorî.

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKIN

Seydayê Tîrêj di sala 1923'an de li Rojavayê Kurdistanê ji dayîkbûye. Seydayê Tîrêj gelek helbestên xwe yên navdar li ser xwezaya Kurdistanê û perîşanî û bindestiya Kurdan hunandiye.

Seydayê Tîrêj di sala 2002'an de li bajarê Hesekê çûye ber dilovaniya Yezdan.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Ji wan rêzikên tên gel hev û wateyekê bi hev re tekuz dikin re dibêjîn **malik** (beyt).

Weke di mijarên derbazbûyî de jî hatî dayîn, malikên ji rêzikan pêkhatî di heman demê de bingehê helbestêne jî.

## PIRS

**1-**Çima Seydayê Tîrêj dibêje: “Kawa hat şîna aşkir”?
**2-** Li gor nivîskar dema sala nû bê, wê çi bê serê neyaran?
**3-**Newrozê binirxînin?

## CÛR Û AWÊN

Ev cûre helbest, helbestek epîk e. Em ji wan helbestên ku mijara wan şer, egidî, lehengî û welatparêzî re dibêjin **epîk**.

Bûyerên dîrokî bi vegotineke kelecan tîne ziman. Ev cûre helbest têra xwe dirêj in, ji van helbestan re, **helbestên destanî** û **helbestên lehengî** jî tên gotin.

Di hûnandiyê de bêguman malik û qafiye jî tên dîtin, li gel wan carna di helbestê de, li dawiya rêzikan heman rêzik tê dubarekirin; ji vê rêzika tê dubarekirin re dibêjin **qulf.**

**Li dawiya rêzikên vê helbestê redîf te dîtin.**

**Ji wekheviya peyv yan pêvekên di heman wateyê de, li dûv qafiyê tên dûbarekirin re redîf tê gotin.**

**Mînak:**

Kawa zor dîlan, saz**kir**
Av, gula xweş hêşîn**kir**
Li zozan, waran saz**kir**
Hey Agirê Newrozê

## RÊZIMAN

**Di zimanê Kurdî de bi dû awayan endamên hevokan tên binavkirin.**

**1-Endamên hevokên karî:**

Endamên hevoka karî sazdikin evin: **“Kar, kirek, pêkir”**

**TÊBÎNÎ:**

**Têrker endamê alîkar yê hevoka karî ye**.

Ji peyvên ku di hevokê de karê kirina kirekî didin diyarkirin re dibêjîn **kar**.

Weke ji mijarê jî tê têgihandin, endama herî bingehîn ya hevokê kar e. Ji ber kar bi serê xwe jî hevokeke, dema kar tûnebe, hebûna hevokê pêkane. Dibe ku di hevokekê de ji yekê zêdetir kar hebin, her wiha dibe ku karekî gelek kirekên wê hebin.

**Mînak** I**:** Serdar şer **dike**.

**Mînak** II**:Hatin**.

**Mînak** III**:** Ez ji xew **rabûm**, **ketim** rê û **çûm** dibistanê.

**Mînak**IV**:** Rondikên dayîkan, avên robaran **diherikin**.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Li gor we nameyên ji xizman re tên rêkirin ji kîjan cûrê nameya ne?**
**2- Hûn dizanin kar li gor wateya xwe dibin çend beş?**
**3- Cûdahiya di navbera vê mijarê û mijara derbasbûyî de çi ye?**

# JI BO DAYÎKÊ NAME



Min di bexçeyê dilê xwe de, darek çandiye.

Dayê!...

Dara min çandî, dara azadiyê ye.

Ax! Tû bizanî dayê, ev dar çend mezinbûye, çend çiq û pel daye, çend dîtinek seyr daye.

Dayê!

Çima ew qas mezin dibe, çiqên wê pel didin, roj bi roj qurmê wê stûr dibe? Belê, ev dara baxçê dilê min bi ava asayî, bi cû û cûbaran, ro û robaran, celal û çiravan nayê avdan. Bibaran û teyrok (gijlok) û berfê jî, rewa nagire. Teyrok, baran û berfa vê darê, xwihdana keç û xortane; cû, robar û celalên wê av didin ji xwîna keç û lawane.

Dayê!

Te bidîta, darek çend şîrîne, nizanim çinare, goze, qaçe yan bîşengek rengîne, li binya Çiyayê Reşkê, li ber Çemê Feraşînê, çengê xwe şorkirine.

Ax dayê! Ev dar çend şîrîne.

Xweziya ez bibam bayekî sibê, min hilkira nefelek çarpela (nefela mirad hasila), Çemê Fereşînê ji dayîka xwe re baniya yan bibama bilbilek li ser vê darê, pelek yan kulîlkek ya wê, ji dayîka xwe re bigihanda, da bizaniya, dara

min çend rengîne.

Cih û warê wê çend şîrîne, xeman neke dayê; ezê xwe bihêz bikim, darê hêj mezintir bikim, asteng û keleman nasnekim.Li ser Nizmû, Kêla Memê û Cudiyê Mirada re werim; şevek ya Newrozê, di nav pîrozkirin û dîlanê de, xwe bêxim hembêza te.

Wî demî, tê hêj pitir rûmeta dara min bizanî.

Çi bikim dayê!

Her tim dixwazim li hembêza we, bixwarin û vexwarina li ber destê we, ez kulîlkek ji baxçeyê mala we û tim li ber bêhna we bim.

Lê çi bikim dayê!

Dayîka mezin dîle! Ger ez nebim û zarokên dayîkên wek we, dil bixem nebin, wê kes jê re nebe xwedî, xudan û delîl.

Xema neke dayê, ezê nameyekê binivîsim, bi awazên dengê bilbilê li ser Benûşka Kelha Seîd Begê, li ser perê kevokek spî ku nîşana aştiyê ye, bi berbanga sibê re, ji Çiyayê Reşkê bifire li ser Çemê Fereşînê Meydan Beybûnê, Meydan Zengilê, Gola Ber Çiya, Mezelên Bestan, sêwan bide, ta demê şîvê, li ser banê xanî, Deşta Germiyan, li ber dayîka min dane. Wî çaxî ezê bibim kulîlkek rengîn, ne di baxçê mala we de, belkî di baxçê dilê we de, her û her şîn bibim, bêhn bidim û bimînim.



## PEYV

**Rewa:** Dema qasiyek av di nav axê de diçe xwar
**Nefel:** Cûrek yê giyayê bikulîlk

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Weke di mijarê de jî tê dîtin, di nameyan de carna birepeyvên bangî tên bikaranîn û li ser van birepeyvên bangî baneşan (**!**)tê danîn.

## PIRS

**1-** Armanca nivîskar ji darê çi ye? Şîrove bikin.
**2-** Li gor mijarê, ev dar, rewa xwe ji çi digire?

## CÛR Û AWÊN

Dema em li danasînên nameyan temaşe dikin, pêdihesin ku ev nameya me cûrenivîsînekê ya nameya taybete.

Ji ber nivîskar, ev name bi awayekî taybet ji dayîka xwe re şandî ye.

Nivîsînên ji bo dost, heval yan ji bo xizman tê şandin re **nameyên taybet** têgotin.

**Cûrên nameyan:**

**1- Nameyên taybet:** “Nameyên heval, dost, evîndarî, serxweşî, spasî, vexwendin û pîrozbahî.” Ji cûrên nameyên taybetin.

**2- Nameyên wêjeyî:**Kesên navdar di herêma huner û wêjeyê de, bi aramanca hest û hizrên xwe bidin xuyakirin û rexnekirinê, nameyên tên nivîsîn,**nameyên wêjeyîn** e.

**3- Nameyên fermî:** Nameyên ji bo ragihandina kar, di navbera saziyan de yan bi heman armancê ji kesên taybet re tên şandin re **nameyên fermî** tê gotin.

**4- Nameyên kar:** Nameyên bi armanca têkîliyên karê bazirganiyê yan jî ji bo sazûmankirina mercên xebatê di navbera aliyan de ji saziyên taybet yan saziyên fermî re tên şandinin.

## RÊZIMAN

**Kar li gor çêbûna xwe dibe sê beş:**

**1- Karên xwerû:**

Ew karênku ji peyvekê xwerû pêktên re dibêjîn **karên xwerû**.

**Mînak:**

Xatûn **çû** bazarê.
Hêlînê nan **xwar**.
Serdem şer **dike**.

**2- Karên tûredayî (dariştî)**

Ew karên ku bi alîkariya pêvekên sazker yên li ser peyvek xwerû zêde bûyî û peyvek nû dayîn avakirin re **karên dariştî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew **hilket** jor.
Wî **daxist** jêr.

| Pêveka sazker | Peyva xwerû | Peyva darişt̂î |
|---|---|---|
| hil | ket | hilket |
| da | xist | daxist |

**3- Karên hevgirtî:**

Karên ji dû yan zêdetir peyvan pêkhatin re dibêjîn **karên hevgirtî**.

**a-**Karên hevgirtî; yên ji nav û kar pêkhatîn:

**Mînak:**

Me li hember dijmin **sebirkir**, paşê me lêxist.
Hosta Xinê Birca Belek **avakir**.

**b-**Karên hevgirtî yên ji dû karan pêkhatîn:

**Mînak:**

Wezîrê dadê ji kar **hatxistin**.
Nameya min ji bo wî **hatbirin**.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Tiştên serpêhatî li ser wan tên avakirin çine?**
**2- Ma hûn dikarin bêy çêbûna bûyerekê serpêhatiyekê sazbikin?**
**3- Peyva di hevokê de dikare weke hevok jî bê pejirandin li kûdera hevokê tê bikaranîn?**

## Çiyayê Sîser û Jina Bi Rojê Re



Em her 8'ê Adarê bi hestên cuda dijîn. Dem, dîsa 8'ê Adarê ye, em jinên kedkar vê rojê bi bîrtînin. Di sê sed û şêst û pênc rojan de tenê rojek ji bo me jina ye û dibe kû agahiya gelek jinan jî ji vê rojê nîne. Em jî weke jin, vê rojê bibîr tînin lê em jî tam wek naveroka vê rojê jî najîn. Îro, dibe roja coş, hezkirinê lê di heman demê de dibe roja kul û êşan jî.

Jin, cîhanekî di bin desthilatdariya zilam de, di bin siya zilam de jiyanê berdewam dike û bi hestên xwe û hizrên xwe najîn. Jina ku dibêje: "Ez dijîm jî." Li gor pîvanên hişmendî û mantiqê pergalê ji xwe re cih dibîne. Ev jî nûnertiya rast a cewherê jinê nake.

Di nav jinan de yên herî bi şans, yên bi felsefeya Rêber Apo re bûne yek. Di nav PKK'ê de cuda dijî, jiyanê bi wate dike, xweşik dike û tam jê digire. Gerîlayên jin vê rojê bi hemû aliyê xwe ve, bi heskirina awazên cuda dijîn. Di nav xwezayê de, bi stranên çûk û teyran coş dibin û xwe ji bin siya zilaman dadiwerivînin, wek jin vê rojê pîroz dikin.

Sala çûyî, ji ber sedema komploya jehrîkirina ku li dij Rêbertiyê pêşxistibûn, me 8’ê Adarê pîroz nekiribû. Ne pîrozkirina me, paşverûtiya zilam û faşîzma dewleta Tirk me protesto kiribû.

Îsal jî li Garzanê, li ser lûtkeya Çiyayê Sîser bi du hevalên jin û deh hevalên xort re, em vê rojê pîroz dikin. Cara yekem e, 8’ê Adarê bi hevalek jin tenê re pîroz dikim.

Tenê yek jina ku li gel min re, ji ber ku ji xapandin û tiştên şaş re feraset nîşan dida, ji ber ku di wateya sekna jin de seknek rast nîşan ne dida, min bi rojan pê re nîşaq kir. Nêzikatiyên wê min dixe tengasiyê û di van rojên dawî de min li hember wê helwest danî bû. Min kêm pê re danûstandin dikir. Li gor wateya 8’ê Adarê min şansek da vê hevalê. Hêvîdarim ku nêzikatiyên wê dubare nekin. Rexmê ku heqeret li min kiribû, dîsa min gurura xwe avêt aliyekê. Min got: “Meznahî bila ya min be.” Ez di wê baweriyê de me ku di nav nêzikatiyên wê de li hember Tevgera Jinê û li hember jinê nêzikatiyên bi bertek hene.

Di rastiyê de ez îro ne bitenê me. Ji ber ku hest û hizrên bi hezaran jinan di dilê xwe de hîs dikim û dijîm. Biryarên ku min di vê roja girîng de ji bo xwe girtine, ezê ronahiyên berbangan hembêz bikim.

Aliyek yê min dil mayîn be jî zêde ne girîng e, ya girîng ez mirovan li gor tişta maf dikin, digirim dest. Ji mirovan re nirxên ku maf dikin ji wê zêdetir nedayîn! Ez bi bawerim ku ev biryara min girtî, wê hîn li ser bingeheke rast, min bi cewherê rêhevaltiyê re bike yek. Her wiha jiyan jî, hêviyên nîvçe mayine. Her tişt wê li gor daxwaza mirovan bibe, destûreke wiha nine. Ji ber ku diyardeyên ji derveyî te jî, jiyanê pênase dikin hene. Biryarên ku mirov bi hêz û vîna xwe digire, girîng e û ev jî pêlên deryayê ne ku wê me nêzikî azadiyê bikin.

Min îsal 8’ê Adar li ser Çiyayê Sîserê (Garzanê) pîroz kir. Em lê binêrin ka emê salek din 8'ê Adarê li kûderê pîroz bikin?

Bi daxwaza her rojek bi azadî derbaz bibe, bi heskirin bimînin rêhevalên min yên jin.

***8’Ê ADARA 2008 (GARZAN ÇIYAYÊ SÎSER)***
***Ji Duwemîn Berga Pirtûka Bîranîn a Ş. MARYA UMUT***

## PEYV

**Sîser**: Navê çiyayek li Garzanê
**Dadiwerivîn:** Parzûnkirin, daweşandin
**Felsefe:** Hezkirina zanînê
**Protesto:** Redkirin
**Komplo:** Felbazî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Cihê bikaranîna tîpên gir:**
**1-** Hevok bitîpa mezin tê destpêkirin.
**2-** Piştî hêmaya pirsê û baneşanê hevok bitîpên mezin tê destpêkirin.
**3-** Rêzikên helbestan bitîpa mezin destpê dikin.
**4-** Peyvên rêzgirtinê yên dikevin beriya nav yan piştî nav, yên weke nasnav, pîşe bitîpên mezin destpê dikin.
**5-**Nasnav bitîpên mezin tên destpê kirin.
**6-**Navên ku xizmaniyê didin diyarkirin dema li pêşiya navê kesî bê, bitîpa mezin destpê dike.
**7-** Navên taybetê ku ji tebayan re hatî dayîn bitîpa me-zin destpêdike.
**8-** Navê gel, welat, ziman û zaravan bitîpên mezin des-tpêdike
**9-** Navên olan nav û hevalnavên bi wan ve girêdayî bitî-pên mezin destpêdikin.

## PIRS

**1-**Garzan dikeve kîjan parçeyê Kurdistanê?
**2-**8'ê Adarê, bi çend hevalên jin û hevalên xort re tê pîrozkirin?
**3-**Ramana bingehîn yavê mijarê binivîsin.

## CÛR Û AWÊN

Hatibû gotin serpêhatî cûre nivîsîneke li derdora bûyerekî yan çend bûyeran pêşdikeve û encam digire.

## RÊZIMAN

**Di hevokê de cihê kar û saloxê:**

Dema di hevokê de têrkera yekser nebe, kar dikeve dawiya hevokê.

**Mînak:**

Raperînê destana Mem û Zînê **xwend.**

Dema di hevokê de têrkera yekser hatibe bikaranîn kar dikeve nava hevokê.

**Mînak:**

Gulîzar **çû** zozanan.

Di hevokên saloxî de pêveka demî yan jî ya kesî ya ku bi dawiya saloxê ve dibin û cuda tê nivîsîn û li gel saloxê, dikeve dawiya hevokên navdêrî.

**Mînak:**

Pirtûk **ciwan e**.

Şoreş **xwendekar e**.

# JIYANEK JI TÊKOŞÎNÊ DAGIRTÎ



Heval Sara, di sala 12.02.1958'an de li Mezra Tahte xelîl ya girêdayî gundê Bataman ya girêdayî navenda Dersimê ji dayîkbûye. Ş. Sara dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Dêrsimê xwendiye û qedandiye. Heval Sara ji sê xwîşk û pênc bira, li gel dayîk û bavê xwe ji malbateke deh kesî ya duwemîn e.

Heval Sara di sala 1973'an de çû gel bavê xwe yê li Berlîna Almanya yê dixebitî. Dîsa di sala 1974'an de vedigere Dêrsimê. Di vê salê de Şoreşgerên Kurdistanê nas dike û beşdarî kar û xebatê dibe. Di Gulana 1976'an de diçe Îzmîrê, li wir di kargehên (Îzmîr BENER, Kargeha çîkolata, Kargeha Tekstîl ya Alsancakê, Kargeha hêjîran a Alsancakê û hwd) cuda cuda de, hem karê rêxistinî din av karkeran de dimeşîne û hem jî dixebite. Di encama beşdarbûna kar de tê girtin û dikeve girtîgehê. Nêzîk şeş mehan di girtîgehê de dimîne. Dîsa di sala 1977'an de vedigere Kurdistanê. Li Çewlik, Dêrsim û Elezizê xebatên şoreşgerî dimeşîne. Di sala 27'ê Mijdara 1978'an de li gundê Fîsê ya girêdayî navçeya Lîcê ya Amedê, weke jina yekem di kongreya damezrandina PKK'ê de cih digire. Di Gulana 1979'an de li Elezizê tê binçavkirin û girtin. Dema di girtîgeha leşkerî de bû, sergomî girtîgeha Malatya yê dikin. Li wir firar dike (piştî rojekê ji derve dimîne, dîsa tê girtin), dîsa dibin girtîgeha Elezizê ya leşkerî.Di sala 1981'an de rê dikin girtîgeha leşkerî ya Amedê. Her wiha li hemberî hovîtiya di zîndana Amedê de dihat meşandin, li gel Hevalên Mazlûm, Xeyrî, Kemal, Ferhat û hwd. berxwedaneke bê hempa dikir. Weke jineke têkoşer û şoreşger bi duristbûna xwe hevî dida hemû girtiyan û bi taybet jî girtiyên jin. Di nav wan şert û mercên herî giran yên di girtîgehê de, karên weke perwerde, werzîş, rêxistinkirina jiyanê û pêşengtî dikir.



Heta sala 1991'an di girtîgehên (Di girtîgehên Eleziz, Amed, Amasya, Çanakkale û hwd. de maye) de dimîne. Di sala 1991'an de li ser Ewrûpayê re derbazî qada Rêbertiyê, Akademiya Mahsum Korkmaz a li Bekaa yê dibe.

Şehîd Sara piştî wê di sala 1991'an de derbazî qada gerîla herêma Heftanînê dibe. Demekî li Biryargeha Navendî dimîne. Piştî wê di rêveberiya Wargeha Şehîd Bêrîvan de cih digire. Heta di sala 1996'an li qadên Haftenîn, Zapê û hwd. dimîne. Li ser daxwaza Rêber Apo, di sala 1996'an de derbazî qada Rêbertiyê (Surye-Şamê) dibe. Di vê demê de pirtûkek bi zimanê Tirkî ya bi navê "Jiyana Min Her Tim Bi Têkoşîn Bû" dinivîse. Ev pirtûk ji dû bergan pêktê. Vê pirtûkê li ser daxwaziya Rêber APO dinivîse. Di bahara 1998'an de pirtûka xwe temam dike. Piştî ku pirtûka xwe temam dike, Rêbar Apo jê re dibêje; "Heval Sara, dawiya pirtûka xwe jî piştî şoreşê binivîse". Di heman salê de derbazî Ewrûpayê dibe. Li Ewrûpayê di rêveberiya xebatên giştî û bi taybet kar û xebatên Tevgera Azadiya Jinê dimeşîne. Di navbera salên 1999 û 2000'an de vedigere welat.

Di sala 2000'an de ji bo pêşxistina perwerdeya zarok û ciwanên Kurd hêj pitir xwe bigihîne lûtkeyeke herî jor merezek vaşartî ya Ş. Sara bû; vê mereza xwe ya hînbûyînê di wargeha Şehîd Rustem Cudî de (Mexmûr) weke pêşengek sereke rist dilîze û weke rêveberiya giştî ya dibistanên wargehê dike.

Dema vedigere welat di rêveberiya KADEK û PAJK'ê de cihê xwe digire. Di dîwana KONRA-GEL û Rêveberiya PJKK'ê de cihê xwe digire. Cardin di sala 2012'an ji bo xebatên giştî û bi taybet xebatên dîplomasiyê derbazî Ewrûpayê dibe.

Di 9'ê Çile ya sal 2013'an de ji ber xebatên wê yên giranbiha ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve li bajarê Parîsê/Fransa di encama komkujiyeke tarî de, gel dû hevalên xwe yên jin digihijin şehadetê.

## PEYV

**Sergom:** Bêxwestek ji cihekê birina ciheke din (surgun)
**Merez:** Raz, sir

## PIRS

1-Heval Sara ji kîjan bajarê Kurdistanê ye?
2- Xebatên Heval Sara kirî bi rêze ve binivîsin.
3- Heval Sara di zindana Amedê de berxwedanek çawa dikir?
4-Heval Sara çawa hat şehîd xistin? Lêkolîn bikin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Cudahiya di navbera vê mijarê û mijara derbazbûyî de çiye? Lêkolîn bikin.**
**2- Ger nivîsîn xwe nespêre pêgirên bi ewle, wê çi bibe?**
**3- Di hevokê de piştî kar, endama herî bala we dikişîne kîjan e?**

## GIRÎNGIYA XWENDINÊ




Her mirovê ku bixwaze hemû erkên mirovahiyê, pêk bîne, zana bibe, rûmetê bidestbixe, weke mirovekê hêja di nav civakê de bê dîtin û bibe xwediyê zimanekî wêjeyî, pêwîste bixwîne. Heke mirov nebe mirovek xwendevan, nikare bi awayekî tam pêşketinên mezin bi xwe re çêbike. Ji ber ku bê xwendin, gavavêtinên mezin ne pêkane (negengaze).

Ger îro em dikarîn, dîroka xwe ya bi hezarên salên derbaz bûyî bizanin, awayê çanda xwe ya kevnar fêrbibîn, awayê jiyana pêvajoyên derbazbûyî tê bigihin, dewla serê xwendinê ye. Ji ber ku gelên xwendin ji xwe re nekirine armanc, têk çûne û tinebûne. Li aliyê din dema em temaşeyî zanyar û pêşengên civakê yên weke Rêber APO dikin, dibînin ku girîngiyek mezin daye xwendin û perwerdê. Li vê rewşê wiha dibêje: "Civakbûna zarokan, bi çalekiya perwerde ya civakê re tê meşandin." Ji ber wê peyva dibêje; "Li xwendinê bigere ger li Çînê be jî." Ji

aliyê Hz. Mihemed ve hatiye bikaranîn. Di "Qurana pîroz" de jî yekemîn fermana ji mirovan re hatî dayîn peyva: "Bixwîne" ye. Ji van gotinan jî tê zanîn di hemû qadên jiyanê de pêwîstiya me bi xwendinê heye.

Heke em bixwazin bibin mirovên birûmet, pêşketî, pêşeng û zanyarek baş,pêwîst e em bixwînîn, perwerde bibin û bidin xwendin û perwerde bikin.





## PEYV

**Rûmet:**Nirx
**pêkan:** Dibe

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

We di mijara derbazbûyî de dîtibû ka tîpên mezin li kûderê tên bikaranîn, li jêr hûnê berdewamiya wan bibînin.

**17-** Navên kertan
**18-** Navên welatan
**19-** Navên herêman
**20-** Navên bajaran
**21-** Navên navçeyan
**22-** Navên gundan
**23-** Navên taxan
**24-** Navên şeqaman
**25-** Navên robaran
**26-** Navên çiyan

## PIRS

**1-**Çima gelên girîngî nedane xwendinê, tinebûne?
**2-**Lêkolîn bikin ka gotar li kûderê tê bikaranîn?
**3-**Sûdê xwendin û perwerdê ji bo civakan çi ne?

## CÛR Û AWÊN

Di beşa destpêkê ya pirtûkê de hûn têgihiştibûn ku gotar ji cûrê nivîsîna çespan û diyar e.

Niha jî didin têgihandin ku gotar neçare hişke hişk bi destûrên ziman ve girêdayî be, têgihandinek girîng dide. Di gotarê de ji bo ku ramana bingehîn bê hawêjkirin (hundirîkirin), gotina dide pêş pêgir (delîl) ên davêje holê mînakê dide, pêwîst e heta dawî vekirî bê têgihiştin û bawerkirin. Gotara xwe nespêre rastiyê, civakê ji rastiyê dûr dixe.

## RÊZIMAN

**Kirek:**

Peyva kirana karê di hevokê de digire serxwe ye.

**Mînak:**

**Kajîn** gulan komdike.
**Dilovan** melevaniyê dike.
**Ew** bi hevalên xwe re kar dike.

**Kirek her çiqas dibe kupeyv be, dibe kû birepeyv be jî.**

**Mînak:**

**Geliyê Çavreş** nameyê dinivîse.
**Sosina Mamosta** diçe dibistanê.

Di hinek cihan de dibe ku kirek weke peyv yan weke birepeyv neyê bikaranîn, ji ber ku bi pêveka kesî û demî ya ku bi dawiya kar ve tê danîn, hebûna kirekê diyardibe.

**Mînak:**

Hat**im** dibistanê.
Çû**n** çiyê.
**Çûbû** çiyê.

Dema di havokê de peyvên**“pêwîst, divê”** hebe, dibe ku kirek neyê bikaranîn.

**Mînak:**

**Pêwîste** were xwendin.
**Divê** berxwedan bê kirin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1- Ma mirov dikare bêje mijara jêr cûrenivîsînekî hizrî ya bi amadekar e? Çima?
2- Hûn çi cudahiyê di navbara axaftina hizrî ya bi amadekarî û bê amadekarî de dibînin?
3- Ma dibe ku carna em hevoka xwe ji bilî kirekê bi endamek din destpêbikin?

## PEYAMA NEWROZÊ

Gelê berxwedêr!

Îro roja cejin, vejîn, berxwedan û hilketina Gelê Kurd ya asoya herî bilinde.

Di vê rojê de, Gelê Kurd; bi berxwedana xwe ya bêhempa,gelên Rojhilata Navîn ji bin darê zordariya desthilatdaran rizgarkiriye, ji bo serxwebûna xwe dest bivekirina rûpelek nû ya dîrokê kiriye û bûye gelê herî xwedî dad. Di heman demê de ,di vê roja pîroz de bihewldanên Mazlûman ji kevneperestî û zordariya dagirkerên Kurdistanê re gotine: "Êdî Bese." Biryara berxwedana çekdariya ji bo Azadiya Gelê Kurd û Rojhilata Navîn dane. Ev berxwedana pîroz, dibin pêşengiya Rêber Apo û Şehîdan de, bi Rewşen, Egîd, Adil, Zîlan, Bêrîtan,Leyla, Xebat, Rûstem, Simko, Şîlan û Çîçekan bilind dibe.

Gelê birûmet!

Ev roja pîroz; beriya derketina Tevgera Azadiya Kurdistan ji aliyê neyarên Gelê Kurd ve weke hemû bermayên Gelê Kurd hatibû qedexekirin. Lê bi berxwedana van lehengan û we gelê welatparêz, neçar man ku vê roja binirx weke cejna Netewa Gelê Kurd bipejirînin. Lê belê ev bi awayekê asayî pêk nehat. Ji bo bidestxistina vê xelatê, xwîna gelek zarok, bav,dayîk,xwîşk û birayên we hat rijandin. Ji bo ev roj, bibe rojekî mayînde, hêvî û daxwazên pakrewanan bên pêkanîn, pêwîstî bi xebat û berxwedanek hêj birêkûpêktir heye.



Tê zanîn di pêvajoya vê berxwedana demdirêj û zehmet de,gelek îxanet û bêmafî li ser we û şoreşa me hatine pêkanîn. Hertim hat xwestin ku em dîroka xwe ya ji aliyê dijman ve hatî reşkirin,dubare bikin. Lê we bi berxwedana xwe ya salan, bê ku stûxwariyê ji tû zordaran re bikin, we, ew vala derxistin û hêviyên wan di dilê wan de hêlan.

Gelê hêja!

Em bawer in,ev berxwedana we ya binirx, dê heya gihandina mirovatiyek birûmet berdewam bike û dê bi berxwedana we gelek rojên mîna vê roja pîroz bên afirandin.

Bi vê boneyê em cejna we pîroz dikin û serkeftinên bê dawî dixwazin.

**Mûrad Karayilan**



## PEYV

**Aso:** Dûrahiya bêdawî tê dîtin
**Kevneperestî:**Parastina tiştên paşverû
**Pakrewan:**Şehîd, cangorî
**Newroz:** New=nû, roz=roj+Rojanû

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Axaftina(nûtûq), bi peyvên bangî destpêdike.Li dawiya van birepeyên bangî,baneşan tê danîn.

## TÊBINÎ

Di nûtûqan de ger lêdan li ser peyvan çênebe; hêmaya baneşanê nayê bikaranîn li cihê wê hêmaya xalbêhnok tê bikaranîn.

## PIRS

**1-**Peyva "Newroz"  tê çi wateyê?
**2-**Gelên Rojhilata Navîn çima Newrozê pîroz dikin?
**3-**Kurd çawa ji bin zordariya desthilatdaran rizgar bûn?
4-Hûn di Cejna Newrozê de çi dikin?

## CÛR Û AWÊN

Ev cûrê mijarê, di mijarek derbazbûyî de hatibû têgihandin. Dema em temaşeyî nûtûqê dikin, ji ber ku li ser tiştekê girêdayî civakê yan li ser pirsgirêkekî li benda çareseriyê ye. Ji ber wê, tê gotin nûtûq axaftineke hizrî ya bi amadekariye.

Di nûtûqê de şêwazê bêjer diyarkere. Ji ber wê xebatên diramatîzasyonê (tevgerên dest, rû, mil, çav, serî û laş) di bandorkirina vê mijarê de rolekî girîng dilîze.

Bêjerê nûtûqê,pêwîste tevgerên xwe û axaftina xwe li hev bîne.

## RÊZIMAN

**Di hevokê de cihê kirekê:**

Bi awayekî giştî kirek dikeve destpêka hevokê, ger di hevokê de peyva hevalkar hebe, dibe ku bikeve pêşiya kirekê.

**Mînak:I**

**Hogir** rojnameyê dixwîne.

**Mînak:II**

Îro **Kawa** di ezmûna ziman de serket.

Par ez û tû çûbûn seyranê.

### TÊBINÎ

*Her çiqas dema kirek bi pêveka demî tê diyarkirin, em wisa têdigihin ku hevoka me bi kar destpêkiriye, lê di rastiyê de newisane, ji ber kirek li pêşiya wê veşartiye.*

**Mînak:**

Hat**im** dibistanê.

Çû**n** gund.

Dema em dibêjîn “hatim dibistanê.” di rastiyê de herwek hatî gotin: “Ez hatim dibistanê.” tê perjirandin.

Di hevoka duwem de jî dema em dibêjin "çûn gund." di resenbûna hevokê de "Ew çûn gund."e.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Cudahiya di navbara mijara derbazbûyî û mijara jêr de lêkolîn bikin.**
**2- Dema em dabaşa Siyabend û Xecê dikin, di xiyalên we de kesên çawa derbaz dibin?**
**3- Li gor we evîndariya Xecê û Siyabend çawaye?**
**4- Em çawa di hevokê de pêkir nasdikin?**

## SIYABENDÊ SILÎVÎ Û XECÊ

Siyabend...Piştî mezin bû, dil ket Xecê, dema Xecê didin kurê Mîrê Şikaka, bi alîkariya pîrekê Siyabend Xecê direvîn e… Revand û bir serê Çiyayê Sipanê Xelat... Xecê rûnişt, Siyabend serê xwe danî ser çoka Xecê û raza... Di wê demê de birek pezkûvî li ber wan re derbaz dibin. Nêriyek, bizinê ji yên din distîne... Rewşa Xecê û Siyabend tê ber çavên Xecê û Xecê dikene, ji xwe re dibêje:

Eynî, mîna Siyabendê minê Silîvî ye.
Xwediyê tîr û kevanê zêrîne.
Haya Siyabend ji bayê felekê qet nîne.
Bizin hat ser kaniyê,
Devê xwe xist kaniyê.
Xecê li bizinê dinêre.
Nêriyê girovir, bi çavê xwe dibîne.
Çiqas ew nêrî li van deh nêriyan dixîne.
Xecê keniya û kir qêrîn e.
Siyabend bi kenê wê re,
Çavên xwe vekir ji xewa şîrîne.



Rabû serxwe dest bi kêra xwe digihîne,
Dibêje:
Te nêrî ku serê min tazî ye.
Tu bi keçeliya min dikeniye.
Ji min re bêje rastî ye.
Di dilê te de çi heye û çi nîne.
Xecê dibêje:
- Siyabend bila ez bibim bi qurbana keçeliya te.
Ji bilî muhbeta te tiştek din, di dilê min de nîne.
Bes ezê ji tere bêjime.
Min dazdeh pezkuvî îro bi çavên xwe dîne.
Yek bizin bû yazdeh heb nêrî ne.
Yekê kinikî girovir di nav van de bû.
Şaxênwî dazdeh, şaxî ne.
Li deh nêriyan xistîne.
Ji ser bizinê vedgerîne.
Kenê min hat, min got:
"Eynî mîna Siyabendê minê silîvî,
Xwediyê tîr û kevanê zêrîne."
Siyabend got:
"Xecê ez ew qasî li dinyayê geryame,
Min kesê fêris û pêhlewan weke xwe nedîne,
Tu nêriyê pezkuviya dikî weke min,
Tu bi çavê xwe bibîne.
Ew nêrî îşev li kube ezê serê wî jêbikim,
Goştê wî ji me re bikim şîve"...

Piştî digihê pezkuviyan, nêriyê girover birîndar dike, li ber serjêkirinê, nêrî şaxê xwe lêdixe, di Çiyayê Sîpanê Xelatê de, tavêje, bi serê sîxekê yê belalokê bi nîva tehtê ve dimîne...

Xecê lêdigere wî di wê rewşê de dibîne, digirî û bandike:
- Hey lo lo Siyabendo Sibat e xweş Sibate.
Berf li min û te, tê bi gulate.
Di ser tere zinarekê bilinde.

Dibin te re riya karwane.
Dibin rê de,ava Mûradê, ava bi Firate.
Siyabendo cihê min bike ez hatim ba te.
Siyabend:
-Hey lê lê mala bavê şewityê,
Xwe bikêşa gundan bigihîne.
Werîsên heft gundan li hev bicivîne.
Tu bi destê xwe, xwe bi nexweş û birîndarê mala bavê xwe re bigihîne.

Siyabendê Silîvî fêris û pehlewanê dinyayê, ji binê Sîpanê Xelatê ji ser kelemê belalokê tû derîne...

Piştî werîsên heft gundan tîne weke wî gotî çêdike, nikare Siyabend rizgar bike, xwe tavêje ser laşê Siyabend û her dû bihev re ser riya karwaniya dikevin, hîna Xecê temam nebûye... Serpêhatiya xwe ji serkarwan re dibêje û jiyana xwe ji dest dide. Karwanî jî tirba wan dikolin, navê wan ser datînin, li dora tirban darên spîndar diçînin, zincîrek bi kêla wan ve dikin, piyanek bi zincîrê ve dikin û datînîn ser kaniyê.

## PEYV

**Keya:**Muxtar
**Muhbet:**Hezkirin
**Fêris:**Mêrxas
**Pehlewan:**Leheng
**Gulat:**Di mijarê de ji libikên barîna berfê re tê gotin.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Dema em nivîsînekê, dinivîsin û dixwazin wê nivîsînê hinek kurt bikin, li gor pêwîstiyê bikar bînin, dicihê peyvên me jê rakirî de sêxal (...) tên bikaranîn. Bi vî awayî ji xwendevanên xwe re diyar dikin ku ji wî cihî hinek peyv yan hinek hevok ne hatine nivîsîn.

Di nivîsandinê de carnan tê xwestin nivîskar vekirinekê di derbarê mijarê de bike, ew vekirina ku nivîskar kirî ji ber ku ne ji resenbûna wê mijarê ye, ji nivîsandina mijarê hûrtir tê nivîsîn.

## PIRS

**1-**Lehengên destanê kî ne?
**2-**Çima Xecê xwe ji Çiyayê Sîpanê Xelatê avêt?
**3-**Ramana bingehîn a destanê çî ye?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsînên bûyerekê yan çend bûyeran digire dest, tê de çend leheng heyî, di nav civakê de şopek kûr hêlayî û di bin bandoriya qafiyê mayî de **destan** tê gotin.

Me gotibû nivîsînên me bi awayê pexşan û hûnandî dibin dû beş. Lê di destanan de ger nivîsîn di bin bandora qafiyê de jî be tamam e.

Di destanê de dibe ku carna nivîsîna pexşan carna jî di bin bandora qafiyê de be. Ger hemû pexşan be, taybetmendiya xwe ya destanî winda dike.

## RÊZIMAN

Bêguman yek ji endamên hevokê yê sereke pêkir e.Ji peyva ji kirina karê kirekê bandor dibe, dibêjin **pêkir**.

**Mînak:**

Min **genim** çand.

Tû **bostan** avdidî.

Dema em temaşeyî van hevokan dikin, dibînin ku peyvên reştir hatine nivîsîn ji kirina karê kirekê raste rast bandorbûne. Ji ber wê em ji wan re dibêjîn pêkir.


## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî destanêkê peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.
**2-**Pêkirên di hevokên jêr de diyar bikin?
Wan rojname xwend.
Zarokan hêdî hêdî gul çandin.
Sivorî gozê dixwe.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Bi xwendina vê helbestê re hestekê çawa bi we re pêşdikeve?**
**2- Ma mirov dikare vê mijarê ji mijara derbazbûyî (destanê) cuda bigire dest?**

# XORTÊ KURDAN



Xortê me Kurmanca werî,
Da em herin ceng û şerî,
Dijmin ji me qet na qerî,
Talan kirin mal û serî.

Ta kengî em bibne xewar,
Rabin ji xew bibne şiyar,
Va dijmine hate diyar,
Bes bikin kîn û berberî.



Bitûnê tor û deşt û bax,
Berzan û mêrg û av û şax,
Tev dil kulû dil xwîn û dax,
Mane di destê yênçerî.

Xortê Kurdan hey hûn werîn,
Ber dijminan deynin kemîn,
Ber dijminan deynin kemîn,
Da bikin par û sed kerî.

***Hezîn Kurdî***

## PEYV

**Xewar:**Kesê herdem çav li xew
**Diyar:**Eşkere
**Berberî:**Dijîtî
**Tor:** cihê hişk, bê av. ( navê herêmekê ye)
**Bitûnê:** Giştî, teva
**Bax:**Baxçe
**Berzan:**Çîmen
**Şax:**Çiya
**Dax:**Daxdan
**Par:**Parçe
**Kerî:**Bir

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Erkê malika di helbestê de weke erkê hevokê di pexşanê de ye. Ji ber wê em neçarîn di dawiya malikên helbestê de xalê bikar bînin û li ser rêzikan jî bêhnokê danîn.

## PIRS

**1-**Nivîskar kîjan aliyê Kurdan rexne dike?
**2-** Daxwaza nivîskar ji ciwanên Kurd çiye?
**3-** Li gor we hozanvan evîndarê çiye?

## CÛR Û AWÊN

Ji nivîsînên hûnandî yên ku hestên welatparêzî dikin armanca xwe **helbestên** epîkin.

Ev cûre helbest ji ber kur bûyerên dîrokî bi vegotinekî xurûş tînê ziman; di heman demê de ji van helbestan re helbestên destanî yan jî lehengî jî tê gotin.

Qafiyên vê helbestê, di hinek malikan de tam û di hinek malikan de jî qafiya dewlemend hatiye bikaranîn.

## RÊZIMAN

**Têrker:**

Di hevokan de peyvên navên cih didin diyarkirin, peyvên hevalkar û navên bi alîkariya daçekan dibin cihê kirina kar, ji ber ku wateya hevokê têr dikin, ji wan re **têrker** tê gotin.

**Mînak:**

Ew çû **dibistanê**.
Mamosta **îro** hatin.
Wan **di refê de** name nivîsîn.

Di hevokên jor de peyvên reş hatîn nivîsîn têrker in.

Têrker di nav xwe de dibe sê beş:

**1-**Têrkerê yekser
**2-**Têrkerê hevalkar
**3-**Têrkerê cihî

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî helbestekê li ser welatparêziyê peyda bikin û di refê de bixwînin.
**2-**Dû hevokên ku têrker têde hatî bikaranîn binivîsin.

# TEST 3

**AXAFTIN**

Kesê baş perwerde dîtî, zimanê wan yê axaftinê xweşe. Perwerda baş, di temenê biçûk de, ji malbat yan ji dibistanê divê bigire. Weke fêrbûnek xirab di temenê mezin de sererastkirina ziman zor e.

Di roja me de taybetmendiya herî baş, axaftina rast û xweşe. Ji ber wê qurs tên vekirin û gelek mirov ji bo şaşiyên xwe yên axaftinê rakin, tevlî van qursan dibin û di van qursan de perwerdê dibînin. Di serî de rêveber û mirovên kar, kesên dixwazin di karên xwe de serkeftîbin, dikin armanc ku zimanê xwe baş bikar bînin.Di axaftin û nivîsînê de hewl didin ku zimanê wan bigihin pileyek bijartî. Di vê riyê de hewldanan zêde dikin. Ji bo bi bandor, xweş, rast û durust baxivin.

**(Her sê pirsên destpêkê li gor mijarê bersiv bidin.)**

**1- Axaftina xweş encama çiye?**

**A)**Encama xebatek başe.
**B)** Encama perwerdeyek başe.
**C)** Encama rêzdariyek başe.
**D)** Encama bi pîvanbûnek başe.
**E)** Encama hizrek başe.

**2- Di roja me de taybetmendiya herî baş çiye?**

**A)**Zanîne.
**B)** Mêrxasî ye.
**C)** Axaftina rast û xweşe.
**D)** Mal peydakirin û dayîne.
**E)** Têkiliyên di navbera mirovan de ye.

**3- Ji bo bi bandor, xweş, rast û durst baxivin, karmend çi dikin?**

**A)** Armanca wan, zimanê xweşû baş bikaranîne.
**B)** Dikin armanc bazirganiya xwe zêdebikin.
**C)**Xwe zana bikin.
**D)** Siyasetê bikin.
**E)**Hewl didin bi zimanê biyanî baxivin.

**4- Ji nivîsînên ji bo daxwaza kesan, gazindên wan yan jî rewşekê ji cihê peywendîdar re radigihîne re çi tê gotin.**

**A)** Nameya taybet,
**B)** Daxwazname,
**D)** Nameya wêjeyî
**C)** Vexwendiname
**E)** Telegraf

**5- Di navbera jimarên têkîliyên wan bi hevdû re heyî, kîjan hêma tê danîn?**

**A)** Xal
**B)** Xêzika axaftinê
**C)** Xalbêhnok
**D)** Baneşan
**E)** Xêzika xwar

**6- Peyvênku bi serê xwe wate nadin lê dema dikevin gel navan watedar dibin jê re çi tê gotin?**

**A)**Nav
**B)** Hevalnav
**C)** Alav
**D)** Hevalkar
**E)** Kar

**7- Ji wan rêzikên tên gel hev û wateyekê bi hev re tekuz dikin re çi dibêjîn?**

**A)** Hevok
**B)** Bend
**C)**Mijar
**D)** Malik
**E)** Rêzik

**8- Endama herî bingehîn ya hevoka karî ya ku bi serê xwe jî dikare bibe hevok kîjane?**

**A)** Kirek
**B)** Kar
**C)** Pêkir
**D)** Têrkera cihî
**E)** Têrker

**9- Nameyên tu ji bo heval, dost, xizim û hezkiriyek yê xwe re rê dikin, kîjan cûrê namê ye?**
**A)** Nameya kare.
**B)** Nameya wêjeyî ye.
**C)** Nameya taybete.
**D)** Daxwazname ye.
**E)** Vexwendiname ye.

**10- Kar li gor çêbûna xwe dibe çend beş?**
**A)** 2
**B)** 3
**C)** 4
**D)** 5
**E)** 6

**11- Peyva di hevokê de kirina kar pêktîne re çi tê gotin?**
**A)** Pêkir
**B)** Kar
**C)** Jêder
**C)** Têrker
**E)** Kirek

**12- Ji nivîsînên bûyerekê yan çend bûyeran digire dest, tê de çend leheng heyî û dibin bandora qafiyê de mayîn re çi tê gotin?**
**A)** Roman
**B)** Serpêhatî
**C)** Destan
**D)**Nûtûq
**E)** Çîrok

**13- Nivîsînên dirêj yên ku bûyerekê yan gelek bûyeran bi hev re radigihîne û di nav wê de gelek leheng heyî re çi têgotin?**
**A)**Nivîsînên ramanî
**B)** Nûtûq
**C)** Taqîkirin
**D)** Civat
**E)** Roman

# BEŞA 4

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Cudahiya di navbera nivîsînên rojane û bîranînê de çiye? Lêkolîn bikin.**
**2- Ma mirov dikare di nivîsînên rojane de her tişta jiyankirî binivîse?**
**3- Hûn dikarin bûyerek ya xwe ya rojane binivîsin?**

## TÊHNBÛN

**24.04.1994**

Sibeye, em li serzinarekî bilind li derdora xwe dinêrîn, hinek mirov li Mila Guriya, biser girê li hember me dikevin. Min xwe xistiye nav çend beran û temaşeyî wan dikim.


Carekî, ji nişkave tirimbêlek leşkerî ji cihê leşkerî derket. Destpêkê min baş nas nekir, ji ber hêj cîhan ronî ne bûbû, tarî bû. Lê min guman dikir ku leşkerî ye, ji ber ku ji baregeha leşkerî derket. Jixwe gumanên min li ser van mirovên biser Milê jî diketin hebû. Carna min digot: “Ev darvanên gundiyane" û carnan jî min digot;: "Leşker in." Bihatina tirimpêlê re êdî ew jî zelalbû. Bi zelalbûna rewşê re, bi min re xurûşek pêş ket. Li aliyekê temaşeyî wan dikim, li aliyê din li ser serê min re lîstina çend bizinên kovî, xiyalên min tevlî hev dikirin.

Nizanim, ev bizin her wekî tiştna pêdihesin. Li nêzîkî min bê ku ji min birevin dilîstin. Di nav vê gengeşiyê de, dixwazim her sê hevalên xwe yên razayî ji xewê rakim. Ji ber wê ez radibim û bi awayekî lezgîn qesta hevalên xwe dikim. Nêzîkî wan bûm; min got: “Heval” bi dengê min re derdor dibin dengê çekan de ma.



Hevalên di xew de, di nav wî dengî de rabûn; bi rabûna wan re,nan û ava ku me ji bo xwe anî, ji ber veciniîqîna hevalê me, di zinarê bilind de ketin xwar. Êdî em bê av û xwarin man. Roj jî derdikeve.Germahiya tava wê rojê, mirov nikare ji bîr bike. Li milekê germî, li milê din bêhna barûtê, li milê din jî nexweşbûna cihê me, demjmêrek qasî rojekê dirêj dibe. Ji ber jêra me zinarên bilind,li pişt me kaşek weke neynikê li ber çavên neyara ye, yanî tevgereke biçûk dibe ku bibe sedemê şahadetê. Belê, êdî ji derveyî dengê çekan tiştek nayê bihîstin, bizinên me yên ciwan jî êdî xwe veşartine. Di binê newalê de serfirandina dara, xurûşek cuda çêdike.

Vê rewşê heya demjimêr dûyê domand, tişta herî zor me dikişand,têhnbûn bû, ax! Têhnbûnî...



## PEYV

**Tirimbêl:** Wesayît
**Baregeh:** Wargeha leşkerî
**Gengeşe:** Tevil hevî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Peyvên jêr bi awayekî rast, berhev bikin ji wan palvedariya navan yan jî raveka hevalnavan yan jî navên hevgirtî çêbikin û veqetandekên di navbera wan de nehatîn bikaranîn, bikarbînin.

| | |
|---|---|
| Gul | hinar |
| Dar | sor |
| Av | şîrîn |
| Derya | pehn |
| Masî | spî |
| Ber | aş |

## PIRS

**1-** Bi xwendina mijarê re rewşek çawa tê ber çavê we?
**2-** Çima nivîskar bê av ma?
**3-** Lîstina bizinên kovî çima xiyalên nivîskar tevil hev dike?

## CÛR Û AWÊN

Nivîsînên rojane dişibin bîranînan. Tişta nivîsîna rojane ji bîranîna cuda dike, di rojaneyê de, diyarkirina dîroka rojê ye. Nivîsînên rojane, ne ji bo weşandinên rojane tên nivîsîn. Nivîskarên, nivîsînên rojane her roj her tişta dixwaze dinivîse.

## RÊZIMAN

**1-Têrkera yekser:**

Têrkera yekser, ji navên cihî pêktê û yekser cihê kar dide diyarkirin.

**Mînak:**

Ez diçim **geştê**.
Dilovan çû **Qendîl**.

**2-Têrkera hevalkar:**

Ev têrker, ji peyvên hevalkaran çêdibin û di binçînekirinê de dibin têrkera hevalkarî.

**Mînak:**

Wê **îro** pirtûk xwend.
Ew **bilez** diçe.
Ew **jor** razaye.
Wê kar **pir** kir.
Ew **çawa** diçe?

**3-Têrkerên cihî:**

Ev têrker, nav in lê bi alîkariya daçekan dibin cihê kirina kar.

**Mînak:**

Wî **li deştê** genim çand.
Ew **di mal de** rûnişt.

## HÎNDARÎ

**1**-Hûn jî rojane yên xwe binivîsin û ji hevalên xwe re bixwînin.

**2-**Têrkerên hevokên jêr diyar bikin?

Em par di refa yek de bûn.
Gava din hevalên me çûn.
Ew çû Efrînê.

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

**1- Cudahiya nivîsîna şano ji yên din çiye?**
**2- Hûn dizanin nivîsînên bi vî awayî ji bo çi tên nivîsîn?**

## DERWÊŞ Û EDÛL

**D/1**

**Temer axa:**

-Kuro...! Qehwê bîne...

-Nebêjin ev qehweyek erzan e! Ev qehwe, qehweyek bixwîn e!

-Begno! Axano! Ev name, nameya desthilatdarên Ereban e. Bihîstine ku Êzîdî ji me xeyidî ne. Dixwazin ji vî keysê (firset) sûd bigirin û nav û namûsa Mîrîtiya Milan li bin lingan bixin.



- Heke, pêşî li deshilatdarên Erebên pêxwas, daw dirêj û li Tirkên desthilatdar yên teres neyê girtin; wê tevayî mîrîtiya me talan bikin û yê dest bavêjin erz û namûsa me.

Kî, ji we, vê qehwê rake, singa xwe li hember Tirk û Erebên dijmin bixe çeper û sax vegerê, ez ê keça xwe Edûlê bidim wî! Li nêzîkî qesra xwe ez ê jê re qesrek ji ya xwe bilindtir û mezintir çêkim.

-Ey axa, beg, mêrxwas û lehengên êl û eşîra Milan; ger ku we hemûyan ji dil, li ser keça min heye lê ji tirsa mirinê hûn newêrin qehwa dabaşa gotinê rakin û bibin xwedîyê wê. Wê demê, ez neçar im ji Eşîra Şerqê alîkarî bixwazim. Hûn hemû baş dizanin, ew Êzîdîne û em misilman in. Lê divê ev rastî neyê piştguhkirin; ew eşîrek mêrxwas û wêrek in, bê tirs yê qehwê rakin û Edûla bisk qemer ji xwe re bibin.

-Ez dubare dikim; mêrxwasek qehwê rake nîne!

**Berces Axa:**

-Mîrê min, wileh we, bileh we semawileh, bi her neh telaqê bê fito, fito ne li erd ne jî li ezman lê dikeve; ne bêje qey ditirsin.

-Êzîdîbûna, Tîyarî, Botanî an jî eşîrek din ya Kurdanbûya, ez bi her neh kurê xwe ve amedebûn ku serê wan kafiran jêkim. Lê ezbenî, barê Romê giran e û roviyên pêxasan jî dirêje. Em riya xwe bi wan re nabînin, ezbenî!

**Temer Axa:**

-Ez fêhm dikim, Berces Axa, ez fêhm dikim. Ev nexweşiya me Kurdan e; em ji hev re şêr û piling in, ji xelkê re jî kîso û pisîk in!

-Kuro... delêl, were vêderê!

**Qazid:**

-Kerem bike, mîrê min..

**Temer Axa:**

-Here vê namê bide Evdoyê Begê Şerqê û zû bersîva wê ji min re bîne. Bi lez....

**Qazid:**

-Ser serê xwe ezbenî.

**D/2**

**Rihan:**

-Xatûna min, bavê te qazid rêkir nav Eşîra Şerqê û alîkarî ji wan xwest!

**Edûl:**

-Dilxwede mêrxasin! Di nav ewqas mêrxwasan de, bi qasê qehwê rake, mêranî bi kesî re nemaye ku xeberê rêdikin ji Şerqiyan re?

**Rihan:**

-Derwêş wek mirîşkek serjêkirî diperpit e. Ji evîna te serxweş e ew. Qet guman nîne, wê were bêtirs û bêxov qehwa bixwîn, vexwe û di şerê li hember Tirkên hov û Erebên pêxas de were kuştin!

**Edûl:**

-Êêê... baş e Rihan, ez çibikim? Şîretekî li min bike.

**Rihan:**

-Here destûrê ji bavê xwe bixwaze û sêniya qehwê li nav civatê tu bigerîne! Li hember spehîtiya te xwe zevt nakin. Mîsoger, yekî wêrek dê qehwa bixwîn rake!

**Edûl:**

-Gelo bavê minê destûr bide?

**Rihan:**

-Ew pir ji te hezdike û niha pir neçar e. Heke tû bi zimanekî bibandor karbînî, ez bawer im ku yê pêşniyara te, bidilşadî bipejrîne. Zû leza xwe bike, wextê te pir kêm e!

**Dayîk:**

-Ax! Ax! Keça min; ez bitirsim ku nav û namûsa Kurdan di bin lingê dijminan de bêstar bimîne!

**Edûl:**

-Ez sipasiya te dikim Rihan. Di rastiyê de tû ne xadim, şêwirmenda min î. Bila, ez ê biceribîn im, dibe ku namûs li yekî bijene…

## PEYV

**Ezîdî:** Ezdayî, Navê baweriya olê Zerdeştî
**Mîrîtiya Milan:** Navê eşîrek Kurdan yê herêma Rihayê
**Pêxwas:** Bê pêlav
**Dawdirêj:** Kirasên zilam li xwe dikin
**Keys:** Firsed
**Şerq:** Rojhilat
**Mêrxwas:**Egîd, leheng
**Dabaş:** Dikar
**Tîyarê:** Herêmek ya Colemêrgêye û kesên têde dijîn jêre dibêjin Tiyarî
**Semawilleh:** Peyvek a sondê ye
**Perpit:** Gevizîna erdê ya ne li ser hişê xwe
**Star:** Hem wateya parastinê hem wateya nixumandinê tê bikaranîn
**Şêwirmend:** Şîretkar
**Jenîn:** Lêdan

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Kevanok ( ) hêmayeke nivîsînên dibin vekirina nivîsînên ji berya xwe di nav wê de tên danîn.

**Mînak:**

KCK (Koma Civakên Kurdistan)

Dema em mînaka jêr temaşe dikin, bi vî rengî em têdigihîn ku nivîsîna di nav kevanokê de tê danîn ger em ji nav nivîsîna xwe derxin jî bandorê li wateya bingihîn a hevokê nake.

**Mînak:**

Xwendekar (Serfiraz, Çekdar, Hêlîn, Heliz û...) bi hev re dixebitin.

## PIRS

**1-**Hêzên êrîşî gelê Kurd dikin kîjan in?
**2-**Şêwirmenda Edûlê kî ye?
**3-**Çima Temer Axa neçar dimîne ji şerqê alîkarî dixwaze?

## CÛR Û AWÊN

*Ji wan nivîsîn û berhemên bi mebesta li ser dikê bên lîstin, hatîn amadekirin re* ***şano*** *tê gotin.*

Her şano li ser senaryokê tê avakirin.

Sê beşên bingehîn yê şanoyê hene:

**a-**Şanoyên pêkenok (komedî)
**b-**Şanoyên xemginî (trajî)
**c-**Şanoyên ken û xemgîn (dram)

Dû hêmanên bingehîn ên şanoyê hene, dîtin û bihîstin. Peyv, helwest û tevger jî wan temam dike.

## RÊZIMAN

**Hevokên navdêrî:**

**Ew hevokên ku rewşa navekê weke nûçeyekê radigihînin re hevokên navdêrî tê gotin.**

**Endamên hevokên navdêrî weke endamên hevoka karî nayên destgirtin.**

**Endamên hevokên navdêrî li gel têrkerê dibin sê beş:**

**a-Salox(pêveber):**

**Di hevokên navdêrî de salox endama bingehîn e. Hevok li ser saloxê tê sazkirin.**

**Di hevokê de peyvên navdêrî yên ku pêveka kes yan jî pêveka demê standî û rewşekî weke nûçeyekî dayîn diyardikin re salox tê gotin.**

**Mînak:**

**Ew Amedî bû.**

**Ew jîr e.**

**Waneya me îro ye.**

**Ew rewşenbîr in.**

**b-Destpêk:**

**Di hevokên navdêrî de peyva ku saloxê rêve dibe û pêşwazî dike re destpêk tê gotin.**

**Mînak:**

Îro **cîhan** germ e.

**Gul** xweşik in.

**c-Têrker:**

**Di hevokên navdêrî de ew peyvên ku dem, cih, rewş û çendiya (qasî) saloxê dayîn diyarkirin re têrker tê gotin.**

**Mînak:**

Ew **pir** jîr in.

Azad **par** xwendekar bû.

Ew deşt **gelek** fireh bû.

Ev dar **hinek** giran e.

## HÎNDARÎ

**1-**Di temaşekirina şanoyan de hestek çawa bi we re çêdibe? Şîrove bikin.

**2-**Hûn jî endamên jêr di nav hevokê de bikarbînin.

**Salox, destpêk, têrker**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-We jînameya Rêber Apo xwendiye?
2-Hûn çend taybetmendiyên Rêber Apo dizanin?

## JÎNAMA RÊBER APO



Rêber Apo **di 4**’ê **Nîsana sala 1949**’an de li gundê Amara ya girêdayî navçeya Xelfetî/Rihayê,di malbatekî asayî de ji dayîk bûye. Navê bavê wî Emer, navê dayîka wî jî Ûveyş e. Malbata Rêber Apo ji heşt kesan pêk tê. Sê xwîşk û dû birayên Rêber hene.

Rêber Apo, xwendina xwe ya seretayî, li Cibînê destpêkiriye û qedandiye. Wê demê jî Rêbertî; ji zarokan re Rêberî dikir, zarok kom dikirin û dibirin çolê. Bi hev re çûk digirtin û çûkên girtîn, li wan belav dikirin. Li hemberê zarokên nehedirî jî xwediyê seknekî bû. Mamosteyê wî **Ferhat TURGA** ji ber jîrbûn û zîrekiya wî gelek jê hez dikir û ji bo xwendina xwe berdewam bike hewl dida. Piştî dibistana seretayî qedand, li Nîzîpê li mala xalê xwe dest bi dibistana navîn kir û li wê derê dibistana navîn bidawî dike. Bavê wî ji ber rewşa hejariyê nedixwest dibistanê berdewam bike. Lê dîsa li ser xwesteka mamosteyên wî, tevlî ezmûna Tapû Qadastro dibe û di nav **20 hezar** xwendevanên tevlî ezmûnê bûyîn de, Rêbertî di rêza **18**'mîn de ezmûnê serkeftî derbaz dike. Piştî qedandina dibistana Tapû Qadastro, li Amedê dest bikarmendiyê dike. Piştre tevlî ezmûnên zanko dibe. Di sala **1970**’an de Zankoya Dadê ya li Stenbolê qezenç dike û li wê derê hem dixwîne hem jî karmendiya xwe berdewam dike.

Di sala **1971**’ande dîsa tevlî ezmûnên zanko dibe. Vê carê Fakulteya Zanistên Ramyarî ya li Enqerê qezenc dike. Li wê derê dû salan xwendina xwe berdewam dike. Di wê demê de têkîliyên xwe bi tevgerên çepgir re çêdike.

Di yekemîn salvegera şahadeta **Mahîr ÇAYAN** û hevalên wî de **(1972)** ji ber ku Rêber Apo pêşengiya xwepêşandana protestoyî dike, tê giritin û 7 mehan di girtîgeha Mamak ya girêdayî Enqerê de dimîne. Di zindanê de digihe wê baweriyê ku bi rêbaza riya wan çepgiran, wê tiştek neyê bidestxistin û biryara sazûmankirina rêxistinek nû digire.Piştî ji zindanê derdikeve, di sala **1973**’an de dest bi xebatên vê rêxistinê dike.

Rêber APO di dilê xwe de mirov perweriyek mezin; vîna gel, vîna welat dihilgire.

Debara wî li hember zordarî û sitemkariyê tine bû. Wî gelek ji gelê xwe û mirovahiyê hez dikir. Ji ber Kurdbûna xwe pir serbilind bû. Ti cara karkirina ji bo gelê xwe bes ne didît, hêj zêdetir dixwest karbike.Wî dixwest nakokiyên di nav gel de bên çareserkirin, bi taybet nêzîkbûnên beramberî jinê, yên kevneperestî werin derbazkirin û sererastkirin. Gotinên wî yên heskirina jiyanê,heskirina wî ya li hemberî mirov, gel û welat baş dide diyarkirin.

"Mirovên bindest û bêvîn nayên hezkirin. Azadiya jinê, azadiya civakê ye"

Bi vê boneyê bi çend xwendevanên zanko yên Kurd û Tirk re biryara damezrandina rêxistinekê tê dayîn. Ev civîna destpêkê di sala **1973**’an de li Bendava Çûbûqa Enqerê pêk tê.

Ji bo pêşxistina xebatên şoreşgerî û lêkolênkirina rewşa gelê Kurd, Rêber Apo di sala **1977**’an de ber bi bajarên Kurdistanê ve gerekê pêk tîne. Di dawiya vê gerê de yek ji Rêberên komê, hevalê **Hakî KARER di 18**’ê **Gulana 1977**’an de li **Dîlok**ê ji aliyê Stêrka Sor ya girêdayî dewletêve tê şehîd xistin. Hevalê Hakî di nav rêxsitinê de kesayetiyekî girîng bû. Rêber Apo ji bo bîranîna şahadeta Havalê **Hakî KARER** biryara damezrandina partiyê dide û xebatên partîbûnê dide destpêkirin. Ji ber vê sedemê **di 27’ê Mijdara 1978**’an de, li gundê **Fîsê** girêdayî navçeya **Lîce** ya **Amed**ê **Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) ê** dide damezrandin.

Bi sedan pirtûk li ser kesayet, azadî, azadiya jinê, malbat, têkîlî û civakî… nivîsîne. Heya piştî dîl girtina xwe, di zindanê de jî pirtûkên binavê “Komara Demokratîk, Ji Dewlata Sumer a Rahîb Ber Bi Şaristaniya Demoqratîk Ve, Parastina Atîna, Parastina Riha, Parastina Gelekî, Manîfestoya Civaka Demokratîk ya (5 bergî)" nivîsandiye. Yanî ti caran û dibin ti mercan de xebata xwe ya ji bo mirovahiyê nedaye rawestandin.

## PEYV

**Asayî:**Normal
**Hejarî:**Feqîrî
**Tapû Qadastro:**Saziya sazûmankirina erdan
**Karmendî:**Xwedî kar
**Ramyarî:**Siyasî
**Vîn:**Îrade
**Sitemkarî:**Dagirkerî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Di zimanê Kurdî de dema palvedariya navan yan raveka hevalnavan dibin navek hevgirtî û veqetandek ji navbera wan radibe, gelek caran ev dibe sedem dû tîpên dengdar li rastî hev werin. Carna ji bo xweş bi-karanîna peyvê tîpa alîkar ya “**e**” di navbera wan de tê danîn.

**Mînak:**

Dara sor = Sor**e**dar
Tevna pîrê = Tevn**e**pîr

Carna ji ber vê sedemê dû tîpên ji hev, rastî hev tên, ji wan yek dikeve, yek dimîne.

**Mînak:**

Name ya jiyanê= Jînname + Jîname tê bikaranîn.

## PIRS

**1-**Rêber Apo kengî biryara damezrandina rêxistinekî nû da?
**2-**Çi bû egera damezrandina PKK’ê?
**3-**Rêber Apo çima hat girtin?

## CÛR Û AWÊN

We danasîna jînamê di waneyek derbazbûyî de dîtibû.

**Plana jînamê eve:**

**1-** Dîroka dayîkbûnê,
**2-** Cihê dayîkbûnê,
**3-** Rewşa têde mezinbûyî,
**4-** Çawa hatiye mezinkirin,
**5-** Erkê wî/ê,
**6-** Taybetmendiyên wî/ê,
**7-** Xebatên wî/ê,
**8-** Çi bandor kiriye,
**9-** Girêdayî kîjan beşê wêjeyê ye,
**10-** Ger miribe, dîrok û cihê mirinê,
**11-** Piştî mirinê nivîsînên ser hatîn nivîsîn,
**12-** Ger hebe wêne, nivîsînek ya destê wî, tên nivîsin.

## RÊZIMAN

Endamên ji derveyî hevokê, ji peyvên bangî û birepeyvên bangî pêk tên. Her wiha hinek endamên ji derveyî hevokê hene.

**Mînak:**

**Şêro**! Were em herin dibistanê.
**Wa Dîlber**! Cîhan çiqas germe.

Weke ji hevokên jor tê zanîn, peyvên bangî, peyvên pêvekên bangî standî û birepeyvên bangî nabin edamên hevokê. Hebûn û nebûna wan, bandorekê li wateya hevokê nake.

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî jînameya pakrewanekî binivîsin.
**2-**Hevokeke saz bikin, bila endamek yan endamên ji derveyî hevokê pê re hebin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Di aliyê hişyarkirina hestên mirovan de cudabûnek çawa di navbera hûnandî û pexşan de tê dîtin?**
**2- Hûn dizanin ji bo çêkirina helbestekê planek çawa tê çêkirin?**
**3- Hevok bi çi awayî tên holê?**

# DÎLBEREK MIN DÎT BIÇAVAN



Dîlberek min dît biçavan,
Agirê berda hinavan.

Şem û rohniya zulamê,
Zulfû xalên te temamê.

Şerbeta şîrîn kelamê,
Sed şikir îro selamê.

Şerh û teqrîra Îslamê,
Reng û elwanê dicamê.

Min qebûle hikmê rindan,
Lê çi bêjin qewl û bendan.

Zehmetek wan pir bi min dan,
Dil hedef kir, tîr li min dan.

Bê edet cewher bi min dan,
Xemzeyê pir mekr û fendan.

Lê li min berda girînê,
Bê sebeb ketme nivînê.

Lê ji ber husna şîrînê,
Kanî hurya serzemînê.

Ew bixwe halim bibînê,
Zulf û xalê xem revînê.




Zulf û xal û mest û naze,
Gerdenê, gerden firaze.

Cerd dikim, ehlê mecaze,
Xef dibin estar û raze.

Ez çi kim sewm û nemaze,
Min di dest tembûr û saze.

Dil ebîr û nest û mîrê,
Da li min derbek bitîrê.

Kirme heba zemherîrê,
Kanê Melayê Cizîrê.

Ka Xanî Şêxê beşerê,
Baba Tah'r,  Elî Herîrê.

Şev dikim nalîn û zarî,
Ey Siyapûş tû xumarî.

Çend Siyapûş tû sitarî,
Dir û yaqûd û mirarî.

Hespê şahê şahsiwarî,
Ji işqê tû bi eh û zarî.

***Siyapoş***

## PEYV

**Şem:**Roj
**Zulamt:** Tarîtî
**Zulf:**Bisk
**Kelam:**Gotin
**Şerh:**Şîrovekirin
**Teqrîr:**Biryar
**Elwan:**Koma rengan
**Xemzê:**Navê evîndara nivîskar
**Husna:**Xweşikbûn
**Mest:** Serxweş
**Firaz:**Bilind
**Cerd:** Tor avêtin
**Mecaz:**Xaze
**Estar:**Tişta herî hatî sitirandin
**Raze:** Sir, xef, merez
**Sewm:**Rojî
**Nemaz:**Nimêj
**Ebîr:** Debar
**Nest:** Hest
**Heb:**Yek
**Zemherîr:**Navê beşek yê dojehê
**Beşer:**Mirov
**Xumarî:**Çav li xew
**Mirarî:**Micewher
**Şahsiwar:**Şahê siwar

## PIRS

**1-**Ev helbest ya kîjan hozanvanî ye?
**2-** Helbesta me ji çend malikan pêkhatiye?
**3-** Helbestvan xwe mînandiye kê?

## EM HELBESTVANÊ XWE NAS BIKÎN

Siyapûş wêjevanekî navdar ê Kurdê Rojhilatê Kurdistanê ye. Deryayekî kûre di helbest û çanda Kurdî de. Siyapûş gelek berhemên bi nirx yên wek helbest di diwana xwe de nivîsiye, jan û taybetmendiyên gelên Kurd bi awayek mecaz lorandiye û bitaybet pirtûkek bi navê **Seyfîmilûk** nivîsandiye. Dîroka dayîkbûna xwe bi ebcedê wiha dibêje: "Bi avzêrê nivîsî xetê kufil temam ebced ji yekita û lûfl mae'llim, dabî destê wan, lewhê sînin. Bi carekê elîf û bê kirin telqîn." Yanî be hesabê ebcedê 1205'ê Hîcrîji dayîk bûye. Her wiha dabaşa Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî kiriye.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Valahiyên di rêzikên jêr de dagirin:**

Dîlberek min dît ……,
Agirê …… hinavan.

…… .. rohniya zulamê,
Zulfû xalên …. ……..

……. …….. kelamê,
Sed ….. ….. selamê.

Temaşeyî helbestê bikin û redîfên di helbestê de hatîn bikaranîn diyar bikin.

## CÛR Û AWÊN

Ev helbest ji ber ku tê de hem hestiyarî, hem sembol heye ji ber wê çendê helbestek hem lîrîk e, hem sembolîk e.

Qafiya vê helbestê tam e û li dawiya her rêzikên helbestê jî redîf hatiye bikaranînin.

Di waneyên derbazbûyî de qafiye wek çar beşan hatibû diyarkirin. Yek ji wan qafiya lewaz e.

Qafiya lewaz, ji wekheviya tîpeke dengdar ya li dawiya rêzikên helbestan tê dubarekirin re **qafiya lewaz** tê gotin.

**Mînak:**

Wek bibil ez işqê gul nalîn me tên xweş ji di**l**
Işqê hebîbê ez kirme zilzerd rû zeîf wek hila**l**
Siyapûş

Qafiya hevdeng jî yek ji van e.

Qafiya hevdeng (cînas): Dema li dawiya rêzikên helbestan ji bo ahengiyê peyvek hevdeng û wateyên wan cuda re **qafiya hevdeng** tê gotin.

**Mînak:**

Ferdên ku di riya azadiyê de navêjin ti **gavan.**
Bêguman dê tim û daîm ji serdestan re bibin **gavan.**

**RÊZIMAN**

**1- Hevok li gor kar û rewşê dibe dû beş:**

**a- Hevokên Karî:**

Ew hevokên ku kar têde heyî jê re **hevokên karî** tê gotin.

**Mînak:**

Wî dar çandin.
Kirek pêkir kar

**b- Hevokên navdêrî:**

Ew hevokên ku rewşa navekê weke nûçeyekê radigînin re **hevokên navdêrî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew başe.
Destpêk salox
Ev zanaye.
Destpêk salox

## HÎNDARÎ

**1-**Hûn jî helbestek lîrîk peyda bikin û li lênûsa xwe binivîsin.
**2-**Nivîsana bi nîgar ya jêr hatî nivîsin li lênûsa xwe binivîsin.


Kirme heba zemherîrê,
Kanê Melayê Cizîrê.

Ka Xanî Şêxê beşerê,
Baba Tah'r, Elî Herîrê.

XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-We carnan nivîsandinên ramanî xwendine?
2- Cudahiya di navbera gotar û ramanî de hûn têdigihin?

## HÊVIYA BIHARÊ



Salekê li herêma me baran nehat, ji ber nehatina baranê dexil çênebûn, giya hêşîn nebû, vê rewşê bandorek mezin li ser civak û derdorê kir. Heta bû sedemê aloziyên hindirîn jî, gelek mirovan sedemê nehatina baranê guftûgo dikirin. Bi rastî sedemek rast nedihat têgihandin.

Piştî demekê karbidestên Iraqê daxwiyaniyek dan û gotin: “Sedemê nehatina baranê bi zordarê Emerîka ve girêdayî ye.” Dixwestin bêjin Emerîka neyarê Rojhilata Navîn û misilmana ye, ji ber wê sedemê nizanim çi çek bikaraniye û li pêşiya hatina baranê bûye asteng. Ne tenê bûye sedemê nehatina baranê, belkî bûye sedemê pirbûna tozê jî. Piştî belavbûna vê gotinê, bêzariya di nav gel de zêde bû. Bawerkirin ku ger Emerîka nexwaze baran nayê.



Peyîz hat, ewrên reş yên ku ruyê esmana reng dikirin, tîrêjên ewran xwe li hemû aliyan belavkirin. Êdî bêhna baranê tê, bêhnên ji bo hişkbûna ba û tozê tengbûyîn êdî fireh dibin. Berevajî yê salên derbazbûyî, li gel baranê berfa zêde di herêmê de nehatî dîtin, serê çiyayên derdor dixemilîne. Hinek zarokên ku berê tu caran berf ne dîtîn,



bi awayekî matmayî li berfê temaşe dikirin, hinek mezinên pîr ji berfê xerîb bûyîn, lez dikin û xwe digihînin nav berfê.
Cotkar bihêvî dibin, carek din bi derfetên xwe yên hatîn kêmkirin dest bi cotkirinê dikin. Lawirvan jî dest bi kirîna lawiran dikin, her kes li gor hestên xwe, xiyalên mezin çêdikin. Ji nişka ve bihara li vê herêmê zêde nehatî dîtin, xaka derdorê bi rengê cûr bi cûr dixemilîne. Zarokên me yên ku ji gulên xwezayî yên Kurdistanê bê par hatîn hêlan, yekem car li vê herêmê bi gulên xwezayî şadibin. Girtina wan ya di hundirê malan de, êdî zorbûye. Mezinên xwe weke berpirsên jiyankirinê dibînin, li derdorê giya komdikin. Li ser banê xaniya dîtina rîsiyên hişîn, di xiyalên me de gundên me yên şewitî tîne ber çavên me. Li aliyê din pincarî, bi parzunên xwe yên nexşandî ve, ji pincarî tên. Zêdebûna sîrik, karî, kereng... di aliyê aborî û rewanî de hêz û dilşadiyê dafrînin.

Belê, di hemû aliyan de em di nav biharê de ne, êdî tê têgihiştin ku Emerîka nikare biharê asteng bike.



## PEYV

**Dexil:**Dexl û dan
**Alozî:**Tevilhevî
**Karbidest:** Yê kar didestê wî de
**Şaqismayî:**Şaşmayî
**Pincarî:**Pincarçin
**Rêsî:** Giyayê hatî badan û di zivistanê de didin lawiran
**Parzun:** amêrek wekeTûrik.

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Gotinên ji kes yan jî ji cih, nan tên girtin di nav neynokê de tên bikaranîn.

**Mînak:**

Mazlum DOXAN digot: “**Berxwedan jiyane.**”

## PIRS

**1-** Karbidestên Iraqê nehatina baranê bi çi ve girêdidan?
**2-**Bi hatina baranê re çi çêbû?
**3-**Kesên herî ji biharê sûd wergirtîn kîbûn

## CÛR Û AWÊN

Weke di waneyên derbazbûyî de jî hatî ravekirin, raste rast hevsengkirina ramanê ye.

## RÊZIMAN

**2-Hevok li gor wateya xwe dibe sê beş:**

**a- Hevokên erênî:**

Ew hevokên ku pêkanîna karekê yan jî pêkanîna rewşa navekê bi awayekî erênî pêşwazî dikin re **hevokên erênî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew dixwîne.
Ew jîr e.

**b- Hevokên nerênî:**

Ew hevokên ku pêkanîna karekê yan jî pêkanîna rewşa navekê bi awayekî nerênî pêşwazî dikin re **hevokên nerênî** tê gotin.

Di van cûre hevokan de pêvekên nerênî "**ne**, **na**, **bê**" dikevin li ser peyva salox û kar.

**Mînak:**

Ew **na**xwîne.
Ew **ne** jîr e.
Ew **bê** pirtûk e.
Ez vê avê ve**na**xwim.

**c- Hevokên pirsyarî:**

Ew hevokên ku pirsê ji kar yan jî ji rewşê dikin re **hevokên pirsyarî** tê gotin.

Di hevokên pirsyarî de yan peyvên pirsyarî cihdigire yan jî ev hevok bi tona deng diyardibe.

**Mînak:**

Tê **kuve** biçî?
Ew **kengê** hat?
**Kî** yekemîn derket?
**Kê** xwerin nexwariye?
Ew hat**?**

## HÎNDARÎ

**1-**We carnan nivîsînên li ser biharê xwendine?
**2-**Hûn jî hevokek erênî û nerênî saz bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Di geryanameyê de nivîskar balê dikşîne ser çi?**
**2- Ger cihekî em nasnekin û nivîsînekê li ser binivîsin wê çawabe?**

## BÊXAL



Bêxal cihekê xweş yê ku gerok bi taybet gerokên Başûrê Kurdistanê,di demsala havînê de qestê dikine. Bêxal, li geliyekê ku dikeve binê Rewanduzê, li başûrê wê Çiya yê Korek bejna xwe ditewîne, li bakurê wê Diyana, li rojavayê wê jî Geliyê Elî beg xêrhatina gerokên wê dike.

Sibehe em çend heval ji Hewlêrê, ber bi Diyana ve bi rê dikevin. Ji cama maşîna sor ya ku me dibe her wekî agir dibare lê diçin; her ku diçîn hewa hêniktir dibe. Ji ber, berê me li çiyayê bilinde û em ber bi jor ve diçin, hewaya germ cihê xwe ji hewa hênik re dihêle. Digihîn Mesîf, li Mesîf zêdebûna ewlekariyê bala mirov dikişîne. Ji dûr ve li Serêreş temaşe dikin, cihê begê kevnar tîne bîra me lê narawestin, riya xwe berdewam dikin. Piştî çend xulekan Şeqlawa ya ku malên wê di nav daran de mayî xuya dike. Her ku diçe bêhnfirehiyek xweştir çêdibe lê em ranawestin û diçin bajarê Wêjevanê Kurd (Elî Herîrî).Herîra ku dihat xwestin mezin bibe, berevajyê wê biçûk bûye. Lê mirov dikare mezinbûna Herîrê di kesayeta





Elî Herîrî û Xanim Xanzadê de bibîne. Rêwîtî hîn berdewame, hewa dikevin jor û xwe ber didîn Xelîfanê. Li ser Xelîfanê re Çiya yê Korek bilin dibe, li ser wê radara ji deshilatdariya Inglîzan mayî dixuyê. Lê dîsa diçin û derbazî Geliyê Elî begê dibin. Li derdora gelî hebûna gerokan bala mirov dikişîne. Em li cihekê hîn xweştir digerin, li aliyê rastê, di riya teng ya dinav tehtê de hatî çêkirin re, ber bi jor ve hewa dikevin. Hem pirbûna maşîna, hem tengbûna rê, neçar dibin ku leza xwe kêm bikin.

Niha Bêxalê dibînîn, her ku nêzîk dibin gengeşiya Bêxalê hê zelaltir dikarin bibînin. Erê ev der Bêxal e lê bicihkirina maşînan tiştek ne asane. Her çiqas geracên taybet jî hatine çêkirin, lê li ti derî cihê bicihkirina maşînê nema ye. Ji bo bicihkirina maşînan em di nav zoriyê de ne. Êdî em bêzar dibin û ji maşînê peya dibin. Ajoyê maşînê tenê dihêlin û diçin lê di nav vê xurûşê de em şaqis mane û digerin; xwe berdidin qatên xwar, sebra me nayê, carek din hewa dikevin. Ji ber her cihek ewqas xweş e, em li cihekî hîn xweştir digerin. Li vir havîn nîne, hercih hênike. Ji bin tehtê avekê mezin xwe tavêje û li ser singa pesar belav dibe, diherike. Ba wî gelî dadigire, xemil û xêla wê di hêle ku mirov bawer neke, ev av xwezayî ji vir derdikeve. Gelo ma xwezayî ye? Hîn jî dihizirim. Di nav vê avê de her kes wêneyan dikişînin. Belê cih hatine çêkirin, em li cihekê rûdinin, çavên me bi cihekê din dikeve û carek din cihê xwe diguherin, bi vî rengî pênc caran me cih guhert. Lê belê guhertin jî ne ew qas asane, ji ber di navbera geryangehan de, bi zorê mirov ji hev derbaz dibin. Ji ber sedema gerokên zêde li wir firoşgehên havînî bala mirovan dikişînin li ser xwe.

Mirov dikare bêje Bêxal,yek ji cihên herî xweş e û bi xemla xwe xweşikbûnekê dide Kurdistanê.

## PEYV

**Gerok:**Geştiyar
**Maşîn:**Wesayît, tirimpêl
**Ewlekari:**Parastin
**Xulek:** Hurde, deqîqe
**Radar:** Cîhaza pêhesana deng
**Gengeşi:**Qerebalix
**Ajo:** Şifêr
**Pesar:** Cihên kaş

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Em çawa dikarin hevokên asayî bêy ku peyva pirsyarî bikarbînîn bikin hevoka pirsyarî?
Bi vî rengî çend hevokên asayî vegerînin hevokên pirsyarî.

## PIRS

**1-** Dema hûn biçin Herîrê divê hûn çi bibînin?
**2-**Tişta herî zêde xemlê dide Bêxalê û dihêle ku bi hebûna havînê neyê hesandin çiye?
**3-**Çima gerok diçin Bêxalê?

## CÛR Û AWÊN

Di geryanameyê de cihên ku me ne dîtîn dikarin nas bikin. Li aliyê din nivîskarê geryanamê dikare xiyalên xwe û tişta pêdihese bîne ziman. Di geryanameyê de tiştên ji derveyî rastiyê nayên bikaranîn, ji ber ku geryaname, di heman demê belgeyek ya dîrokê ye jî.

RÊZIMAN

**3- Hevok li gor cihê kar û saloxê dibin dû beş:**

**a- Hevokên bidestûr:**

Ew hevokên ku kar yan jî salox dikevin dawiya wan lê dema ku di hevokê de têrker hebe dibe ku li piştî kar têrker bê bikaranîn, ji van cûrên hevokan re **hevokên bidestûr** tê gotin.

**Mînak:**

Wî name **nivîsî**.

Hewar **çû** mal.

**b- Hevokên bêdestûr:**

Ji wan hevokên ku kar yan jî salox dikevin destpêka wan yan jî dikevin navbera kirek û pêkirê re **hevokên bêdestûr** tê gotin.

Ev cûre hevok bi piranî di nivîsînên hûnandî de tên dîtin.

**Mînak:I**

**Çû** dibistanê ew.

**Sor bû** gul.

**Mînak:II**

**Dişewitand** neyarê me

Dar û giyayên deştên me

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Nivîskarê nivîsînên taqîkirinê (ceribandin), çavkaniya wî ya nêrîna xwe bi civakê bide pejirandin çiye?**
**2- Cudabûnek çawa di navbera nivîsîna hizrê û taqîkirinê de heye?**
**3- Dema hevokên hêsanî tên gotin çi tê bîra we?**

# COTYARÎ



Piştî çend salan cotkarek heman zeviyê biçîne, Êdî dexlê wê zeviyê wek tê xwestin çênabe.Ji ber ku di axa zeviyê de bêberhembûn çêdibe. Her wiha zaxên ku dexil pê tîmar dibe, yên di nav axa zeviyê de kêm dibin.Ev rewş bandorek nerênî li ser dexil çêdikin. Ji bo rakirina wê çi pêwîste, divê bêkirin.

Di rewşek bi vî awayî de cotkar neçare vê zeviyê salekê bikêle lê ne çîne. Dîsa ji bo tîmara windakirî carek din bidest bixe, pêwîst e zevî bê zibilkirin.

Rojekê cotkarek ji ber êdî zeviya wî dexlê çênake, neçar dibe û ji bo kirîna dexlê diçe deşta Silopya  yê û rastî cotkarekê pispor tê, cotkarê pispor jê dipirse: “Ma zeviyên te nînin, tu tê van deran dexil dikirî?”

- Hene lê ji ber çandiniya zêde, êdî dexlê çênakin.

Ew jê re dibêje: “Here zeviya xwe bike şov.”

Piştî zivirîna malê, cotkarê belengaz dest bi hilkirina zeviya xwe dike û carek din pêwîstiya wî bi kirîna dexlê namîne.

Nexwe ji bo cotkarek bikaribe destkeftiyekê baş ji xakê bistîne, pêwîste hem zeviya xwe bike şov hem jî di demê çêbûna çandiniyê de zibil bikarbîne. Herwiha bêhndayîna zeviya û kilêpkirina wan jî pêwîstiyek ya cotyariyê ye.

## PEYV

**Cotkar:**Kesê cot dike
**Zax:** Tîmar, vîtamîn
**Şov:**Zeviya hatî kêlan lê tov nehatî reşan.
**Kilêp:**Kêlana gir ya zeviyê

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

Cihên ku hêmaya xalê lê tê bikaranîn:
**1-**Li dawiya hevokan tê bikaranîn.
**2-**Li dawiya kurtkirinan tê bikaranîn.
**3-**Di navbera rêzkirinên jimaran de tê bikaranîn.
**4-**Dema dîroka rojê dinivîsin, di navbera roj meh û salê de tê bikaranîn.
**5-**Di bîrkarî de cihê hêmaya hevdanê tê bikaranîn.
**6-**Di navbera demjimêr û hûrdeyan de tê bikaranîn.

## PIRS

**1-** Cotkarê belengaz çima bi rexneyê re rû bi rû ma?
**2-**Çi bû sedem ku êdî zevî dexlê çêneke?
**3-**Ji bo cotkarek bikaribe destkeftiyên baş ji xakê bigire divê çi bike?

## CÛR Û AWÊN

We danasîna nivîsînên taqîkirinê di mijarên derbazbûyî de dîtiye. Lê divê hûn ji bîr nekin nivîskarê taqîkirinê sûdê ji taqîkirina distîne. Çavkaniya wî ya têgihandinê taqîkirinên li ser jiyana rojane ye. Ango xwe dispêre taqîkirinan (ceribandinan).

RÊZIMAN

**4-Hevok gor çêbûna xwe dibe çar beş:**

**a-Hevokên hêsanî:**

Ew hevokên ku di wan de karek yan jî saloxek heyî re **hevokên hêsanî** tê gotin.

**Mînak:**

Gewrê teşiyê dirêse.

Dîlber jîr e.

**b-Hevokên rêzî:**

Ew hevokên ku di wan de kesek ji yekî zêdetir karan bi rêze ve dike yan jî yekê zêdetir salox tên bikaranîn re **hevokên rêzî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew çû çiyê, perwerde dît, vegeriya malê.

Ew pir jîr e, zana ye, rêzdar e.

**c-Hevokên gihanekî:**

Ew hevokên ku bi alavên gihanekê bi hevdû ve hatîn girêdan re **hevokên gihanekî** tê gotin.

**Mînak:**

Ew nameyê dinivîse û hevala wê jî guhdar dike.

Ew giya hişîne lê kulîlka wê sor e.

**d-Hevokên hevgirtî:**

Ew hevokên ku dema dû hevok dikevin nav hev yan jî pêkanîna hevokekî sedemê hevoka dine, ji wan re **hevokên hevgirtî** tê gotin.

**Mînak:**

Were dibistanê, emê bixebitin.

Ger hûn neyên dibistanê, em jî naçin dibistanê.

## HÎNDARÎ


**1-**Hûn jî çend hevokên hevgirtî sazbikin û li lênûsa xwe binivîsin.

**2-**Destnîvîsa jêr li lênûsa xwe binivîsin.

Nexwe ji bo cotkarek bikaribe destkeftiyekê baş ji xakê bistîne, pêwîst e hem zeviya xwe bike şov hem jî di demê çêbûna çandiniyê de zibil bikarbîne. Her wiha bêhndayîna zeviya û kilêpkirina wan jî pêwîstiyek ya cotyariyê ye.

**1- Hûn çi cudahiyê di navbera jîname û jînama xwe bi xwe de dibînin? Vekin.**
**2- Di jînama xwebixwe de xalên ku nivîskar bingeh bigire çine?**
**3- Dema endamên hevokê tên gotin hûn çi tê digîjin?**

## AKÎFÊ HEVAL



Li ser daxwaza hevalan û ji bo ev jînama min di arşîvan de cihbigire,herwiha di her demjimêrê de dibe ku ez şehîd bikevim, ji devê min agahiyên di derbarê jiyana min de hatî nivîsandin bimîne, min pêdivî dît ku jînameya xwe binivîsînim.

Navê min Mihemed, paşnavê min Savûn e, navê bavê min Elî, navê dayîka min Helîm e. Li gor min ji bavê xwe bihîstî, malbata min ji Şerefiya ya girêdayî Şirnexê hatiye. Kalikê min ji Şerefiyê koçberî Bana bûye û ez bi xwe di sala 1952'an de li wê derê hatime cîhanê. Ji ber di gund de zeviyên me yê çandiniyê kêmbûn û bavê min jî, ji koletiya derdor hes ne dikir, rewşa me ya
aborî lewaz bû. Ji bo ez bi zarokên gundiyan re şernekim, bavê min ne dihêla bi zarokan re bilîzim.

Piştî mezinbûm û min leşkeriya Tirka kir, bi Wethayê re pevjîn bûm. Piştî pevjîniyê ji ber pirsgirêkên civakî, koçberî Cizirê bûm. Her çiqas mala min li Cizîrê bû lê ez neçarbûm, ji bo kar biçûma metrepolan û li wan deran, min karê karkertiyê rêvedibir. Bi vê boneyê piştî salên 1980'an, min mala xwe bir Tersusa Mêrsînê. Di wan deman

de ji dûr ve têkîliyên min bi PKK'ê re çêbû. Ji ber wê di sala 1984'an de berya şerê çekdarî dest pêbike, carek din zivirîm gund.

Armanca min ew bû ku bi hevalan re çalakiyan pêkbînim û vegerim malê. Lê vê rewşê zêde nedomand, piştî çalakiya Spîvyan ya ku 1985'ê pêkhatî û girtina Mistefa ÇÎMEN, êdî rewş hatibû guhertin. Ji berku wî navê min dabû dewletê û hevalên min yên di rewşa min de, tev hatibûn desteser kirin,ez carek din derbazî Cizîrê bûm. Piştî biryara darvekirinê ji hevalên min re hat dayîn û hatim naskirin, mayîna min ya li wê derê êdî nepêkanbû.Çileya 1986'an tevlî nava refên gêrîla bûm.Bi daxwaza hevalan min navê xwe kir, Akîf. Sala 1988'an ji tehtê ketim, destê min şkest û ez demekê bê daxwaza xwe ji rêxistinê qut bûm. Lê belê paşî bi alîkariya dostan, min xwe gihand Başûrê Rojava, ji wê derê jî derbazî Wargeha Bekaa yê bûm.

Piştî saxbûna destê min û perwerdeyekî, Rêber navê "Hesen" weke xelat da min û carek din zivirîm welat. Piranî xebata min ya di nav gêrîla de li herêma Botanê pêk hat. Ez niha li herêma Gabarê dimînim.

Xebata ku em niha dimeşînin, wê heya Azadiya Gelê Kurd berdewam bike. Ger ez mam, emê bi hev re azadiya xwe pîroz bikin, ger şehîd ketim, wê mergê min di roja azadiyê de bi we re be.

***Mihemed SAVÛN***
***1989***

## PEYV

**Pevjîn:**Zewac
**Aborî:** Darayî

## RASTNIVÎSÎN, HÊMADANÎN Û PEYVÎN

**Cihên ku bêhnok lê tê bikaranîn:**
**a-**Di hevokên dirêj û dema kirek ji kar dûr bikeve de tê bikaranîn.
**b-**Di hevokê de, di navbera peyv û birepeyvên heman erkî de tê bikaranîn.
**c-**Ji bo rêze hevokan, ji hev cuda bike tê bikaranîn.

## PIRS

**1-**Mihemed Kî ye? Bi awayekî kurt bidin nasandin.
**2-**Çima nivîskar neçarî koçberbûna metrepolan dibe?
**3-** Kengê û ji ber çi qutbûna Akîf ji rêxistinê çêbû?
**4-** Xelata Rêber çibû?

## CÛR Û AWÊN

Jînama xwe bi xwe cûre nivîsîna kesê jînama xwe, bixwe têdigihîne ye. Dema kesek jînameya xwe dinivîse, divê bihestiyar tevbigere. Nivîskarê jînama xwe, bi xwe di mijarên derbarê jiyana xwe ya taybet de bêku pêwîstî bi ti belgeyan bibîne, dinivîse.

## RÊZIMAN

**Endamên hevokên jêr diyarbikin:**
**Mînak:**
Wa Nezahat!Weredi refê debi lezwaneyê bixwîne.
Endama ji kar têrker têrker pêkir kar
derveyî hevokê
Îrocîhanpir germe.
Têrker destpêk têrker salox

## HÎNDARÎ

Li jêr tîpên gir û hûr bi awayê nivîsîna dest hatine nîşandan. Hûn jî van tîpan wekî heyî li lênûsa xwe binivîsin û ji bo fêrbûna nivîsîna wan hewl bidin.

**Tîpên gir:**
***A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z***
***A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z***

**Tîpên hûr:**
**a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z**
**a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z**

## TEST 4

**1- Navên ku bi alîkariya daçekan cihê kirina karê kirekê di hevokê de dide diyarkirin ji yên li jêrîn kîjane?**
**A)** Kar
**B)** Kirek
**C)** Pêkir
**D)** Têrkera cihî
**E)** Destpêk

**2- Peyva di hevoka navdêrî de erkê kar digire ser xwe kîjane?**
**A)**Hevalkar
**B)** Salox
**C)** Têrkara cihî
**D)** Hevalnav
**E)** Nav

**3- Navên taybet çawa tên nivîsandin?**
**A)** Bi xêzika axaftinê destpêdike, zayenda wê bi hêmaya birînê jê tê vekirin.
**B)** Bi tîpa mezin dest pêdike û zayenda wê pêve tê zeliqandin.
**C)** Bi tîpa biçûk destpê dike û ji kokan pêktê.
**D)** Bi tîpa mezin destpê dike.
**E)**Bi tîpa mezin destpê dike û bi tîpa mezin dawî lê tê.

**4- Nivîsîna ku nivîskar, neçare dîroka rojê binivîse ji kîjan cûrê nivîsînê ye?**
**A)** Serpêhatî
**B)** Bîranîn
**C)** Çîrok
**D)** Rojane
**E)** Geryaname

**5- Nivîskarê kîjan cûrê nivîsînê, pêwîste egerên nivîsîna xwe bêje?**
**A)** Jinama xwe bi xwe.
**B)** Jîname
**C)** Bîranîn
**D)** Guftûgo
**E)** Şano

**6- Ji hevokên jêr kîjan hevokek hevgirtî ye?**
**A)**Ew, di refê de waneyê dixwîne.
**B)** Ez çûm Amedê, li sûkê geryam û zivirîm.
**C)**Egîd, Karwan û Derya ji daristanê zivirîn.
**D)** Şêrko tirimpêlê çêdike.
**E)** Mazlum waneyan kom dike.

**7- Bi kîjan hevokên jêr re endamê ji derveyî hevokê hatiye bikaranîn?**
**A)** Ax dayê! Ez birîndar bûme.
**B)** Dilê min maye.
**C)**Tu kî yî? Ew qas zêde daxivî.
**D)** Hozan got: “Em bi hev re herin.”
**E)** Dermanê zoriya herî mezin, hedare.

**8- Ji hevokên jêr, kîjan nerênî ye?**
**A)** Ez ne, nehatim dibistanê.
**B)** Ez hatim dibistanê.
**C)** Min av venexwar.
**D)**Derya Spî pir firehe.
**E)** Heval di dolê de dimeşin.

**9-Ji wan nivîsîn û berhemên bi mebesta li ser dikê bê lîstin, hatîn amadekirin re çi tê gotin?**
**A)** Çîrok
**B)** Nûtûq
**C)** Guftûgo
**D)** Şano
**E)** Gotar

**10- Di nav hevoka jêr de peyva hatî reşkirin kîjan endamê hevokê ye?**

“Sorxwînê di derya yê de **li neyaran** xist.”

**A)** Têrkera hevalkarî
**B)** Pêkir
**C)** Têrkera cihî
**D)** Kar
**E)**Kirek

**11- Kîjan endamên hevoka jêr raste?**

“Wa bira! Ez îro pir nexweşim.”

**A)** Endama ji dervey hevokê, kirek, kar, pêkir, têrkera hevalkarî.
**B)** Endama ji dervey hevokê, kirek, têrkera hevalkarî, kar.
**C)** Endama ji dervey hevokê, kar, pêkir, kirek, têrkera hevalkarî.
**D)**Endamê ji dervey hevokê, destpêk, têrkera hevalkarî, têrkera hevalkarî, salox
**E)** Kirek, pêkir, têrkera hevalkarî, têrkera cihî, kar.


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Derya Sipi
Suriye
Lubnan
Iraq
Sewas
Erzerom
Idir
Qers
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Wan
Qotur
Xoy
Meleti
Elbistan
Farqin
Bitlis
Basqale
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Nisebin
Entap
Riha
Veransehir
Qamislo
Dihok
Nexede
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam